


# NÛDEM

No 6 1993



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

## XELATA NÛDEM YA EDEBIYATÊ!



Ew ê kovara me NÛDEM ji salê carekê di bin navê "Xelata Nûdem Ya Edebiyatê" de xelatekê belav bike. Ev xelata ha, ku armanca wê teşvîkkirina nivîskariya kurdî û vejandina edebiyata kurdî ye, wê ji aliyê jûriyeke xurt ve bête belavkirin.

Em ê di hejmarên bê de şerdên beşdariya xelatê, diyariya xelatê û navên endamên jûriyê bi we bidine zanîn.

Lê, hûn xwe ji niha ve ji **XELATA NÛDEM YA EDEBIYATÊ** re amade bikin!



Xwedî û Berpirsiyarê Giştî:  
Firat CEWERÎ

Hejmar: 6  
Gulan 1993

Şerdên abonetiye (Salek):  
Swêd: 190 Skr.  
Welatên din: 39 \$  
Postgiro: 636 36 25-2  
ISSN: 1103-1964

Wêneya Bergê:  
Hiner SELÎM

Pergela Rûpelan:  
MEZOPOTAMYA

Nivîskar û hevkarên  
NÜDEM'ê:

- Swêdê: M. Uzun, Rohat,  
Fawaz Hussain, Z. Zinar, M.  
Mayî.
- Elmanya: Husên Düzen
- Belçika: D. M. Ferho
- Fransa: Ferhad Pirbal
- Australya: Şahîne B. Soreklî
- Tirkîye: Dr. C. Bender
- Ermenîstan: Eskerê Boyik,  
Timûrê Xelîl
- Îran: Ehmed Şerîfî
- Sûriye: S. Biraîm

### NAVNÎŞAN

Gamla Landsv. 36  
S- 740 41 Morgongåva  
SWEDEN  
Tel. & Fax: 0224-61 428

## NAVEROK

- ◆ ENSTÎTUYÊN KURDÎ / Firat CEWERÎ, 3
- ◆ BERSÎV I / Kendal NEZAN, 5
- ◆ BERSÎV II / Feqî Huseyn, 12
- ◆ BERSÎV III / Derwêş. M. FERHO, 17
- ◆ SÊ HELBEST JI / Rojen BARNAS, 20
- ◆ QESRA XEWNAN / Fawaz HUSSAIN, 25
- ◆ QURFA PIŞTÊ ŞIKEST / Ömer OKUMUŞ, 31
- ◆ RESAMÊ RENGÊN TÊKEL ÊN KURDÎ;  
HUNER SELÎM / Mehmed UZUN, 36
- ◆ HATINA TE BENDEMANA MIN  
/ Mervanê KELEŞ, 44
- ◆ MADMAZEL CLAUDE / Henry MILLER  
/ Werger: F. CEWERÎ, 47
- ◆ NÜDEM / Ferhad PÎRBAL, 55
- ◆ DESTANÊN KURDÎ / ROHAT, 56
- ◆ DI PÊŞKETINA MILETEKÎ DE ROLA  
EDEBIYATÊ / Mehfüz MAYÎ, 76
- ◆ DU HELBEST / Bedirxan EPÖZDEMİR, 84
- ◆ LI SER HOZAN û HELBESTAN  
/ Medenî FERHO, 87
- ◆ HELBESTVANÊ KURD; SÎNAN SABRÎ  
/ Ziya ŞEKER, 92
- ◆ PERTEW BEGÊ HEKARÎ  
/ Zeynelabidîn ZINAR, 94
- ◆ ŞAHSIWARÊ PÊNÛSA BIRÎNDAR; SEYDO  
GORANÎ / Siyabend BIRAÎM, 99
- ◆ HUNERMENDÊ XWE BINASE  
/ Hafız QAZÎ, 104
- ◆ MÎRÊ BIÇÛK, A. S. EXUPERY  
/ Werger: Şahîne B. SOREKLÎ, 107



“Mia madre sul tetto” - pastello - 50×70 cm.

# ENSTÎTUYÊN KURDÎ

---

Firat CEWERÎ



Civaka kurdî bi her awayî di hundirê guhertin û xwenûkirinê de ye. Sîstema feodalîzmê bi lez difeş-kile, têkîlî û danûstandinên bermayê wê hêdî hêdî ji navê radibin. Di şûna vê sîstema ku bi sedsalan e li welatê me hebûna xwe parastîye, sîstemeke îndustrî lê bi cih dibe. Bi pêşketina vê sîstema nû, rewşa miletê me, nêrîna mirovên me ya dinyayê, rabûn û rûniştina me, rewşa me ya psîkolojîk jî tê guhertin, li gorî hewce-dariyên jiyana vê sîstema nû em

gavên xwe davêjin. Em dixwazin tola xwe ji dîrokê bistînin, loma jî em qeyd û merbendên tarîfî, zulm, paşdemayin û nezaniyê dişkînin û em gava xwe davêjin cîhaneke nû-dem; em dikevin nava refên welatên hemdem. Em ji têkiliyên bermayên feodalîzmê, yên ku ji bo pêşketina civaka me bûbûne asteng, ji şer û pevçûna eşîrtî, ji dijminatîya li hemberî hev, hêdî hêdî azad dibin, em dikevin ser rîyeke nû, rîya bajarvanî û medeniyetê. Em êdî bi her awayî li

hebûna xwe xwedî derdikevin; em xwe tenê bi riyekê, bi nêrînekê, bi hêzekê ve girê nadin, di her warê jiyanê de, em li gorî hewcedarî û xwestekên xwe tevdigerin. Nezanîya malkambax, ku hetanî niha mîna kabûsekî xwe bi hemû giraniya xwe berdabû ser dilê me, em çavgirtî û bêçare hiştibûn, niha em hêdî hêdî zora wê dibin, em hew dikevin xefka wê, lê em xefkê li ber wê vedigirin. Rê û metodên ku welatên azad û serbixwe berî bi sedsalan ji bo rohnîkirina civaka xwe bi kar anîne, em hê nû bi wan dihesin, ev rê û metodên ku nîşanên bajarvanî û pêşketinê ne, hê nû bala me dikişînin, qîmeta wan ya bilind hê nû ji me ve xuya dibin. Sazgehên demokratîk, akademî û enstîtu ku cihên xebatên kolektîv û dibistanên zanistî yên pêşdexistina ziman, edebiyat, çand û her celeb toreya welatekî ne, li ba me (mebesta min Kurdistanî Tirkîyê ye) hê nû girîngiya van celebsazgehan dixuye. Ev sazgeh ji bo çand û edebiyata miletekî cihên xebata nûdem e, ji bo azadî û ji nezaniyê rizgarkirina miletekî jî tîrêjên hêviyê ne. Digel pîr derengmayin û kul kêmasiyan em îro xwediyên van sazgehan in, em xwediyên enstîtuyan in. Enstîtu cihên xebatên ilmî û zanistiyê ne, nîşana bajarvaniyê ye. Enstîtu, akademî û sazgehên di van celebên de rohnîya civaka xwe ne. Yên me jî rohnîyên me ne. Lê barê yên me pîr giran in. Divê ew ji me re gelek

tiştan bikin. Ew tiştên ku divabû berî niha bi sedsalan bihatana kirin. Lê derengmayin ji qet nekirinê çêtir e. Derengmayin û heta niha nekirina me ji rewşa me ya siyasî tê. Rewşa me ya wêran ku pîrrê caran me ji bo bêhnek azadî û çirûskê hêvî serê xwe da ye. Rewşa me ya ku nehiştîye em çavên xwe vekin û mîna gelên dinyayê bi avakirin û pêşdexistina civaka xwe dakevin. Serdestên me nehiştîne ku em kultura xwe vejînin, bi zimanê xwe bipeyivin, stiranên xwe bistirên, romanên xwe bini-vîsin... Loma jî em heta niha civateke jihevdeketî mane. Me cihê xwe di nava civakên hemdem de negirtiye, em nebûne xwediyê rûmet û serbilindahiyê. Wek me got, çiqas dereng be jî em îro di despêka vî karî de ne. Barê giran li ser milên Enstîtu û sazgehên kurdan in. Stiranên ku heta niha nehatine gotin, zimanê ku nehatiye vejandin, edebiyata ku nehatiye nivîsandin, klasîkên ku nehatine çapkirin û belavkirin, kultura ku nehatiye nasandin û gelek tiştên din di dorê de ne. Gelo enstîtuyên me yên ku îro hene di çi rewşê de ne? Ew dikarin çi bikin? Wan heta niha çi kirine? Planên wan yên pêşerojê çi ne? Me ev pirsên ha ji serokê Enstîtuya Kurdî ya Parisê Mîrza Kendal Nezan, berpirsiyarê Enstîtuya Kurdî ya Stembolê Mîrza Feqî Huseyn û sekreterê Enstîya Kurdî ya Brukselê Mîrza Derwêş Ferho kirin:

# SEROKÊ ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ



Kendal NEZAN

**NÛDEM:** GAVA WE LI PARÎSÊ  
ENSTÎTUYA KURDÎ VEKIR, GELEKÎ NAV  
DA. HEM JI BO KURDÊN LI WELÊT, HEM  
JÎ JI BO KURDÊN LI DERVEYÎ WELÊT BÛ  
HÊVIYEK. GELO FIKRA LIDARXISTINA  
ENSTÎTUYÊ ÇAWA BI WE RE ÇÊ BÛ ? JI  
BO ÇI WE PÊWÎSTIYA LIDARXISTINA  
SAZGEHEKE WILO DÎT ?

**KENDAL:** Gotineke filozof Pascal heye: xweza (tebîet) ji valahiyê nefret dike. Di destpêka salên 1980 an de gelek ronakbîr û hunermendên kurd ji ber zordestiya rejîma eskerî ya Tirkîyê, ji ber şerê Îran û Iraqê xwe avêtibûn Ewropa Rojava. Hin ji wan di nav partî û rêxistinên siyasî de dixebitîn û gelek ji wan, ji ber sedemên cihê, bi serê xwe mabûn; bêf ku dev ji xebata welatparêziyê berdin nedixwestin bikevin nav xirecira stewr û şerê fraksiyonan. Piraniya partiyên Kurdan, nexasim ên Kurdên Tirkîyê, mirîdê stalinîzmeke hişk bûn; hin berê xwe dabûn "Moskovaya Sor!", hin "Pekîna Semawî", hin "Tîranya Enwer Xoce", bi serê wan sond dixwarin û carna nedixwestin silaveke xwedê jî bidin pismam an merivekî ku ji îman û baweriya wî ya îdeolojîk şik dikirin. Mînakek ji salên ku her xwendevanên we pê dizane; ez xwişk û brayan dinasim ku bi salan li Ewropa dijîn, xwende û ronakbîr in, welatparêz "şoreşger" û "sosyalîst" in; ji ber ku yek ji fraksiyona yê din nebû, bi salan li hev nedipirsîn, silav nedidan hevûdu. Hin xortên ku ji Kurdistanê nû hatibûn Fransayê, paqij, bi edeb û qedirşînas bûn, me arîkarî dida wan, wan bi cîh dikir, ji wan re kar an bûrs didît ji bo ku bigihên, xwe pêş ve bibin, gava ku diketin nav yek ji wan fraksiyonên "şoreşger" ên hişk, êdî bi carekê hevaltî û dostayetî jî ji bîr dikirin, carna eşkere an paşpênî dijminahî dikirin. Navê danûstanên mirovî yên bingehî danîbûn "peywendiyên ehbab-çawiş", tiştêkî cîgehê şermezariyê! Qedîmasî û spardarî ji bo kesên ku rojek di tengasiyê de

destê arîkariyê dirêjî te kiriye bûbû "tirşikçîtî". Bi kurdî peyivîn û nivîsîn ji riya pîroz a "şoresgerî" û "enter-nasyonalmîzme" derketin bû, "nasyonalmîzma burjuvaziya biçûk" bû, bi kurtî kufreke mezin bû! Bi hezaran kesên ku ji bo rizgarî û azadiya gelê kurd tade û êşandin dîtibûn, derbeder bûbûn, di nav vê tora stalînîzmeke iptîdaî û totalîter de, çavtirsîyayî, terorîze bûbûn, ji rûmetên bingehî yên çanda xwe re, ji zimanê xwe re, ji orf û adetên piraniya gelê xwe xerfîb û bêgane bûbûn, dîr ketibûn. Dikaribûn bê tirs herin mirinê, lê newêribûn zincîrên terorîzma fikrî bişkênin, bi serê xwe bifikirin, bi çavekî din li cîhanê binêrin. Ji çandê heta sporê, komelên xwendekaran û sendîkayan, fraksiyonên stalînîst dixwastin hemû warên jiyana civakî têxin bin kontrola xwe û herwekî nikaribûn hemiyarî bi hev re bimeşînin, her tişt tevlihev dibû, di wê geremol û tevliheviya giştî de doza kurdî pêşve nedîçû. Em, her yek di destên me de Mishefên pîroz ên Mezhebên me û pirtûkên me yên şerîfetê, bi tirkî bi hev ketibûn, şerê hev dikir, mala hev wêran dikir. Her yek jî bawer dikir ku şev û roj ji bo qenciya gelê kurd vî karê ha dike û di dawiyê de ne ji alî çandî, ne ji alî nasandina doza kurdî bi raya giştî û ne ji alî siyasî ve pêşveçûnek tunebû. Di fizîkê de ji tevgerê re dibêjin "livandina brownî": molekul timî dilivin, diçin, tên, li hev dikevin, lê ji bilî îsrafa enerjiya xwe tişteki pêşve nabin. Rewşa Kurdan li derveyî welêt hêwirzeyeke brownî bû.

Di rewşa wilo de meriv dikare du tiştan bike; an bêje gelên din berî 40-50 sala di vê dema mîstîk de derbas bûne, niha dora Kurda ye, tişteki kirinê tune ye; ya çêtir ew e ku li mala xwe rûnên heta ev lehiya han derbas be; an jî bêje, ez wekî kesek bi serê xwe, heye ku bi çend kesên din re jî, bicêribînim dervayî vê xirecira giştî xebatek ku bi me dibe bikin ji bo an ziman û çanda kurdî an ji bo nasandina doza kurdî li derveyî welêt.

Wekî gelek hevalên kurd ên din, ên ku baweriyên wan nêzîkî ên min bûn, ez aligirê riya duwem bûm. Li gora vê baweriyê me di salên 1974-1980 an de Komela Fransa-Kurdistan danîbû, tê de ronakbîrên fransîz ên navdar wekî Jean Paul Sartre, Simone de Beauvoir, Maxime Rodinson civandibûn, li ser Kurdan pirtûkan çap kiribû, di radyoyan de bernamayan belav kiribû. Ez di ber karên xwe yên profesyonel de bi salan, di nav Partiya Sosyalîst a Fransa û partiyên sosyal-demokratên hin welatên Ewropa Rojava de ji bo nasandina gelê kurd û doza wî xebitîbûm, semîner û konferansan dabû. Gava ku di gulana 1981 an de li Fransa, Sosyalîst helbijartina kar kirin, çend kesên ku min baş nas dikir bûn wezîr. Wê demê pîrsa kurdên Îranê aktuel bû, min di hin waran de ji bo wan arîkarî peyda kirin. Lê di cîyekî de dema xebata şexsî derbas bûbû, pêwîstiyek mezin bi avakirin û danîna mueseseyên serbixwe yên domdar hebû. Min di wefata rehmetî Kamuran Bedirxan de jî ev rastî gelek xurttir dît. Ez dostê nêzîkê wî bûm. Di sala 1980 an de,



çendeyek berî mirina xwe, ji min re got: "dawiya rê êdî xuyan e; em gelek xebitîn lê tiştêk hêja ji me neqediya. Lewra ez tu bîranînan nanivîsim, ez dê bê wêris herim û naxwazim gora min jî hebe. Mal û milkekî min î hêja nîne; çend tiştên biçûkên ku hene ewê bigihên keça Celadet Beg, Sînem Xan û zarokên wê. Lê ez kitêb û arşîvên xwe dispêrim te, min ne dît, heye ko tu bibînî, rojekê kitêbxaneyek, merkezek ji bo Kurdan bê danîn, an perçeyek ji welatê me azad bibe, kerem ke ewan ji bo hînkirina nîfşên nû bide wêderê". Welatparêz û şerkerekî me yî mezin diçû, li pey wî, li welatekî girîngê wekî Fransa tiştêk nedima. Ewî li vî welatî, di nav hezar dijiwariyan de, xwestibû çend keviran deyne ser hev; diçû, ên li pey wî divê çibigire ji nû ve dest pê kirina; di dema ku gelên din, ên wekî Ermeniyên bê dewlet jî, bi sedsalan berê ji xwe re hin mueseseyan danîbûn, tê de arşîv û kitêbên xwe, zanîna û cêribandinên xwe didan serhev û digihandin nîfşên nû. Biyanîyên ku dixwestin ji dîrok û çanda wan gelan agahdar bibin dikaribûn bi serbestî herin wan ciyan, hîn bibin, bixwînin, binivîsin. Lê ku rojnamevanek biyanî bixwasta li ser rewşa Kurdistanê hînî tiştêkî bibûna diviyabû bi dijiwariyên mezin temsîlkarekî rêxistineke siyasî kurd peyda bike ku bi zimanekî ewropî bizanibe, li cem wî çend pirtûk û belge hebîn.

Ev valahî û hewcedarî him ji alî Kurdan ve him ji alî biyanîyên dilxwazên gelê kurd ve hebû. Hewcedarî organa çê dikin. Ji bo dagirtina vê valahiyê du tiştên bingehtî pêwîst bûn:

dirav û kesên karzan û têgihîştî. Piştî bêtirî salekê çûnûhatin û axaftinan, sê wezaretên fransîz qebûl kirin ku hinek arîkariya diravî bidine me. Lê pîrsa kadran dijiwartir bû: di nav Kurdên Ewropa bi deh hezaran kes kebûn ku dikaribûn bimeşin, afîşan li dîwara xî, govend û dîlan bigirin, bi sedan kes bi karên komeletî dizanîn, lê ên ku bikaribin baş bi kurdî binivîsin an zimanekî ewropî yê sereke baş pipeyivin û binivîsin gelek kêmbûn û ji me re jî kesên wilo pêwîst bûn, ji ber ku karê bingehtî yê ku me dabû ber xwe parastin û pêşvebirina çanda kurdî û nasandina doza kurdî bi raya giştî ya Ewropa bû. Gihandina kadran karê salên dirêj e; loma em bi kadrên hebûyî bi rê ketin, bi hêviya ku di salên pêşiya me de emê bikaribin keç û xortên kurd ên jêhatî bidin xwendin û ku ji nav wan kesên bikêrhatî derkevin.

Enstîtu wek projeyeke çandî ya serbixwe, ji siyasetê cihê lê ne hember, ne jî bindestê wê, wek ramanê welatparêz a berhevker, li dora xwe hin ji zane û hunermendên mestirîn ên gelê kurd, wekî Yilmaz Güney, Hejar, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, Qanatê Kurdo, Tewfîq Wehbî, civand. Ev civandineke bêtir sîmbolîk bû, mesaja wan ev bû: em welatparêzên ji perçeyên cihê yên Kurdistanê ziman û çanda gelê xwe di talûkê de dibînim, doza parastin û pêşvebirina wan pîroz e, li ser cihêtiyên bîr û baweriyên siyasî ye, divê ku em li dora vê dozê bicivin. Danîna Enstîtuyê di demeke dîrokî ya taybetî de, lêdana vê defa hewarê bû. Dengê defê hate bihîstin û

ji wê demê ve, Kurd girîngiyeke mestir dan doza çand û zimanê xwe. Wekî kesên realîst, me tu car xewna civandina hemû nivîskar û hunermendên Kurd di nav rêzên Enstîtuyê de nedît. Realîteyên cihêreng ên sala wilo bi hêsanî nayên guhartin. Lê heke di nav komele, navend an kovarên cihê de be jî îro, deh sal piştî danîna Enstîtuyê, xebatên çandî gi-hîştîbin otonomiyek, xwe ji serwariya siyasetê rizgar kiribin, bi kurdî nivîsîn, belav kirin, mînaqêşe kirin, îro êdî "şermezarî" û "biçûkbûn" na, lê serbilindî be, bi zimanên ewropî li ser Kurdan bêtir pirtûk, tezên doktorayê û xebatên zanistî hatibin çêkirin, Enstîtuya kurdî, bi awayek yekser an bi peyda kirina hemberiyê, di vê guherandina hiş û zihniyetan de pardar e û ta dereceyek gihiştîye amanca xwe.

PIŞTÎ VEKIRINA ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ, WE BEŞEK BI NAVÊ "ENSTÎTUYA KURDÎ YA BONNÊ" JI VEKIR. LÊ EW BEŞA HA JI NIŞKÊ VE WINDA BÛ. GELO ÇIROKA WÊ ÇAWA BÛ?

Almanya Rojava ji bo xebatên kurdî welatekî gelek girîng e. Nêzîkî milyon Kurd li wî welatî dijîn. Lewra me di destpêkê de xwest ku beşeke Enstîtuyê li Bonnê bê danîn, him ji bo weşanên Enstîtuyê bigihîne Kurdên Almanya, him doza kurdî ji getoyên ramanî yê radikâl derxe, bi hêz û mûseseyên almanî yê fireh bide nasîn û qebûl kirin, lobiyeke kurdîz çêbike li Parlemeta almanî û di nav rojnameyan de, hebûna

Kurdan wekî cemaeteke neteweyî ya cihê bi awayekî resmî bide qebûl kirin û mafên wan ên civakî, ên xwendegah û radyo û televîzyonê bi dest xe. Hin parlementerên sosyal-demokrat piştigiriya vê projeyê kirin, lê ji ber tezyîqa mezin a Tirkiyê li ser hikûmeta almanî, me nikaribû imkânên malî yê ferz peyda kin. Ji alî danîna ekîbê de jî, me gelek dijwarî dît. Çend ronakbîrên ku ewê bikaribûna ji heqê vê xebatê bihatana di nav partiyên siyasî de kardikirin; mixabin me nikaribû 5-6 ronakbîrên serbixwe, şareza, kurdî û almanîzan peyda kin. Lewra beşa Enstîtuyê piştî selekê xebatê û çend çalakiyên hêja (wekî meha çandî ya kurdî li Dortmundê), hate girtin. Ciyê wê xuya û vala ye. Ji ber ku komele û rêxistinên kurd ên ku li Almanya hene hê tenê xitabê baskê çepê partiya sosyal-demokrat (SDP) û Keskan dikin; Ji sedî 80 gelê alman li dervayî van herikanan e. Di van rojên reş û dijwar de gelê kurd hewcê arîkarî û piştigiriya her kesê demokrat e. Tenê dijminên gelê kurd ji vê valahiyê û getokirina pîrsa kurdî îstifade dikin.

TÊ BIHÎSTIN KU PIRTÛKXANEYA WE PIRTÛKXANEYEKE DEWLEMEND E. GELO EW BI ÇI CELEBÎ DEWLEMEND E?

Pirtûkxaneya Enstîtuyê dewlemendirin pirtûkxaneya kurdî ya dervayî welêt e. Ku hebe tenê ya Korî Zanyarî ya Bexdayê jê dewlemendtir e. Tê de bi bîst û pênc (25) zimanan pirtûk, bi deh hezaran belge, belavok, foto û diyapozîtîv hene. Bend û me-

qaleyên ku ji sala 1915 bi vê de bi zimanên ewropî li ser Kurdan derketine hene, kolleksiyonên kovarên kurdî yên li Iraq, Îran, Sûriye, Libnan, Tirkîye û Ermenistanê derketî, ên kovarên rêxistin û komelên kurdî an kurdparêz hene. Lêger, xwendekar, rojnamevan ji Fransa û ji gelek welatan - Japon, Awistralya, Amerîka, Hindistan, Çîn jî tê de - tîn, jê kel digirin ji bo nivîsar û xebatên xwe yên li ser Kurdan. Xwedîkirin û dewlemendkirina pirtûkxaneyekê yek ji amancên serekeyên Enstîtuyê ye. Enstîtu tu karek din neke, tenê vê pirtûkxaneyê xwedî ke û vekirî bihêle, ewê xizmeteke mezin bike ji bo çanda kurdî.

DI SALÊN PÊŞI YÊN VEKIRINA ENSTÎTUYÊ DE GELEK AKTÎVÎTÊTÊN WE DIHATIN BIHÎSTIN. WEK MÎNAK; WE PÊŞANGEHÊN RESAMÊN KURD LI DARXISTIN, KURSÊN ZIMÊN DIDAN, KOVAREKE LÊKOLÎNÊ BI NAVÊ "STUDIA KURDICA" DERDIXIST, KOVAREKE BERFIREH YA KULTURÎ BI NAVÊ "HÊVÎ" Û WE SALÊ GELEK BÛRS JI BO XWENDEVANÊN KURD DERDIXIST. GELO EV XEBATÊN WE HÊ JÎ BERDEWAM IN? GER NE BERDEWAM BIN SEDEM ÇI YE?

Di salên 1986-1987 an de, hikûmeta fransîz a rast, li ser daxwaziya Iraq û Tirkîyê arîkariya malî ya ku ji Enstîtuyê re dihate dayîn birrî. Ji ber kêmasiya îmkanan weşanên me û xebatên me di van du salan de kêmtir bûn. Lê ji 1988 an bi vê de xebatên me di her warî de, ji salên destpêkî gelek xurttir in. Ji bo nimûne Enstîtu

ta niha bi zimanê kurdî 18 filmên vîdeo, bi zimanên din (îngilîzî, fransîzî, tirkî) jî 3 videoyên li ser Kurdan, 22 kasetên musikîya kurdî weşandiye, bi fransîzî, kurdî, tirkî, îngilîzî, erebî pirtûk dane çap kirin. Tenê di 1992 an de ji bo xwendegehên destpêkî û navîn ên Kurdîstana Iraqê li ser hev 290 hezar pirtûkên xwendinê, bi kurdî, daye çap kirin û ji 130.000 zarokên kurd re defter-qelem hwd. şandiye. Heçî çalakî yên wek pîşangeh, konferans, semînar, hwd. lîsta wan dirêj e, di rapora me ya xebatê ya 1992 an de 7 rûpel digre. Di dema ku em vê hevpeyvînê çê dikin li çar bajarên îtalî yên navçeya Emilia Romagna em bi şaredariyan re pîşangehên hunermendên kurd çê dikin. Ji 15 ta 30 ê nîsanê li Enstîtuyê pîşangeheke hunermendekî kurd (Rêbwar) tevî Fransîz û Poloniyek bi navê "Barana Çivîkan" çê dibe. Emê di meha 11 an de li mestîrîn galeriya hunerî ya Parîsê (Galerie Internationale, bêtirî 1.000 m<sup>2</sup>) pîşangeheke pîrr mezin çê kin ji bo hunermendên kurd ên Iraqê û ên dervayî welêt. Rojname û kovarên van welatan li ser van çalakiyan dinivîsin, heye ku dengê me heta welatê we neyê, ji ber ku hûn li serê dinyayê ne. Ji ber aktualîta giran û dramatîka Kurdîstanê em bi xwe jî di weşanên xwe de pîrr qala van çalakiyan nakin.

Enstîtu hersal dîsa, û ji berê bêtir, bûrsên xwendinê dide xwendekarên kurd. Par me, tevîhev, 24 bûrsan da. Ta niha, di 10 salan de, Enstîtu 196 xwendekarên kurd dane xwendin, ji wan 32 kes xwendina xwe nîvcû hîştin, neqedandine; ên dinê tamam

kirine an dixwînin.

Heçî kovar, bultenên agahdariyê û Kurmancî bi pergal derdikevin. Di 1992 an de hejmareke Hêvî derket. Îsal hêviya derxistina du hejmaran heye. Mixabin potansiyala nivîskariya bi kurdî kêr e; ya ku heye belawela ye, têra çend kovaran nake û kovara Hêvî jî sirf ji bo ku bêtir derkeve nikare her nivîskarî çap bike. Lewra bi pergal derketina wê dijwar e. Ev dijwarî ji bo Studia Kurdica jî heye. Lê îsal hejmareke wê ya erebî di çapê de ye, û ewê hejmareke wê ya tirkî, du hejmarên wê yên erebî yên din jî derên.

LÊ TIŞTÊN XUYAYÎ XEBATÊN WE YÊN LI SER ZIMÊN HER BERDEWAM IN. HÛN SALÊ DU CARAN ZIMANZANÊN KURD DICIVÎNIN Û LI SER ZARAVAYÊ KURMANCÎ LÊKOLÎNAN DIKIN, GOTINÊN NÛ ÇÊ DIKIN. WEK TÊ ZANÎN EV XEBATÊN WE LI DERVEYÎ WELÊT DIBIN. GELO ÇIMA HÛN BERÊ VÊ XEBATA HA NADIN WELÊT?

Xebateke wilo niha tenê li derveyî welêt mimkin e. Ji ber gelşeyên siyasî û tevliheviya giştî li beşek li Kurdistanê vê xebatê pêkanîn ne mimkin e. Heye ku di pêşerojê de, mecal hebin, em ji welat gazî çend kesan bikin. Di milê din de, ji bo ku encamên van civînan baştir li nav Kurdistanê Bakûr belav bin, emê 10 hejmarên pêşînên Kurmancî (rojname taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî) li Stembolê bidin çap kirin. Heye ku

paşiyê Kurmancî bi xwe jî li wir bê çap kirin. Xebata kirî, zû an dereng, ewê bigihê destên gel. Em çawa niha pey xebatên salên 1930 an ketine, ewê Kurdên ku bixwazin encamên xebatên me peyda bikin.

WEK TU JÎ DIZANÎ KU PIŞTÎ WE, DU ENSTÎTUYÊN DIN JÎ VEBÛN; YEK LI BRUKSELÊ, YA DIN JÎ LI STEMBOLE. DANÛSTANDINÊN WE BI HEV RE ÇAWA NE?

Danûstandinên me bi hevalên Brukselê re baş û germ in, lê haya me zêde ji Enstîtuya Stembolê tune.

BI A WE ÇAND Û EDEBIYATA KURDÎ DI ÇI REWŞÊ DE YE? DI WARÊ ÇAND Û EDEBIYATA KURDÎ DE ENSTÎTUYA WE DIKARE ÇI BIKE Û PLANÊN WE YÊN PÊŞEROJÊ ÇI NE?

Bersiva giştî ya vê pirsê, bawer nakim hebe. Rewşa Kurdistana Başûr gelek cihê ye. Li wir, kurdî di her warên jiyandê de tê bi kar anîn, talûka windabûn an jihevketina ziman û çanda kurdî kêr e; pirsê pêşvebirin, nûkirin û dewlemendkirina wê heye. Ev pirs bi sewiya pêşveçûna giştî, bi taybetî ya entellektueliya civaka kurdî ve girêdayî ye. Civaka kurdî ya Iraqê, civakeke Cîhana Sêwem e, ji ber hoyên siyasî danûstanên wê û cîhana derva bêtirî 30 salan e pirr kêr bûne, ketiye nav getoyekî teng. Divê ku derî û pacyên wê ji dinya derve re vebin, hewayek nû bikeve hindûr, haya wan ji bayên nû yên dinê hebe.

Danûstanên bi cîhana derve dikare bi riya vegeza ronakbîrên kurd ên der-vayî welêt, bi şandina kovar û pirtûkên ewropî, a çûna Ewropiyên ji bo semînar û konferansan an bi hatina ronakbîr û nivîskarên kurd ên Iraqê ji bo Rojava dibe. Di vî warî de Enstîtu niha dixebite ku tevî Zanîngeha Hewlêrê rêzeke konferansan amade bike, ronakbîr ji Ewropa herin; kovar û pirtûkên nû herin. Ez bawer im, di nav salan de, ewê Kurd paşdemayina xwe telafî bikin.

Heçî rewşa çand û edebiyata kur-mancî, rewş di dîtinê ji berî 10 salan gelek çêtir e. Bi kurmancî bêtir pirtûk û kovar dertên; hejmara kesên ku bi kurmancî dixwînin û dinivîsînin bêtir e. Lê mixabin di eynî wextê de li welêt bi xwe, ji ber bûyerên siyasî - koça bi milyonan Kurdan ber bi Tirkiya Rojava, valabûna gundên kurd, weşanên televîzyonên tirkî - , gelê kurd ketiye nav gîrdaba bişivîna neteweyî û asimilasyonê. Ta niha jiyana gundîtiyê ziman û çanda kurdî ta dereceyekê diparast. Ev jiyana îro ji ber bûyerên siyasî ji hev dikeve, winda dibe. Hebûna Kurdan wekî gelekî cihê, xwedî ziman û çandêke serbixwe dikeve talûkeyeke mezin. Ku pêşî li

vê çûyinê neyê girtin ta du nîşên (neslên) din li Kurdistana Bakûr ziman û çanda kurdî namînin, çawa Îrlandî îro ji sedî not û dido bi Îngîlîzî dipeyivin, ewê Kurd jî bi tirkî bi-peyivin, bêjin, "pêşiyên me Kurd bûn". Karên ku em di vê rewşê de bikaribin bikin, weke bi şûr ajotina ser top û tankan e. Carna hin hevalên biyanî dibêjin hun wek eskerên poloniyên ku di şerê cîhanî yê duwem de bi hespên xwe dajotin ser panzer û balafirên Hîtler. Ez nizanîm ta çi derecê ev muqayese li cî ye. Lê, tiştê ku ez dizanim ew e ku ta ku jiyana hebe, hêvî heye, berxwedan heye. Berxwedan ferz e. Agirên gurr jî bi çirûskeke an pêtiyekê dest pê dikin. Emê di demek munasib de li Tirkiyê dest bi weşandina ferhengên kurdî, rêzimanên kurdî, nivîsar û pirtûkên klasîk ên kurdî bikin, video û kasetên kurdî derxin. Hin projeyên din jî hene ku dem hat emê car din belav bikin. Emê tevî hemû welatparêzên kurd bixebitin, hewl bidin, sernivîsa xwe ya reş biguhêrin ta ku paş vê zivîstana xedar a jiyana me ya gelêrî û çandî, tovên xesarnedîtî hêşîn bibin, geş bibin, bihareke geş û rengîn dest pê bike di ziman û çanda kurdî de.

# LI SER NAVÊ ENSTÎTUYA KURDÎ YA STEMBOLÊ



Feqî HUSEYN

NÛDEM - GER EM ENSTÎTUYA  
KEVNESOVYETÊ NEHESIBÎNIN, DI DEMA  
NÊZÎK DE LI PARÎSÊ ENSTÎTUYA KURDÎ  
VEBÛ. PIŞTÎ GIRTINA YA BONNÊ, VÊ  
CARÊ JÎ LI BRUKSELÊ ENSTÎTUYEKE  
KURDÎ VEBÛ. NIHA JÎ VAYE WE LI  
STEMBOLÊ ENSTÎTUYEKE KURDÎ VE-  
KIRIYE. JÎ BO ÇI WE HEWCEDARIYA  
AVAKIRINA ENSTÎTUYEKE NÛ DÎT?  
TIŞTÊN WE JÎ ENSTÎTUYÊN DIN VE-  
DIQETÎNIN ÇI NE?

FEQÎ HUSEYN - Her çiqas di hinde  
enstîtuyan de hînkirin, ders û per-  
wirandin hene jî lê mebest ji ens-  
tîtuyan lêgeran û vekolan e. Gava  
enstîtu di peywira (wezîfa) xwe ya  
misogerî (heqîqî) da bêne bikaranîn,  
gelek karên qenc ji wan têne dîtin.  
Hêvîdar im ku enstîtuyên Kurdî hemî  
jî di peywirên xwe yê binyatî da  
bêne xebitandin. Ne du enstîtu, bîst  
enstîtu jî têra lêgeran û vekolana  
windayên Kurdî nakin. Vaye hûn  
dibînin ku çendîçend sal in vegirtox  
û mijoker, bi çî rewş û awayî li  
windakirina dîrok, wêje (edebiyat),  
folklor û hemî hêjanên Kurdî di-  
xebitin. Bi windakirina van hêjayan  
jî tenê ranawestin, li hinekan jî xweyî  
derdikevin û "yên mene" dibêjin. Bi  
min be ji her zanînekê Kurdî ra sê-çar  
enstîtu pêwîst e. Ew jî her yek ji wan  
bi zimhêrekê (butçeyekê) giran bêne  
destek kirin.

Ji hevcihêbûna enstîtuyan xebata  
tekûse. Ango kîjan qenc û tekûs  
bixebite û karên qenc bike ew ji yê  
din çêtir e. Hêvîdar im dê hemî  
enstîtuyên kurdî jî qenc bixebitin û  
menzîla vekirî dadin. Dîsa hêvîdar  
im hê gelek enstîtu jî bêne vekirin û  
xwe bigihînin hewara hêjanên Kurdî  
yên windayî.

WEK HÛN JÎ DIZANIN EV HERDU  
ENSTÎTUYÊN KU HENE, HERDU JÎ LI  
DERVEYÎ WELÊT IN. LÊ WE JÎ LI DERVEYÎ  
WELÊT, LI STEMBOLE ENSTÎTUYA XWE  
AVA KIR. JÎ BO ÇI WE EV BÛYERA  
DÎROKÎ NE LI DIYARBEKIRÊ, LÊ LI  
STEMBOLE LI DAR XIST?

Çawa be hûn jî dizanin, ne li Diyarbekrê û ne jî li tu bajarên Kurdistana bakur, îro çara damezirandina zanîngeh, dibistan û enstîtuyên Kurdî nîn. Li Stembolê damezirandina van pûngalên zanîna Kurdî ne hêsan in. Ango ew hêsanîyên li derveyê Tirkîyê heyf, hemine ku li vir nayê hizirîn û ji xwe em li pê wê jî nagerin. Tenê di nav bêçareyî, bê ewleyî de û di bin stemkariya giran da ev kar hatiye bikaranîn. Meşandina wê jî pir zehmet e. Kêmasiyên aborî, kêmasiyên pispor û mirovan têrê nake, di ser da jî di bin hincirandina polîsan da tête meşandin. Heker enstîtu li bajarekî Kurdistanê hatibûya damezirandin.....

.....\*li Diyarbekrê enstîtuya Kurdî bihata vekirin ka dê çi bihata serî û dê çi bihata serê damezirandoxan? Belê em dizanin welat benda me ye û benda vekirin û damezirandina dibistan û enstîtuyan e. Ew jî hemî di hundirê welatê pîroz da. Qenc dizanim ku welat ji me pir xeyidî ye lê di îro da çara me ev digihîjê. Divê welat jî li kêmasiya me nenêre. Hêvî û gumana me ew e ku demek zû em hemî û digel enstîtuyên xwe bi şahî biçine welat, li nav welatiyan. Em jî welatê xwe mîna welatên biyaniyan ava bikin û welatiyên xwe jî bi çand û teknîk bigihîjin. Heya em bigihîjin vê daxwaza bilind, bi hezaran kîlometre dûrê welat be jî li ser çanda netewî xebata me peywîst e.

PIŞTÎ AVAKIRINA ENSTÎTUYA WE  
ME JI ÇAPEMANYÊ BIHÎST KU POLÎSAN

LEWHEYA WE DAXISTIYE, HÛN DI BIN  
TAQÎBA WAN DE NE. GELO EV ÊRÎŞÊN  
WAN HÊ JÎ BERDEWAM IN?

Belê çawan we ji çapemanyê bihîstîye, roja me enstîtu vekir, polîs hatin bi destê zorê tabeleya me daxistin û redestê me kirin. Dûre bi devkî ji me ra "Heger îşareteke Mezopotamya kûltûr merkezi li ser tabeleya we hebûya, hemine ku me nedikariye daxista. Lewra ew şirketeke bazirganî ye" gotin. Me jî bi navê: "Mezopotamya Kûltûr Merkezi limitet şirketi" tabelek nivîsand û li ser tabeleya "Enstîtuya Kurdî" monte kir û daliqand. Êdî tabeleya enstîtuya me wilo bû: "Mezopotamya Kûltûr Merkezi Ltd. şti. Kürt Enstitüsü, Enstîtuya Kurdî". Lê cara dudan dîsa polîsan tabeleya me daxistin. Vê carê êdî diwartir bi ser me ve hatin.

Divê bête zanîn, gava me neh damezirandoxan teşebusa damezirandina Enstîtuya Kurdî kir, pêşî ji alî me ve rêzikên (qanûnên) Tirkîyê hatin dahûrandin. Hate dîtin ku di rêzikan da bi serê xwe enstîtu nayên vekirin. Tenê ji alî zanîngeh, weqif û şirketan ve tene vekirin. Me jî gorî rêzname û destûra Navenda çanda Mezopotamya û bi navê wê vekir. Ango enstîtuya me çiqekê şirketeke bazirganî ye. Dîsa jî destûra daliqandina tabelayê (lewhe) nadin û enstîtu di bin çavnêriyê da ye.

Belê em di bin taqîba wan da ne û êrîşên wan bê kêmasî didomînin. Çûna

enstîtuyê di dest me da ye lê hatin ne kifş e ka di dest kê da ye. Çend roj berî niha polîs hatin enstîtuyê û mêhvan jî birin. Di polîsxana siyasî da gelek hincirandin û cincirandin kirin (îşkence kirin). Dûra jî hatin bi nêhanî (xef) deriyê Enstîtuyê şikandin. Ango ji bo xebata enstîtuyê hîç ewleyî tune. Her roj îhtimala girtin, birin û pelixandinê heye. Xebat di nav bêçareyê de tê kirin. Tirs û welwele tu carî ji dilê karmendên di enstîtuyê da dermayên.

Herwekî ev têrê nake, em dane mehkemê jî. Heya niha du-sê mehkeme li me hatine vekirin. Dawiya mehkeman dê çawan bibin em nizanin. Ya tê zanîn, ev mehkeme welê rêzanînin û gorê rêzaniya dewletê ya rojanî biryar têne dan. Hemine em bi perûyên qenc neyêne perû kirin. Ji xwe gava doza Kurdantê himatê (holê) her kes huqûqê ji bîr dike. Zêde dirêj kirin naxwaze lewra her kes van bûyeran dizane û hûn jî dizanin.

DI BIN TIRSEKE PSÎKOLOJİK DE HÛN ÇAWAN DIKARIN BIXEBITIN?

Di van salên dawî da tirs êdî zêde bûye. Çawan li jorîn jî hatibû dabaşkirin xebata me di bin hincirandin û cincirandinê da tête meşandin. Her dem girtin, êşandin cenciserî, cincirandin û avêtina zîndanên ne ciyên mirovanî heye. Di nav tirs û welwela giran da kar tê meşandin. Enî jî ditirsin, lê pêwîstiya kirina van karan tirsê me mat dike û serdikeve.

Hevalan ji bandora (tesîra) bûyeran zêdetir berê xwe dane kamiran û bextiyariya dawî. Bi vî awayî xwe jêhatî û psîkolojiya xwe derman dikin û qasî çare heye xebata xwe dimeşînin. Di vê babetê da dixwazim ji we ra pendek bibêjim:

Ji Hizana navça Bitlîsê mirovek xewnekê dibîne. Ji bo şirovekirinê diçe nik Mele Emerê Gulpikî yê pesqelyar (nuktedan). Piştî kêfxweşîdana hevdu, xewndar jê re dabaşa xewna xwe dike û daxwaza şirovekirinê jî jê dike.

Mele Emer:

- Hinek bê ewleyî di vê xewna te de dixuye.

Xewndar:

- De ka bêja seyda, ew bê ewleyî çi ne û ezê çawan ji wan bifilitim?

Mele Emer:

- Wisa dixwiyê, wê tu sê salan pir tengasî bikişînî.

Xewndar:

- Baş e seyda, piştî sê salan dê çawan be û dê çi bibe?

Mele Emer:

- Xwedê dizane, lê wê tu êdî hînbî.

XEBATÊN WE YÊN SEREKE ÇI NE?  
HÛN DIKARIN MÎNAKAN JI ÇALAKÎ Û  
BERHEMÊN XWE BIDIN?

Çawan me li jorîn jî gotibû, peywira enstîtuyan ya hêmanî lêgeran û vekolane. Hemine ku gava dest bi lêgeran û vekolanên ji dil bêne kirin, zûbuzû afirînek (berhemek) nayên hizirîn. Nemaze lêgerana zanînen



Kurdî. Hûn jî dizanin, bi çî awayî zanîn û çanda kurdî hatiye taromar kirin û dabelandin. Heker tabir dirist be, çanda kurdî di devê ziha (ejderha) da ye. Hemin, derxistina wê ne hêsan e û ne jî zû pêktê. Va neh mehe enstîtuya me hatiye vekirin. Di enstîtuyan da lêgeran û vekolînên zanistî neh meh demeke pir kurt e. Divê demek dirêj hewî bête kirin.

Di nav van bêçareyî û kêmasiya pisporan da, me ji bo kursiya dîrokê encûmenek daniye û dest bi xebatên hêja kirine. Ji bo kursiya ziman û wêjeyê jî, ji her yekê ra encûmanek hatine danîn û her yek dest bi xebatên xwe kirine û didomînin.

Ji bil van xebatan, gelek afirînekên destnivîsên kevnare yên wêjeyî hatine peyidandin û li ser hinek ji wan xebat dest pê kirine. Hêvîdar im di demek ne pir dirêj de çara çapandina hinek ji wan bi dest me bikevit. Tenê ji bo mihtaciya rojane, ji alî enstîtuya kurdî û weşanxana Komalê ve elfabek hatiye amade kirin û radestê weşanxanê hatiye kirin. Di hezra min da ew elfabe dê di demek nêzîk da derkevit û ji bo demek kurt, dê welaî havil jê bibînin.

PIŞTÎ BÊDENGİYEKE DIRÛJ YA HEFTÊ SALAN, JI NÛ VE İMKANEKİ WİLO KETIYE DESTÊN KURDAN. LOMA JÎ WÊ BARÊ WE GIRAN BE, WÊ GELEK TIŞT JI WE BÊNE XWESTIN. DI NAV VAN HEFTÊ SALAN DE ZIMAN, EDEBIYAT Û HER CELEB ÇANDA KURDÎ QEDEXE BÛYE, ZIMANÊ KURDÎ CARINA KETIYE TALÛKA

WINDABÛNÊ. JI BO JI NÛ VE VEJANDINA ZIMAN, EDEBIYAT Û ÇANDA KURDÎ PLAN Û PROGRAMÊN WE ÇI NE? HÛN DIKARIN ÇI BIKIN?

Em bi giraniya barê xwe dizanin. Ne ku giran teniya pişta mirov jî dişkîne, em bi vê jî dizanin. Lê em bi ezm û karîna derketina ji bin vî barî derketine ser vê rêyê. Baweriya me bi serketina me heye.

Plan û programên me ew in ku pêşî em dest navêjine mijarên girîng, em dest davêjine yên girîngtir. Me dest avêtiye gramer û rastnivîsa zaravayê Kurmançî. Ji bo destavêtina zaravayê Zazakî(Dimilî) jî em li mirovên pispor digerin lê hê jî têra danîna wî, mirov bi dest me nekitine. Di rojên nêzîk da dê encûmena ferhengê jî bête damezrandin. Pêşî gorê mihtaciya ferhengeke basî, dûra dê ferhengên ji dil bêne nivîsandin. Ji bo rizgar kirina jîna afirînekên me yên wêjeyî (edebî) yên destnivîs, di bernamêya me da hatiye çî kirin û berhevkirina wan despê hatiye kirin. Xwezayî, bi berhivandin û cild kirinê tenî kar naqede, divê xebatek giran li ser wan bêne kirin û bêne çapandin. Bi vî awayî ew afirînek bikevine bin xizmeta gel.

Lêgeran, vekolan, dahûrandin û nivîsandina dîrokê jî bernamêk ji bernamêyên me ye. Bi kurtasî di bernamê me da xebat li ser dîrok, wêje û zimanê Kurdî ye. Xwezayî ew fêmên têne nav, van her sê hêmanan, ew jî bê kêmasî dê bêne dahûrandin.

Ew dîrok û rêzimana me yên ku

heya niha hatine nivîsandin, ji ber ku di encûmanên zanistî ra derbas nebûne û ji alî encûmanan va jî nehatine nivîsandin, wan hemî em hiltînin destê xwe, ji wan havil dibînin. Hemine ku ew rêzimanê min nivîsandiye (Hêmana Rêzimana Kurdî) ew jî yek ji van afiraneke e. Ji wî jî tenê dê havil bête dîtin.

PEYWENDIYÊN WE BI ENSTÎTUYÊN PARÎSÊ Û BRUKSELÊ RE ÇAWA NE? GELO TUNEBÛNA PEYWENDIYÊN ENSTÎTUYÊN KURDAN JI BO ME NE ZERAREK E?

Mitliq zerareke pir mezin e. Ge-reke weha nebûya. Di welatê me da rêzikek heye: Gava mirov malek datîne an jî kargehek vedike, dost ehab, heval, hogir û hevkar diçine seredana wî. Em bendî vê yekê jî ranewestan. Di dema vekirina enstîtuyê de ji enstîtuya kurdî ya Parîsê

ra me xundname verê kir, tu kes ne şandine mihricana vekirinê. Em ji vê yekê aciz nebûn, me got, belkê çawa wan nîne kes neşandiye. Pîrozbahiyek jî ji me ra neşandin. Dûra jî ne pîrozbahiyek din ji me ra şandin û ne jî bi me ra temas kirin. Vêca me got belgê bi me ra diyalog danîn ji xwe ra zerar dizanin, an jî naxwazin.

Dawiya meha berfanbara 1992 yê ji bo karek ez çûbûm Elmanyayê. Di navekra karê min sivik bû, ez derbasî Holadayê bûm. Ji wir min diyalog bi Enstîtuya Kurdî ya Brukselê re danî û ez çûme seredana wan. Bi nêzîkahî min Perwîn û Derwêş nasî, em gelek peyivîn û me bi hev ra şîvek xwar. Hemine ez mêhvanê wan bûm. Bi dilxweşî û bextiyarî me xatir ji hevdu xwast.

Bernama me ne tenî ji enstîtuyên kurdî ra, ji hemî enstîtu û zanîngehên cîhanê ra yê bixwazin bi me ra kar bikin vekirî ye.

---

\* Ji ber ku F. Huseyn bersivên xwe bi faxê ji me re şandibû, çend gotin ji vê rêzê nedihate fêhmkirin. Loma me şûna wan vala hişt. Em ji F. Huseyn û ji xwendevanên xwe yê delal lêborînê dixwazin.

# SEKRETERÊ ENSTÎTUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ



Derwêş M. FERHO

NÛDEM - PIŞTÎ AVAKIRINA ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ, WE JÎ LI BRUKSELÊ ENSTÎTUYEK VEKIR. JI BO ÇI WE PÊWÎSTIYA AVAKIRINA ENSTÎTUYEKE NÛ DÎT? TIŞTÊN KU WE LI ENSTÎTUYA PARÎSÊ VEDIQETÎNIN ÇI NE?

DERWÊŞ M. FERHO - Wek tê zanîn bingehê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê ne nuh e. Bingehê wê kevintir e. Di sala 1978 an de hîmê Têkoşer, Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljîka hat danîn. Di bin wî navî de me yanzdeh salan xebat kir.

Têkoşer di van yanzdeh salan de xebatek hêja kir. Ew neket bin tesîra partiyên Kurd yên siyasî. Vê rêxistinê armanca xwe ji roja pêşî ve diyar kir. Divabû ev rêxistin Kurdistanî ba. Ne girêdayî tu hêz an partiyê siyasî be. Me xebata xwe jî weha domand. Herçend ev xebata me ne di bin tesîra partiyên siyasî de bû jî endamên rêxistinê xwedî bîr û baweriyên cihê bûn. Hin ji wan jî di nav hin partiyên siyasî yên Kurd de xebat dikarin. Lê mafê tu kesî nebû ku siyaseta partiya xwe li ser xebata rêxistinê mecbûr bike. Û endaman jî li ser vî bingehî xebat dikir. Rojek problem li ser vê yekê derneket û xebat ne feşkilî. Her roja ku diçû xebat û nêzîkahî di nav hevalan de xurttir dibû. Prensîba karê bi hev re li nav rêxistina Têkoşer, lê di nav partiyên xwe de xebata siyasî li gor programa partiya xwe hatibû qebûl kirin.

Eger em amancên Têkoşer bi kurtayî li vir bêjin emê bibînin ku ev xebata bi hev re ne dijwar e:

Jîndarkirin, pêşvebirin û nasandina xebata çandî li ser ziman, dîrok, edebiyat û hunera kurdî. Alîkirina Kurdan ji aliyê civakî û çandî ji bo hêsankirina entegrasyona wan di civata Beljîkî û Ewropî de, bê ku ew

şexsiyeta xwe ya kurdî winda bikin. Ev her du amancên ha bi xebata agahdarî û gihandinê di warên cihê yên civakî û çandî de bi cî dibin. Hevkarî bi kes û rêxistinên ku bi pirsên civakî û çandî yên Kurdan û derhatiyan mijûl dibin re.

Bi van amancan xebat diçû. Roj bi roj xebat, bar girantir dibû. Xebata me ya çandî û agahdarî zêde dibû. Li nav Beljîka rêxistin baştir dihate nasîn. Têkoşer bûbû xwedî navekî girîng. Ev jî bû sedema ku em navê xwe biguherin.

Di destpêka sala 1989 an de di kongra xwe de me biryar stend ku em navê rêxistinê biguherin. Wê çaxê me Enstîtu navê herî meqbûl dît. Bi biryara kongrê me navê rêxistinê kire Enstîtuya Kurdî ya Bruksel. Lê xebata me li ser eynî bingehê dibe. Ev raste ku xebata rêxistinê deh qat zêdetir û girantir bûye, lê bingehê amancên me eynî ne.

Ne berê û ne niha tu girêdanên Enstîtuya Brukselê bi Enstîtuya Parisê re nîne. Wek du rêxistinên Kurd, her yek xebata xwe li welatê ku ew lê ne li gora şertên xwe dike. Dibe ku xebata herdu Enstîtuyan nêzî hev be, lê nayê wê manê ku ew girêdayî hev in. Bi temamî û di her xebata xwe de tu girêdanên wan bi hev re nîne.

HERÇIQAS XWENDEVANÊN ME JI HEBÛNA WE HAYDAR IN JÎ, LÊ HAYA GELEKAN JI WAN JI XEBATÊN WE TUNE NE. XEBATÊN WE ÇI NE?

Xebatên Enstîtuyê bi kurtayî ev in:

Xebata rojane: Ji duşem heta îne, fêrên ziman, alîkariya civakî, weşana bultena agahdariyê, dosya û pirtûk bi zimanên cihê, berhevkirina dokumentasyonê li ser Kurdan, pêkanîna konferans, şev û rojên agahdariyê, hevkarî bi zanîngehên cihê re û hwd.

Di aliyê weşanê de:

Bultena agahdariyê bi Kurdî, Îngilîzî, Frensî û Holandî.

Dîroka Kurdistan, bi Frensî.

Dîroka Kurdistan, bi Holandî.

Dîroka Kurdistan, bi Îngilîzî.

Muhtasar Hayatım, Ekrem Cemil Paşa, bi Tirkî.

Jana Heft Salan, Şahîne B. Soreklî, helbest, bi Kurdî.

Memê û Eysê, Taharê Biro, piyes, bi Kurdî.

Kurdish Nationalism in Mem û Zîn, Ferhad Shakely, bi Îngilîzî.

Kawa Efsanesî, Nêrgîza Torî, bi Tirkî.

Kaseta Hozan Birader.

Kartên cihê yên bi reng.

BERÎ KU HÛN BIBIN ENSTÎTU HÛN KOMELEYEK BÛN. WE LI SER NAVÊ KOMELA XWE BI NAVÊ "TÊKOŞER" KOVAREKE EDEBÎ Û ÇANDÎ DERDIXIST. LÊ PIŞTÎ VEKIRINA ENSTÎTUYÊ EV XEBATA WE RAWESTIYA. JI BO ÇI?

Me kovara TÊKOŞER heta jimara 43 an weşand. Lê piştî ku em bûne Enstîtu û xebat zêdetir bû me hew dikaribû ew bar jî hilgirta ser milê xwe. Di cihê kovara TÊKOŞER de me dest bi weşana BULTENA A-

GAHDARIYÊ kir. Weşana vê bultenê di aliyê xebatê de girîngtir e. Feyda wê mezintir e. Me 300 heb TÊKOŞER ji Kurdan re dişand, lê em vê kêliyê 900 Bultena Enstîtuyê bi çar zimanan poste dikin. Ji bo agahdariya civaka ne Kurd bultenên weha pirr muhîm in.

ÇEND PIRTÛKÊN KU LI SER NAVÊ ENSTÎTUYA WE DERKETINE GIHÎSTIN ME. GELO EV XEBATA WE YA ÇAPKIRINA PIRTÛKAN HÊ JÎ BERDEWAM E? HÛN ÇI CELEB PIRTÛKAN ÇAP DIKIN?

Min li jor lîsteya weşanên Enstîtuyê nivîsand. Amanca Enstîtuyê weşan û belavkirina pirtûk û xebatên din yê çandî, dîrokî, civakî û edebî ye. Heta niha me çend heb pirtûk weşandine. Gelek jî li benda weşanê ne. Lê ji ber sedemên malî em nikarin wek daxwaza dilê xwe bikin. Her cara ku îmkân çêbûn emê vê xebata xwe berdewam bikin.

BI A WE ÇAND Û EDEBIYATA KURDÎ ÎRO DI ÇI REWŞÊ DE YE? DI VÊ DERHEQÊ DE PLAN Û PROGRAMÊN WE ÇI NE?

Çand û edebiyata Kurdî zengîn e. Em hemî vê yekê baş zanin. Lê problem li ba me ye. Em Kurd bi xwe, qedir nadine çanda xwe, edebiyata xwe û hebûna xwe. Pirr kes ji me Kurdan temamiya enerjîya xwe

didin ser çand û edebiyata dewletên ku me wek gel, çanda me, edebiyata me dipelçiqînin. Di eynî demê de ew çand û edebiyata me jî ji wan dewletan re werdigerînin û ji wan re diyarî dikin. Wek çand û edebiyata wan didin nas kirin.

Lê dîsa em bê hêvî nebin. Bîlakîs, hêviyên me pirr mezin in. Çand û edebiyata me hingî zengîn û xweş e besî me jî û diz û talankeran jî dike.

Nivîskarên Kurd li her alî peyda bûne. Li ser her babetê weşan derdikevin. Roj naçe ku meriv pirtûkên nuh, navên nivîskarên nuh û xebatên nuh nabihîze. Ev meriv pirr şah dike.

WEK HÛN DIZANIN JI DERVEYÎ WE DU ENSTÎTUYÊN DIN JÎ HENE; YA PARÎSÊ Û YA STEMBOLE. PEYWENDIYÊN WE BI HEV RE ÇAWAN E? GER PEYWENDIYÊN WE BI HEV RE TUNEBIN SEDEM ÇI YE?

Wek me li jor jî got Enstîtuya me serbixwe ye. Enstîtuya Brukselê li gora şertên xwe li welatê ku lê ye, Beljîka, xebata xwe didomîne. Enstîtuya me rêxistineke çandî ye û Kurdistanî ye. Tu girêdanên me, ne bi hêzên siyasî û ne bi rêxistinên din re heye. Lê nayê wê manê ku em ji xebata bi hev re deriyê xwe digirin. Dibe ku di salên pêş me de em hin tiştan bi hev re bikin. Lê dîsa ev xebata bi hev re jî ew ê li ser bingehe serbixwebûna her rêxistinê be.

Sê helbest ji Rojen BARNAS

## DE WERE HA!

---

Rojen BARNAS

Axlêfe jî hat, bihurî û çû  
Rewa ket hewayê, avê û axê  
Ştrika jiyan û hezkirinê  
Hilkişî li darê, ta serê şaxê  
Rê dipê, rê dipê, rê dipê heywax!  
Ne ji te nûçeyek, mizgîniyek hê...

Keledoj , keledojeh e, dilê min  
Di perengên hesreta te de  
Ku biketa navê Roja Tebaxê  
Dê bihelya  
Ewê bibiwa barana dojhvereş  
Û bibariya bi ser me de.

Lê nizanim, heyret!

Dilê min hêtûn e, ji evîna te  
Dilê te zemherîr e, zeber e, gêdûk  
Dilê te deryaya qeşemê,

Çi deryayek sar, qerisî, tezî,  
Ji evînê bêhay,  
Ne damar dijene, ne reh lêdixe.  
Di tanga min de, dilê te;  
Hişk û tevizî.

Xwezî...  
Ax xwezî ne wisa ba!

Axlêfe jî hat, bihurî û çû  
Rewa ket hewayê, avê û axê  
Hewa hênik,  
Av şîregermî,  
Ax hêşîn...  
Dilê min li benda rewaya xwe ye  
Bi kelebîn...

De were ha!  
De were zû  
Hê ku jîn nefirî, û ji dest neçû.

# BIHAR E, ÊDÎ!...

Bihar e, êdî bihar e, Roza!  
Gupik bi gupik in, gulî li darê.  
Balinde di çerxa dîlanê de,  
Serxweş in bi evîna biharê.

Şirfîna avê ye, dişirşire  
Di devê mesîlê, li qûntarê.  
Ji zinarên hişkên di gelî  
Xwê dide av, bi çiraneke tê xwarê.

Spiyê d'gevez, ji hinarîkên te  
Kulîlkên li gulyên dara behîvê  
Min ji min dikşîne bal te ve dibe  
Mizgîna nexuyan j' meha adarê.

Bihar e, êdî bihar e, Roza!  
Destê keremê ber bi cihanê.  
Destê min vekirî, başkurî te ye  
Destê te y'keremê li ku ma, kanê?



# MEYILDARÎ

Li devê newalê bilbilek  
Li ser şaxeke gulê berdestî sibê  
Stra û stra û stra  
Gul çi kir, nizanim...  
Lê ji gundê me  
Ne kes pê hesiya  
Û ne jî kes  
Li cendekê wî geriya

Bi "selatun xeyrun el-mînen newm"  
Ya banga melê gund  
Hacî Miheme, sofî Smaîl û xalê Mîrzo  
Hêdî hêdî rabûn li êlamê çûn.  
Ji xwe kes tune bû ku wan bigire di nav nivînan  
Hin kalemêr û hin jê jî bî bûn.

Em gişt rakirin ji xewa şîrîn,  
Ji nav nivînên me yên germ  
Û ji paşilên  
Stiyên me yên "Rabîayên Bedewî"  
Kereke kertik-qetayî, li bêdera jêrîn  
Bi zîtîk û zirîn.

Meyla her yekî bi awakî  
Kula her kesî cihê:  
Guhê hinan li melê  
Yê hinan?!...  
Axleb, yê hinan li kerê.

Lê, bilbil?!...  
Kî hay jê.

# QESRA XEWNAN

---

Fawaz HUSSAIN

**F**erzendê Meşkîni nikarîbû bigota çawan wî xwe li wê derê dît, bi taybetî li kêleka qesrê, li ser wê qûma nerm ya ku di bin lingên wî de diçû xwarê û derbasî hundirê solên wî dibû. Wî dizanîbû ku ew dûrî dema şewatan, dûrî sînorên kuştinê, dûrî tixûbên nebedîbûnê ketibû. Wî xwe gihandibû Ewropa Rojava, warê jînê, paytextê evînê. Wî nizanîbû gelo li Italyayê bû, li Frenseyê bû, yan jî li welatekî ji Ewropa Jorî, lê ev tişt bê qîmet bû û wî meşa xwe ber bi qesrê ve berdomand. Roka ku diçû ava xwe bi ser deryayek pir mezin de berdida. Dem, di bin wî asmanê nizim de, bêguman payiz bû û rokek bê tîni di dawiya wê rojê de xwe bi ser milê asoyê pehn de xwar dikir, dixwest piştî wextek ne pir dirêj xwe di nav ava deryayê de winda bikira. Ferzend ber bi qesra dilbir ve diçû û hema ji xwe re xweş dikir, digot ku hevalê wî Paul li wê derê bû, bêguman li ber dergehêk ji dergehên qesrê li hêviya wî bû. Bi riya xwe ya zer î dirêj, bi berçavokên xwe ên gilover û bi bejna xwe ya dirêj î zirav, Paul mîna leylandê, çend kêlîkan, li ber çavên wî geh xuya bû, geh winda bû.

Di bin asmanê giran de, çend firendeyên deryayî li ser serê wî kirin qîje qîj û paşê dûrketin. Wî guh li wan ne kir. Li ser qûma hûr, ji bilî şopa solên xwe, wî tu şopên din nedît. Guhikên şeytên di bin lingên wî de wek berfê, dikirin kirtê kirt û diçûn xwarê. Bi xemgîniyeke diyar, Ferzend li şopa xwe mêze kir û wek ku hezar kesî di guhên wî de ji wî re bigotana, wî fêhm kir pêlên ku ji dûr ve dihatin di demek kurt de dê ew ji ber çavan bixistana, dê ew dera han rast û şayik bikirana.

Ferzend û Paul ji mêj ve hevudû nas dikirin; ew li Kurdistanê pêrgî hev hatibûn. Hezkirina wan ji destan û efsanan re dostaniya wan hûna bû, xurt kiribû. Paul hatibû Cizîra Botan û dixwest ji bo xwendina xwe li xwendegehê pirtûkek binivîsanda, lêkolînek li ser destana Memê Alan çêbikira. Wek ku wî biçûkaniya xwe li perçeyekî ji perçeyên Kurdistanê derbas kiribûya, wî biserhatiya Memê belengaz û Zîna diltenik xweş nas kir. Bi saya Ferzend, wî gelek stran û çîrok ji devê dengbêj û çîrokbêjan dane hev. Paul xwe wek parêzgerê milletên bindest dida nîşandan û di baweriya wî de, hemû dîroka Kurdan di evîna Mem û Zînê de bi gewde dibû, eşkere bû. Zikreşiya Bekoyê Ewan û kêmbişiya birayê Zînê yê mezin mîna jehra Sulêmanî bûn, di canê gel de digeriyan. Ji ber finasên neyarên mîna Beko û nezanbûna berpirsiyarên mîna mêrê mezin, qiriktalî, perîşanî, malwêranî dibûn para mêr û jina kurd, dibûn nanê rojane, jana gel.

Ferzendê Meşkînî westiyabû, ji ber ku ew ji dûr ve, ji gundekî ji gundên Cizîra Botan dihat. Ew westiyabû lê kêfa wî li cî bû. Wî dilê xwe bi biserhatiyek nû xweş dikir, bi hevdudîtineke nû geş dikir. Di demek pir kin de, ew dê derbasî nava qesrê, hundirê avahiya xewnên şîrîn, dilrevîn, bibûya. Piştî çend kêlfikan, wî dê xwe berdaya hinava xweşiyên bê serî û bê binî.

Li welêt û nemaze di şevên havînan de, di wan şevên ku tev nedibûn, xewê bar dikir, xwe di nava navçeyê de winda dikir, riya xwe şaş dikir. Ferzend xwe li ser banê xênî, di bin asmanê mişt stêrkên stûr û biçûk de radimedand, serê xwe datanî ser balgehê û herdû destên xwe, wî riya karwanê peyda dikir. Wî xwe di nava hejmara stêrikên bêhejmar de winda dikir. Ji ber pêşiyên baxçeyên pembû, mirovan li derve, di bin asmanê sayî û di bin hîzarê xewnên şîrîn de xwe dirêj dikirin. Ferzend li ser banê xanî dixwest nêzikî warê xeyalan bûya. Ew li ser mehîna boz ya miradan siwar dibû, dûrî navçeya xwîn û şewatê diket. Mehîne hefsar ji destê wî distand û mîna stêrika ku birije, wê xwe bi ser milê asmanê pir fireh de xwar dikir, dûr diçû. Ferzend û mehîn goristanên bêhejmar li dû xwe dihiştin, serdemên malwêraniyan ji bîr dikirin, bi hev re diçûn warê jînê, roj û şevên evîne. Ferzend kavi, demên xwînxwaran, bêhna mirinê li paş xwe dihişt. Di wan şevên dirêj de, wî qesr hema di serê xwe de xwestir dikir, rengareng dikir, wek bûkekê dixemiland, bi destê wê digirt, dibir bal xwe. Ew dibû Ferhadê evîndar, ji Şîrîna xwe re qesrek ji daxwaziyan saz dikir. Paşê, wî xwe berdida hundirê wê û xwe di dalan û eywanên wê de bi kêfxweşiya mest û aşiqan

winda dikir.

Di danê wê êvarê de, Ferzend ne li ser banê xanî bû, ew dûrî Cizîrê ketibû. Ew bi lez ber bi qesrê ve diçû û roka qels jî xwe bi ser milê aso de xwar dikir. Ferzend bala xwe dayê ku qesr nêzîk nedibû, li paş perdeya mijê, te digot, diliviya, mîna gemiyek mezin li ser deryayê dûr diçû, xwe ji ber wî dida alî. Tişt, di dawiya rojê de li ber çavên wî, wek di xewnên şevan de, geh diketin hundirê hev, geh ji nav hev derdiketin, lê Ferzend hişyar bû, bîra her tiştî dibir.

Wî helbet dixwest bêtir bilezanda, lê qûma hûr, mixabin, di bin lingên wî de diçû xwarê, rê nedida wî. Devê wî li kêleka deryayê zuha bû. Wî zimanê xwe di ser lêvên xwe re bir, dît ku ew wek textekî zivir bû, pûç bû û tama qûmê di zengeloka wî de asê bû. Xwêdanek mezeloqî dest pê kir ji eniya wî hat xwarê, tev tozê dibû.

Wî li roka ku diçû ava û li saeta bazinê destê xwe bi rûyekî tirş mêze kir, wek ku soza wî bi Paul re hebûya û ew dereng gihaştibûya wê derê. Mîlên saetê, her sê, li ser hev siwar bûbûn, nedigeriyan. Ferzend di ber xwe de got ku bêguman, sûc sûcê qûmê û bayê têr xwê bû. Wî saeta xwe, bi bêhtengiyek diyar, bi hêrs, hejand, nêzîkî guhê xwe kir. Wî xwest tike tika mîl û çerxikên hûrik bibihîzta lê tu deng ji saetê derneketin. Ji wî werê ew dera hanê bêdeng, aram bû, lê dema wî saeta xwe nêzîkî guhê xwe kir, dengê pêlên ku ji dûr ve dihatin, gihaşt wî. Firindeyên spî ên li kêleka avê dijîn hema dikirin qaja qaj, sînga xwe ber bi bê û roka ku diçû ava vedikirin, wek dînan li wan hatibû. Du sê carên din, wî saeta xwe hejand û dema dît ku ew wek xwe ma, ew li paş xwe zivirî, pišta xwe da qesrê û ta ji wî hat, wî saet dûr avêt. Saetê di asmanê dagirtî de kevanek çê kir, dûrî sî çel gavî di qûmê de çû xwarê. Ferzend lê poşman nebû, wî meşa xwe domand.

Dema wî nêzîkayî li qesrê kir, ew devjihev ma. Qesr ne weke ku Paul pesnê wê dabû, ne wek ku wî di serê xwe de, di şevên Cizîra Botan de bawer dikir, bû. Qesra bi nav û deng, qesra berz, di dawiya wê roja payizê de, di rengê qûmê de bû. Tu kes li dora wê, li ber deriyên bilind û pehn nebû. Dergevanan ji ciyê xwe bar kiribûn, qesra bedew ji bayê têrxwê û têrqûm re hiştibûn, sipartibûn reşkên bêxwedîbûnê, demên nebedîbûnê. Avahiya dilbir aniha mîna qesrên ku zarok li ser kêlekên deryan ji xwe re ji qûma nerm çê dikin û bi panyên xwe ji hev dixin, dema dilê wan ji listikan sar dibe, bû.

Dergeh hemû girtibûn, bêguman ji demek dirêj ve. Ferzend li ber dergeha di sînga avahiyê de rawestiya, destpêkir li konê pîrê mêze kir. Di tevnê pîrê de, çend mêşên bêçare dixwestin xwe azad bikirana, xwe ji dafên mirinê derxistana. Ferzend baş li wan mêşan nêrî û fikira vegeê hat serê wî. Li ber dergehê, wî rojên çûyî anîn bîra xwe û ji bilî mirin, kuştin û şewatê tişteki din nehat ber çavên wî.

”Dostê delal. Min gelek name ji te re şandin lê tu deng ji te derneket. Ez

hêvîdar im te pirtûka xwe ya li ser destana Mem û Zîn weşandiye. Dema em bi hev re li gund û bajaran digeriyan, rojekê te got, ku li welatê te Mem û Zîn bi hêsanî bi hev şad dibin, kesên wek Beko dibin dergevanên qehpexanan, mirovan ji bo peran berdidin ser jin û namûsa xwe. Li Cizîrê ne tenê Mem û Zîn perîşan dibin, her kes li ber lehiya mirinê diçe. Agir ji her alî bi ser rûyê dinya me de dibare. Di destpêka rojê de şewat, di nava rojê de şewat, di danê êvarê de şewat, di nîvê şevan de şewat, şewat, şewat.”

” Dostê hêja Paul, di hemû nameyên xwe de, tu dibînî ez her dem ji te dipirsim, dixwazim nas bikim çima çerxa gerdûnê hema li dora serê me digere, çima mirin dide pêşiya me, paşiya me, tengala me, dev ji me bernade.”

Paul bersiva nameyan nedida û bi ser de jî, wê rojê, li welatê xwe, ew ne li gor soza xwe derket, soza mêrê çê. Wî Ferzend tenê, di nava gurrînekên xeman de, li ber dergeha qesrê hişt, ew bi gaziya wî nehat.

Ferzend nikarîbû li hêviya hevalê xwe bimaya û destê xwe dirêj kir, tevnê pîrê xera kir. Di nameyekê de, wî nivîsandibû:

”welat ji me re nemaye. Eşkere ye em çê bikin, tenê ji bo goristanan mişt bikin. Memê Alan û Zîna xwînsîrîn dibin bermaliyên, bindestên Beko, dibin êzing ji bo hilorkirina agirê mirinê. Dostê delal, li Cizîra Botan, li warê îşq û evînê, şewat, şewat.”

Derî bi hêsanîyek mezin vebû. Ferzend hinekî li ber rawestiya û li dora xwe nêrî. Paul ne li wan deran bû û wî ji xwe re got”Hebe nebe, ew ê li hêviya min di hundirê qesrê de be.”

Hundirê qesrê pir sar bû. Ferzend bi çekên havînên welêt hatibû û serma xwîrt mîna hîzarek ji qeşê xwe li canê wî pêçand, xwîna di damarên wî de hişk kir. Wî karê xwe û wê sermayê nekiribû, bawer dikir ku nava qesrê herdem hênik bû, mîna buhiştê ne germ ne sar bû. Ew poşman bû çima ji bo wê reya dûr wî baş karê xwe nekiribû, lê hatina wî bi xwe ne bi destên wî bû. Xwişka wî Şîrînê hînî çêkirina vezelên hirî bûbû û wê ji bo wî vezelekî pir hêja, germ ji bo zivistanê çê kiribû, lê di tevliheviya bûyeran de, di firtoneyê de, wî bi zorê canê xwe ji mirinê xelas kiribû.

Her du sê gavan wêneyek yan berrek pir dilbir hebû û di nav hev re wan jiyana gelê wî welatê ewropayî, mîna filmekî sînemayê, li ber çavên wî raxistin. Hemû dîroka wî gelfî di bin ronahiyek qels de, li ber çavên Ferzendê Meşkîni, wek rûpelên pirtûkek rengîn, pehn bû. Ronahiya qels ji zikê ban dihat û ji ber ku ji binî ve di qesrê de pencere nebûn, Ferzend bawer kir ku ew ronahiya han ya lempeyên elektrîkî bû. Wî serê xwe bilind kir û li zikê xênî nêrî. Banê avahiyê tijî derz û qelş bûn û di wan re tîşên rojê dibuhurîn hundir, di nava dalan û eywanên fireh de belav dibûn. Qelşên mîna maran di zikê avahiyê de xwe li hev dipêçan, li hemû dîwaran belav dibûn.

Ma Paul li ku bû ta bihata gaziya wî, ew ji wê rewşa dijwar derxista, deriyê hêviyê di rûyê wî de vekira? Di gelek nameyên xwe de, Ferzend dikir gazî.

Carekê wî nivîsandibû:

” Dostê dostan, ezîzê ezîzan, warê Mem û Zînê herdem bi pêt û bizot e. Her roj bi hezaran kesên mîna Mem, mîna Zîn dişewitin, berbat dibin. Tu dibînî dema ez dinivîsînim gotinên mîna ”agir”, ”şewat”, her dem ciyekî mezin digrin. Tu bi xwe dizanî ku Cizîra Botan warê hêşînkahiyê ye û di zivistanan de berf dikeve, riyên di navbera gund û bajaran de têne girtin. Lê bibuhure, dostê hêja, eger mirin di serê her kesî de bi sermayê girêdayî ye, di serê me de, ew jî şewat, agir e.”

Ferzend tirs û sermaye hundirê qesrê ji bîr kir û bi kêfxweşî li tabloyan, li berran, li pûtên ji kevirê mermer û bronzê nêrî. Wêneyên li ser dîwaran jiyaneke rengareng li ber çavên wî radixistin. Wêne pir bilind bûn û di ronahiya qels ya roka ku diçû ava de, Ferzend xweş ew ji hev demedixistin. Ew ji eywanekê buhurî eywanekê û di nava wê jiyane de winda kir.

Berrên bi ser rûyên dîwaran dakirî berrên welêt anîn bîra wî. Wan rojên zaroktiyê, xweşiya demên kurt anîn ber çavên wî. Ferzend zaro bû û carina jî xweha wî Şîrînê bi destê wî digirt, ew bi xwe re dibir Navenda Tevn û Berran. Wê li wê derê, bi keçên di temenê xwe de kar dikir. Di nav dîwarên Navendê de, tiliyên keçên şehreze li ser rûyê berran cîhaneke rengareng li ber çavên Ferzend vedikirin. Tiliyên nerm û zirav firende bi asmanan dixistin, xwîn û hêrs di canê şêr û pilingan de digelandin. Wan tiliyan destanên kevin jî bi gewde dikirin. Li ser rûyê wan berran, Mem û Zîn, Siyamend û Xecê, Ferhad û Şîrîn digihaştin miradên xwe . Qehremanên mîna Rustemê Zal, mîna Kawayê hesinger dilê Ferzendê zaro mişt hezkirin dikirin. Di dawiya rojê de, Şîrînê bi destê birayê xwe digirt û xweh û bira, peya, vedigeriyan malê. Dema şev diket, di nav ciyên xwe de, Ferzend ji kirasê zarokêkî derdiket û ji kirasê qehremanekî diket yekî din, geh dibû Rustemê Zal, geh dibû Kawayê Hesinger, dibû siwarê hespê bayî, hespê xwedî bask.

Çend salan paşê, dema wî hezkirin nas kir, carinan jî ew dibû Mem, dibû Siyamend, yan jî Ferhad û çiya kun dikir, qesr ji bo Şîrînê saz û ava dikir.

Gera wî dirêj kir. Di navenda eywanekê de, ew çav li tabûtek ji kevirê reş ket. Wî dikarîbû ew ji bîr bikira, dîwar û dîwar biçûya, bibuhuriya eywaneke din. Lê di wê navbirê de, wî xwest navê xwediyê tabûtê nas bikira.

Ferşê kevir ne li ciyê xwe bû û di şûna wî de tu tiştî devê tabûtê nedigirt. Di nava kefenê rîzyayî de, kiloxê miriyekî û herdu kortên çavên wî xuya dikirin. Li ser qehfê serî zerzengek -tacek- ji zêrê zer û ji mîrwar û cewahirên giranbuha hebû. Li ser parsûyên sîngê, şûrek dirêj û pehn hebû. Yê mirî destikê şûrê xwe, di bêdengiya qesrê de, di nav hestiyên tiliyên xwe de diguvaşt, bemedida.

Sawa mirinê mîna marekî reş xwe berda hinava Ferzend, hişt ku ew navê ye mirî ji bîr bike, bi payine sist dûrî tabûtê bikeve. Nêzikî deh panzdeh gavan, lingên wî di tişteki de asê bûn û bi ser dev de çû xwarê. Wî destê xwe di ser ser û laşê xwe re bir. Sermayê laşê wî pûç kiribû û tu derên wî nedîşiyan. Ji lêvên

wî avek tîr û germ dihat. Wî nas kir ku ew xwîn bû, lê dema destê xwe da ber rûyê xwe, da ber ronahiya tîş tîşî, wî tiştekek nedît. Ew rabû ser xwe û destên xwe wek koran pelikand, di ser wî tiştê ku ketibû nav lingan de bir, nas kir ku ew ji mexmel bû, stûr bû. Wî ji xwe re got ku di wê rewşa dijwar de, di serma bê hedan de, ew tiştê ku ew da erdê, xwîn ji devê wî anîbû dana asmanan bû. Helbet wî nizanîbû wî cawî li wê derê çi dikir. Di baweriya wî de, hinan ew winda kiribûn.

Wî cawê germ li dora xwe gerand. Sermayê hin bi hin xwe ji canê wî kişand û pêlên germê, pêlên jînê xwe bi tamarên xwînê re berdand hinava wî, xwe li canê wî gerandin. Ronahiya roka ku diçû ava tevî ji binî ve ne xurt bû te digot hinekî xurttir bû. Ferzend xweş ber xwe didît û çavên wî hînî tariyê bûn. Dalan û eywanine din ew spartin xwe, dinyayine nû li ber rûyê wî raxistin.

Caw hinekî giran bû lê ne xema Ferzend bû. Serma hundirê qesrê şikest, bû bûyerek kevin, hat ji bîr kirin. Rojên welêt yê nîşt mirin jî destên xwe ji qirika wî derxistin, xwe ji mêjiyê wî kişandin. Tabloyên bi ser dîwaran dakirî û berrên xweşik dîsan bang wî kirin, dilê xwe ji nêrînen wî re fireh vekirin.

Di eywanekê de, Ferzend çav li berrek pir dîlber ket. Keçek şazdeh-hivdeh salî, li ber çavkaniyekê rawestiya bû, kûzê avê avêtibû ser milê xwe. Keça dilrevîn devê kûzê xwe ber bi jêr ve kiribû û avek mîna rûn jê dirijiya. Avê bi ser canê wê, di nava herdu memikên biçûk re, mîna marekî xwe li hev dipêçand, ber bi jêr ve diçû. Ava hênîk ji bejna zirav hez dikir, di nav herdû hêtên glover de dadiket. Li ber nigên ciwana dilber, marê avî dibû mîna şehekî, xwe dida hev, serê xwe dixist nav dûvê xwe, diket nav xeweke şîrîn.

Gelo Ferzend çiqasî li ber wê keçe ma? Wî bêguman bi hezarên caran ew rûyê hanê dîtibû, lê temaşê kiribû, jê hez kiribû. Ew rûyê hanê, camkirî, perwezkirî, li ser dîwarên piraniya malên Cizîra Botan hebû. Ew dem û lêvên lihevhatî, nazik, gilover, bi xwe dem û lêvên Zînê, dîlbera Memê Alan bûn.

Rû rûyê Zînê bû, lê ew laşê nîvtazî, di destana evînê de, tişteki din bû, bûyerek nû bû. Zînê li wî welatê dîr, li kêleka wê deryayê cilên kurdî, kirasê perîşaniyê ji xwe kiribû, bi awayekî nû ji Memê xwe hez dikir, di ber dilê wî de dida. Zînê di çarçeva wê wêneyê de nema guh li dek û dolabên Bekoyê Ewan dikir û birayê wê jî dev ji mîrîtiya xwe berdida, karekî din ji xwe re peyda dikir.

Ferzend nema tu hêvî ji Paul dikir, dema ji nişkê ve, qurpe qurpa lingine bi lez li ser kevîrên qesrê gihast guhê wî, ew ji nava pêlên xweşiyê kişand. Wî awirên xwe ji berra dilrevîn birrî. Di nava ronahiyek pir qels de, Paul, hevalê kevin, dostê Mem û Zîn, neyarê Beko, neyarê neyaran li ber çavên wî bi riya zerî dirêj, bi berçavokên gilover, mîna reşkê şevê, xuya bû. Ew nêzîk bû, lê çend gavên mezin di navbera wan de man. Wî silav nekir, negot "tu bi xêr hatî", neçû rûyê wî. Wî destê xwe jî dirêjî destê dirêjkirî nekir û bi dengêki bilind bi ser Ferzend de qîriya:

- Ma tu dîn bûyî Ferzend? Ev çi kefen e te li xwe pêça ye?

Ferzend têngihîşt û di ciyê xwe de sar ma. Wî hêviya çi dikir û aniha Paul

çawan dihate pêşiya wî, çawan bi wî re dipeyvî. Wî got:

- Kefenê çi? Paşê, wî nas kir ku pirs pirs cawê ku wî avêtibû ser milên xwe bû û wî bi dengê sist berdomand” Bi Xwedê min sar bû û min ev perda han li ser rûyê erdê dît. Min ji xwe re got heye tune ye ew ji mirovekî ketiye û...

Paul ji bêhtengiya hinavê xwe re rê nedayê ku ew gotinên xwe dirêjtir bike, cardî qîriya:

- Perda li ser milê te perçek ji kefenê xwediyê qesrê ye. Bêje, ma ne te ew di eywana tabûtê de dît?

Ferzend xwe ji mêj ve ji bo hevdudîtineke geş amade kiribû, pirs û gotinên xwe, di serê xwe de rêz kiribûn. Ew ji dût ve dihat û gelek tiştan jîna wî li wî dikirin jehr. Ew ji ber şewatan, ji ber hovîtîyên xêmxwazan, çavnebaran, neyaran, direviya. Li warê dûrbûnê, wî helbet dixwest ji bîr bikira çima hema mirin bi ser rûyê Cizîra Botan de dibariya, ji bîr bikira çima zaro, jin, mênên çê mîna mirîşkên serjêkirî li ser rûyê erdê hema diperpitîn, çima goristan hema pirtir dibûn, firehtir dibûn. Wî dizanîbû ku bersiva wan hemû pirsan li bal Paul tunebûn, lê hêvîdar bû, bi kêmanî, qiriktalî ji bîr bikiraya, hinek aşîfî li wê derê peyda bikiraya, Paul hinekî di ber dilê wî de bida.

Wî cawê ser milê xwe bi heyecan avêt, li hevalê xwe mêze kir û tevî ku dilê wî mişt bû, tu gotin ji devê wî derneket. Dengê Paul di serma xwe car din li canê wî pêçand, gihast guhê wî:

- Bibuhir, ez nikarim bêtir bi te re li vê derê bimînim. Temîniya min li te tu zû xwe bigihîni dergehekê, berî ku tu av û av herî.

Wî rahîst cawê ser rûyê erdê, li hev pêça û avêt ser milê xwe. Wî xwest bêguman ew dîsan bi ser gorê dakira, yan jî, hema ew li eywana tabûtê bavêta. Wî xweş hundirê qesrê nas dikir û paşê bi lez ji ber çavan ket.

Ferzend bi xwe di nava qesrê de ma, ber bi tu dergehan neçû. Gotinên Paul wek zingîniyekê ji ber guhên wî nedîçû. Wî dizanîbû ku dût ketina wî ji Cizîra Botan çewtiyek bû, şaşitiyek mezin bû, lê dizanîbû jî û li Cizîrê hema şewat, ateş, agir, ar bû. Wî nexwest ji hevalê xwe bawer bikira û dema sermayê car dî xwe li canê wî pêça, wî li berra xweşik nihêrî, berê xwe da eywana fireh, çû dîsan li wî cawî bigeriya, ew li xwe bipêça.

Li derve, roka ku çûbû ava çend perçeyên sor li ser milê aso hiştibû. Guhikên seytên û kevjalên mirî qûma li kêleka qesrê rast kiribûn; tu şopên solan, di dawiya wê roja hanê de nedihatîn xuyakirin.



# QURFA PIŞTÊ ŞIKEST

---

Ömer OKUMUŞ

Li bajarê Diyarbekirê  
Keçikeke sê salî  
Fîstanê wê heft reng  
Keziyê wê erzan in  
Tiliyên wê  
Kes lê hay ne be jî narîn in  
Destên wê wekî yên lawan li pişt girêdayî  
Qirç qirç qirç  
Benîştê xwe dicû  
Û ji te re dibêje:  
"Xalo xalo Xwedê ji te razî be"  
Xalo  
Xwedê  
Pere  
Keçik dileyize

Li bajarê Diyarbekirê  
Jin tunene  
Zarok tunene  
Mêr hene  
Simbêl hene  
Tizbî hene  
Qehwe hene  
Û roj li qehwan diçe ava

Wekî dara bênamûs  
Pûç  
Wekî hêka xerabe genî

Li bajarê Diyarbekirê  
Kêf di gewriyê de girêk e  
Kevirên kela reş roj bi roj kêr dibin  
Zerdeşt ji zûve hatiye jibêrkirin  
Gotin dikizirin  
Rûyê zarokan diarin  
Sibe agir e  
Nîvro agir e  
Êvar agir e.

Papûr heta dev tije ne  
Hilm û gulma mirovan  
Xweydan hevdû radimîsin  
Çinge çinga dengên tasên şerbetfiroşan  
"Ava zemzemê  
Şerbeta sûsê"  
Tirs  
Bîhna cîgerên biraştî  
Dewê qerisî  
Tirs  
Dîsa kelemek ketiye çav  
Vê carê wê çî bibare gelo

Çelpe çelpa xewnên şolî  
Papûr heta dev tije ne  
Û tu di bin leyîya lîngan de  
Kaxizeke qermeçandî yî  
Gotin divirvirin  
Ditevizin  
Dişewitin  
Ev şevbêrka çenda ye ku di nêvî de tê birrîn

Mêjî bi faqê re  
Ziman bi qeflê re markirî bûn  
Piştî taya heftê salî  
Êdî ji heft salan re jî taqet nema ye  
Qurfa piştê şikest

Dayikên bi meles  
Bi gotinên qedexe tizbiyên xwe kişandin  
Bi agirekî zelal desmêja xwe şewitandin  
Berê xwe dan qiblê

Wekî diya Mem dilşewat  
Wekî Ristemê Zal bi mêrxasî  
A xwe gotin

Te dî carina  
Digel roj dibiriqe jî  
Îlla mij pêve dizeliqe  
A di wê çaxê de  
Wekî sofikî saf bi cizbê keve  
Wekî stêrka dil bişiqite  
Wekî tîr ji kevan bifilite  
Gotin ji devên wan dipekiyan  
Lal dibûn  
Erê rast e  
Em di babelîskên tirsê de tevizandî ne  
Lê  
Kî kare bêje ku  
Em di gerînekên şermê de fetisandî ne

Em  
Geh bi çuqlî û pel in  
Geh jî zer in  
Rehên me  
Di kevirên reş de jî şax didin  
Ji Behdînan heta Kela reş

Em dirriyên bêar in  
Hevîrtirşê me  
Ji hêmê çiyayê Botan tê  
Di her newalê de  
Sal dozdeh meh  
Em kevir dihêrin  
Nîvişkê xwe hazir bikin  
Ji nan re hindik ma

Li bajarê Diyarbekirê  
Em bi agirê Adarê  
Qedera xwe dişewitînin  
Êdî her Adar  
Di keskesorên her agirî de  
Kawa  
Ji me re çav dike  
Me soz daye  
Em ê heykelê wî di esmanê Diyarbekirê de biçikînin

Mar di paşila bûkê de  
Di bajarê Diyarbekirê de  
Hê û hê jî  
Li taxa Rezan  
Di şûna tirî de zîndan şîn dibe  
Wekî heykelê şerma me

Ji pêlên okyanûsê  
Ji simbilên beriya Mêrdînê  
Ji rika Firatê  
Ji berfa Agirî re bêjin  
Em bi hêvî ne  
Wê roj  
Dawiya dawî  
fembelîlkên şermê bihelînê



Resamê kurd Hiner SELÎM


# RESAMÊ RENGÊN TÊKEL ÊN KURDÎ; HINER SELÎM

---

Mehmed UZUN

**R**eng... belê, gava ez li tabloyên Hiner Selîm dinihêrim, berî her tiştî, reng bala min dikîşînin. Sal 1990 e. Rojeke biharê ya Parîsê ye. Parîs bi rengên biharê xemiliye. Bajarê biharê, di nav rengên biharê de, mêvanên xwe yên biyanî vedixwîne. Em, ez û çend heval, hinekî li derveyî Parîsê, li banliyoyekê, li mala Hiner in. Hiner tabloyên xwe yên ku wî di du salên dawîn de afirandine, nîşanî me dide. Danê êvarê sorahiyek reşandiyê ser hawirdorê. Lê, ji bo ku em tabloyan, nemaze rengên wan, baş bibînin, Hiner du lampa vexistine. Di bin ronahiya lampayan de pêla rengan e. Rengên girtî yên boş tablo vegirtine. Ez li tabloya "Le curde" dinihêrim. Demeke dirêj çavên min li ser figur û rengên vê tabloyê radiwestin. Ez ji hin aliyan ve lê dinihêrim. Pênc keç di govendê de ne. Keçên xama û bedew. Beden baş diyar in, lê ne rû. Cil û bergên kurdî li wan in. Wan mil dane hev û hunera govenda kurdî, bi hemû xweşî û nazdariya wê, berpêş dikin. Bi tenê ev yeka bi serê xwe spehîtiyek dide tabloyê. Bi gotineke din, bi tenê figurên keçan û govenda wan têra afirîna tabloyeke bedew dike. Lê reng... reng lê zêde dibin. Reng hemû tablo dadigire, radipêçe. Kîjan reng? Bêguman e ku ji govenda kurdî û keçên xama yên kurd re rengên kurdî divên. Rengên qerqas, sor, bor, zer, çûr, binevşî, qahweyî û erxewan tablo dikin tabloyeke taybetî. Bikaranîna rengan jiyan dide keçên govendkêş. Ew ji tabloyê derdikevin û tên li ber me govendê digirin. Tablo, bi saya rengan, dijî.

Bi dû vê tabloyê re, tabloyeke din, bi navê "I trafficanti" tê. Di vê tabloyê



"Le curde"-pastello-70x70 cm.

de jî dîsan figurên nediyar di nav cumbaşa rengan de dibin jîndar. Di tabloyê de çend mêr li dora masayeke erdê, li erdê rûniştine, çirayeke gazê li kêleka wan heye, du jin li pê, li kêleka wan in. Hespêkî kihêl û siwarê wî ber bi mêr û jinan tên. Keçikekê jî bi serê hesp girtiye. Li pey wan dîwar, pencereyên dîwêr û li ser dîwêr jî xalîçe û mehfûr hene. Ew li ku ne? Li hundir yan li derveyî malê? Meriv vê yekê fahm nake. Caxên penceran û der û dorên mehfûran bi motif in. Heta vê derê, hemû tişt, tiştên pêwist ên tabloyekê ne. Lê reşandina rengan, tablo bergeheke rojane ya jiyana civakî ya kurdî, bi her awayî, berpêş dike. Piştî vê tabloyeke din tê "Festa piu esodo". Di vê tabloyê de jî dîsan hespên kihêl û siwarên wan, şên û cil û bergên wan, dîwar û pencerên wan di nav nezelaliyekê de dimeşin û derin. Lê rengên girtî dîsan derdikevin pêş û miraza resam diyar dikin; keser, kesera neteweyekî bêçare, kesera dilên şikestî, kesera jiyaneke qurmiçî... Tablo her bi vî awayî û bi van rengan weha dewam dikin, tên û derin.

Gava em di destpêka êvara biharê ya bajarê Parîsê de dadikevin bajêr, li ber çavên min rengên tarî, nemaze rengên mor û bor derin û tên. Parîs bi rengên germ û girtî yên kurdî me hembêz dike.



Sal, 1993'ê ye. Em, ez û Hiner, dîsan li Parîsê, li kêleka Centre George

Pompuidou li qahwaxaneyekê rûniştine û li ser rewşa wî ya dawîn a hunermendiyê dipeyivin. Îsal ew çûye warê bav û kalan, Kurdistana Iraqê û li wir filmek bi navê Şêro çêkiriye. Fîlm bi ser ketiye û ew li Festîwala Venedîgê hatiye nîşandan. Ew kataloga Festîwalê nîşanî min dide. Tê de, digel gelek filmçêkerên navdar,



"I trafficanti" -pastello-50x70 cm.

rûpelek jî li ser Şêro heye. Fîlma wî, yek ji filmên pêşîn ên kurdî ye. Wî li hunermendiya xwe filmçêkerî jî zêde kiriye. "Ez hêvîdar im, te dev ji resim û wêne bernedaye", ez dibêjim. Ew bi ken bersîva min dide; "Naxêr, huner, resim û çêkirina resim ji bo min jiyana e. Ez bê wan nikarim rehet bijîm."


Ji navberê sê sal bihurîne. Lê hin figur, hespên kihêl û rengên piraniya tabloyên wî hê jî di heşê min de ne. Ez dizanim ku ew li Îtalya û Fransê, di hin pêşandanana de beşdar bûye, lê bêtir çend tabloyan, min berhemên wî yên nû nedîtine. Ez pêşketina wî meraq dikim. Ez jê pêwendiya wî û rengan dipirsim. "Ez her bi eynî rengan dixebitim," ew dibêje, "lê ez dikarim bibêjim ku reng û motîvên min niha hîn nermtir in." Hîn nermtir... Gelo nermtirbûna rengan nîşana kemilandin û pêşketinê ye? Ez vê jê napirsim. Ew çend diyapozîtîfên tabloyên xwe yên dawîn nîşanî min dide. Belê, reng eynî ne, lê bêtir li tabloyan belavkirî, bêtir li pey figurên tabloyan. Û rengêkî nû li rengên wî yên adetî zêde bûye; rengê reş. Ez li tabloya wî Senza titolo dinihêrim. Du jinên tahzî, hinekî jî hevûdu dûr, rûniştine û li hev dinihêrin. Figur dîsan nediyar in. Dîsan rengên tarî figur rapêçane. Reşahî li rengan zêde bûye. Ez li rengên mor û bor ku di heşê



min de mane, digirim. Lê ew ne li pêş in. Meriv divê li wan bigere da ku bibîne. Welê dixuye ku Hiner di hunermendiya xwe de şeweyên nû diceribîne. Ew deriyên nû û nenas vedike, dixwaze bizanibe ka li pey deriyan çi heye. Tabloyên wî yên nû, meriv dikare bibêje, tabloyên resamekî lêger in. Ew diceribîne, tecrubeyên xwe zêde dike da ku li ser van tecruban resamiyeke kemilî ava bike. "Lê reng û harmoniya rengan ji bo min pir girîng in", ew bi dîqet dibêje. Gava em weha li ser rengan dipeyivin, sohbeta me, bivê nevē, tê ser Chagall. Marc Chagall, hosteyê herî mezin ê rengan. Hingê ez hîn dibim ku yekemîn hoste û mamostayê Hiner jî Chagall e. Ew li motiv, figur û rengên Chagall hûr bûye û bi salan li serê xebitiye. Hiner behsa Matisse jî dike, bi taybetî gava gotin tê ser figurasyonê. Lê belê, Chagall. Berî herkesî, hertiştî Chagall. Chagall alîkarî li min jî dike. Bi xêra Chagall, ez jî Hiner, tabloyên wî, rengên tabloyên wî hîn çêtir fahm dikim. Chagall kilîta deriyê hunera Hiner dide min.



Bi sohbeta li ser Chagall, heşê min dere ser du kitêban ku ji aliyê Chagall bi xwe û jina wî hatine nivisîn. Di destpêka 1920'an de Chagall bi navê "Ma vie" (Jiyana min) kitêbek û jina wî Bella Chagall jî di dawiya salên 1930-an de kitêbek bi navê "Lumières Allumées" (Ronahiyên vêketî) dinivisînin. Herdu kitab jî otobiyografîk in. Di herduyan de jî jiyana wan, der û deverên jiyana wan, xewn û xeyalên wan heye. Di ser her tiştî re jî zaroktiya wan û jiyana rengîn ya wan rojan heye. Lê tiştê xweş a van kitêban ew e ku meriv jiyan, huner û hunermendiya Marc Chagall ne ji kitaba wî, lê ji kitaba Bella Chagall hîn çêtir, xwestir têdigihê. Kitêba Bella Chagall, meriv dikare bibêje, taswîra jiyana wan herduyan e. Bella Chagall weha dest bi nivisîna kitêba xwe dike, "Ecêb e, min dil heye ku ez dest bi nivisîna bikim. Û bi zimanê xwe yê zikmakî Yiddish ku ji wê dema ku min dev ji welatê xwe berda û heta îro pê nepeyivîme." Bi van gotinan, Bella Chagall vedigere welatê xwe Rusyayê, mala ku ew tê de hatiye dinê, bajarê zaroktiya wê Vitebsk û civata cihû ya wê demê. Kitab ji serî heta dawiyê li ser civata cihûyên Rusyayê, pêwendiyên wan, rabûn û rûniştin, adet û ûsil, dîn û dîndarî, cejn û eydî, cil û berg, şahî û dawet, reng û ronahî, destan û çîrokên wan e. Bella Chagall wê jiyan û dinya taybetî, bi pênûsa xwe ya xweş û zimanê xwe yê gelekî basîd, taswîr dike. Chagall bi xwe jî taswîrên jînhevala xwe bi xêzên xwe yên basîd û taybetî dineqîşîne. Ew jiyan û dinya ku Bella Chagall taswîr dike, di eynî wextê de jiyan û dinya Marc Chagall e jî. Ew jî ji eynî kahniyê derketiye, di eynî avê de xwe şuştîye, eynî nanê olî ya kitêba Tewrat xwariye, bi eynî kincan cejna hêkesorê pîroz kiriye, eynî kitabên dînî xwendine, li eynî çîrokên Mûsa, Nuh, Yaqûb, Dawid, Îbrahîm û Îsa Pêxemberan guhdarî kiriye û çûye eynî sînanogan. Û wî hemû hunermendiya xwe, bi hezaran eserên xwe, li ser wan ava kiriye. Ma kîjan nivîskar û hunermend ji dewr û dewranên zaroktiya xwe bihuşteke xeyalî neafirîne?.. Lê hosteyê hemûyan, bêguman, Chagall e, bi gotina André Malraux, hemû dinya Chagall a xeyalî li



"Senza titolo" -pastello-50x50 cm.

ser jiyana zaroktî ya civata cihû ya bajarê Vitebsk avabûye. Tu berhemeke Chagall nîn e ku tê de şopên zaroktiya wî tune bin, tê de perçene ji dinya dînfî ya kitêbên Tewrat û Încil'ê tune bin, tê de reng, bîhn û tahmên jiyana cihû tune bin... Wî ji dinya zaroktiya xwe jiyaneke pir û pir mezin a hunermendî afirandiye. Bêşik, bi rengên xwe yên pir taybetî. Dîsan André Malraux, nivîskarê navdar ê fransîz, wezîrê çandî yê hukimeta dema Charles de Gaulle, di gotara xwe "Hommage a Marc Chagall" (Ji bo bîranîna Marc Chagall) de dibêje, "Berî her tiştî, M. Chagall yek ji hosteyên herî mezin ên rengan e... reng li ser cawên wî yên sihêrîn şêwe, motîv û bergehên nedîtî diafirînin. Reng azad in, ew azadiyê diafirînin..."

Hosteyên rengan pir in. Delacroix rengên medeniyetekê afirîne û ew kirine nemir. Monet karibûye, pir bi hostehî, rengên şewq û ronahiyê û kitekitên wan vebiguhezîne ser cawên xwe. Tizian karibûye, bi taybetî di tabloyên xwe yên dawîn de, govenda rengan biafirîne. Lê Chagall bi rengan destanek, jiyanek,

civatek ava kiriye. Bi rengên wî destaneke asîmîlekîrî, jiyanekê jibîrbûyî, civateke qetkîrî, bi hemû xweşî û bedewiya xwe, ji nû ve, vejîyaye. Belê, rengên wî ruhekî pir kevn ji nû ve afirandiye.

Rojek, di payîza umrê wî de, ji bo pêşandaneke wî, jê çend rêz tên xwestin. Chagall wan rêzan dinivîse. Di wan rêzan de, ew deng li gelê xwe dike û pir bi basîdî weha dibêje; "Min dil hebû xewna te bi cîh bînim / Rastiyeke nû nîşan bidim / Rengên xwe, ji ronahiya xwe / bi deyn bide min..." Rengên xwe ji ronahiya xwe bi deyn bide min... meriv dikare bibêje ku ev herdu rêz kurtebirîya hunera Marc Chagall e.

Rûpelên herî xweş ên kitêba Bella Chagall li ser hevûdunasîn û pêwendîya wê û Chagall in. Ew rûpel bi evîn, wefa û germahiya dilsoziya umrekî hatine hûnandin. Li derekî wan rûpelan, Bella, keça bedew a cihû, salvegera jidayikbûna xwe pîroz dike. Wê û Chagall hevûdu nû nasîne. Dilê Chagall, bi evînê, bi firê ketiye. Bi hênceta pîroziya Bella, ew tabloyekê ji bo Bella çêdike, rengên xwe yên taybetî li ser caw direşîne, li Bella dinihêre û caw diqulipîne ser spehîtiya evînê. Bella wê kurtedemê weha bi bîr tîne û dinivîse; "Te xwe avêtiye ser caw. Tu firçan di nav rengan de digerîni, reng bi sorahî û keskahî, bi gerahî û reşahiya xwe şewq didin. Tu ji rengan çemekî diafirîni û min lê siwar dikî. Ji nişka ve, tu min hildidî, bi firê dixîni. (Tu weha dibêji);

–Binêre, çi xweş bû! Bedew, bedewî... Te dest bi firê kiriye. Em ê vê bi navê Roja Jidayikbûnê bi nav bikin. Em ê bi hev re bifirin, dîsan, dîsan..."

Di van çend rêzên Bella Chagall de hemû hunermendiya Marc Chagall ku li ser sembol û motîvan ava bûye, veşartîye. Fir, firîn û firandin di tabloyên Chagall de motîvên esasî ne. Ew Bella difirîne, bi xwe difire, meriv û heywanan derdixe ser esmanan. Bi xêzên xwe yên nas, ew heşê temaşeger û nêrevanên tabloyên xwe tevlihev dike. Ma meriv dikare bifire, ma heywan çawan derdikevin ser esmanan? Di vê nerastiyê de, ew rastiyeke derdixe pêş; azadiya huner û hunermendî, serbestiya dil û mêjî.



"Di jiyana kurdî de tiştên enteresan hene, di warê çand, huner û edebiyatê de em li preferiyê dijîn" Hiner dibêje, "preferî dikare bikêr be, eger em bikaribin wê bi hostehî bi kar bînin û aliyên xwe yên enteresan bibînin. Lê jê re cesaret û huner divê. Meriv divê tabûyan bişkîne." Yanê cesareta ku Marc Chagall her nîşan daye. Bi tesîra sohbet û bi bîranîna Marc Chagall, ez li tabloya Hiner a "La mia citta sale in cielo" dinihêrim. Xaniyên bajarekî biçûk ê kurdî di bin ronahiya heyvê de, bi rengên kurdî, li ser hev in. Di navbera malan de, hin dar jî dixuyin. Reng girtî ne. Bi vê tabloyê, Hiner jî, her mîna Chagall, warê bav û kalên xwe vejandiye, li bajarê xwe yê zaroktiyê vegehiyaye. Di tabloyeke xwe ya din de, "Mia madre sul tetto" wî diya xwe hilkişandiye ser banê mala wan. Fîgura dê ji malê mezintir e. Li jor hin mehfûr û li derveyî malê jî du pencere hene. Tablo

ne realist e. Bêdûzaniyek bi dûzan tê de heye. Reng dîsan girtî ne. Ew bi zimanê resim û wêne û bi rengên taybetî yên jiyana kevnare jiyana zaroktiyê diafirîne, mîna hosteyên xwe, ji nû ve ava dike. Tabloyên wî yên bêziman zaroktiya wî jî tînin ziman: Ew ji Kurdistanê Iraqê, navçeya Behdînan, bajarê Akrê ye. Sala 1960-an, ew li maleke nîştimanperwer û kurmançixafî tê dinê.

Kok û rehên malbata wî, di derheqê hunermendiya wî de jî fikirekê dide merivan: Eslê wan êzîdî ye, kalikê wî du jinan tîne, yeka cihû û yeka misilman. Li malê adet û ûsilên yêzîdî, cihû û misilmanan dikevin nav hev, rengên kitabên miqedes Mishefa Reş, Tewrad û Quran'ê malê dineqîşînin. Kurdî û kurdayetî li wan zêde dibe. Hiner bi çîrokên dê û dapîrên xwe mezin dibe. Di destpêka salên 1960-an de, bavê Hiner, ji ber kurdayetiye, tê girtin û demekê li zîndan dimîne. Piştî berdanê jî, ew derdikeve serê çiyên, tevî tevgera çekdar a kurdî dibe. Ew dibe yek ji çekdarên serokê kurdan M. Mistefa Berzanî. Hiner heta sala 1980-an li welêt dimîne. Lê sala 1980-an riyê nû li ber jiyana wî vedibe; îtalya. Li Îtalyayê, bajarê Venedîgê, ew dest bi xwendina resim û resamiyê dike, li xwendegeha Instituto Statale di Arte. Yanê di xwendegeha bilind a hunerê de. (Ji ber vê yekê ye ku piraniya navên tabloyên Hiner bi îtalî ne.) Digel ku wî li welêt jî resim çêkirine, ew li Venedîgê "hunera hunermendiyê" fêr dibe, hîsa estetîgê têdigihê û hunermendiya hosteyên resim, mîna ya Chagall, dinase. Li wir Chagall jê re dibe rêber, dibe stêrka Gelavêjê ku rê nîşanî wî dide. Ew ji realîzmê bi dûr dikeve û dide ser riyekê nerealîst.

Ew jî dest bi firê û firînê dike û hin motîvên civata kurdî difirîne. Di tabloyên Hiner de motîva herî li pêş, meriv dikare bibêje, hesp e. Hesp, mehîn û cahnî taybetiyeke tabloyan e. Ew li deştên zêrîn, geliyên kûr, zozanên bilind in. Li mala me, ji çend salan û vir ve, tabloyeke biçûk a Hiner heye. Tê de du siwar li ser du hespên kihêl, mîna teyrê elo, difirin. Ne siwar, ne jî hesp baş diyar in. Lê tablo hîs û germahiyeke diyar dide merivan; azadî û serbestî, xweza û tabîat. Hespên Hiner ji kûrahiya destanên kurdî û ji jiyana kurdî ya koçerî tînin. Ew mîna Bozê Rewan, hespê Memê Alan, difirin; mîna Deybilqiran, hespê Siyabend, li pey pezkoviyên, bi leza bayê, dibezin. Azad, serbest, bê qeyd û bend û hemû tabîat mîna mehfûreke rengîn a kurdî li ber wan raxistî...



Di pîrozkirina yeksaliya NÛDEM'ê de gava ku M. Uzun perçeromana xwe dixwîne. (Di resim de Nacî Kutlay û Mehmed Uzun dixuyin)

## LÊBORÎN

Di pîrozkirina yeksaliya NÛDEM'ê de, Mehmed Uzun perçeromana xwe -Bîra Qederê- ku di hejmara pêncan ya NÛDEM'ê de weşiya bû, di huzura deh panzdeh nivîskar û hevkarên NÛDEM'ê de xwendibû. Ev romana ku nivîskar bi salên dirêj li ser xebitiye û li ser fotografan avakiriye, ji çîrokjiyana Celadet Bedirxan dizê. Di beşê ku di NÛDEM'ê de çap bûbû de, him şaşiyên çap û tîprêziyê çêbûne. Di çapa NÛDEM'ê de ji bilî "fotograf 1", jêrenot û nivîsên îtalîk jî winda bûne. Ji bo van şaşiyên han em ji xwendevanên xwe û ji nivîskarê xwe M. Uzun lêborînê dixwazin.

# HATINA TE BENDEMANA MIN

ji bo Leyla...

---

Mervanê KELEŞ

Vedibû:

diçirisî mîna morîkek  
şîn û bê reng!!

Venedimirî:

Ronî dimişt  
Tarîtiya reş-reşka şevê  
sînor  
di ciwaniya wê  
de  
radixist

Pêre:

Helke-helk bi gerdena  
soriêvan  
di  
k  
e  
t...

KON venede:

na

stûnên

malbatê peya

meke

na !!!

BINÊRE:

Koçer çûne

Gumgumên qehwa

ÊLÊ

li ser

Tifika vêketî

qeşê

di ser dev

RE

avêtiye

Li guliyên dora tifikê binêre... lê... lê...!!

Na:

Veneke kiras û xeştanan

Di buxçika "Xwedê" de

bihêl

şînê bi şahiyan neşo...guliyên kur bihejmêre

lê...lê!

Kil di dojeha çavên hespên

çengê

de

me

de

Wan mexelke li bin sîha EYYÛBIYÊN ku em bi "qurana Xwedê" tazî hiştin...

Û bi ser de jî qet nedîtin "Buhîşt Xwedê"...!!

Were de ka were em

biçin

ber

dîwarê

sibeha

heyvê

û

hênkaya

agirê  
destê  
êvara  
ROKÊ...!

Ka were DEVÊ

nêxke  
dakeve  
gul tunene  
ne jî pêşvan  
û parastvanên  
Rûmetê  
li benda  
T  
E  
NE...

Tenê ez, ax,

qermîçokên  
Toza  
birçî

û ava  
ji  
tîbûnê  
mirîmî...!

li hêviya

fermohatina  
T  
E  
NE...!!!

Swêd, Adar 93


Di hejmara pêncan de, di nivîsa Mervanê Keleş ya li ser hunermend M. Şêxo de, navê bavê M. Şêxo ji berdêla "Şêxmûs", "Şêxmû" hatiye nivîsandin. Me li gorî destnivîsa M. Keleş nivîsandibû. Lê paşê wî bi me da zanîn ku wî navê bavê M. şêxo şaş nivîsandiye. Em rast dikin û ji xwendevanên xwe yê delal lêborînê dixwazin.



# MADMAZEL CLAUDE

Henry MILLER

Werger: F. CEWERÎ



Henry MILLER

# MADMAZEL CLAUDE

**G**ava cara pêşî min dest bi nivîsandina vê çîrokê kir, min bi gotina ku Madmazel Claude orospî ye dest pê kiribû. Rast e, ew orospî ye, ez venaşêrim, lê tiştê ez dixwazim bibêjim ev e: Ger Madmazel Claude orospî be, mirov ê ji wan jinên din yên ku ez nas dikim re çî bibêje? Ez nizanim çima, lê gotina orospî ne berfireh e. Madmazel Claude tiştêkî ji orospîtiyê wêdetir e. Ez nizanim bê ez ê wê çawa bidime naskirin. Dibe ku jî tenê ji bo ku ew Madmazel Claude e. Soit <sup>(1)</sup>

Xaltiyêke wê hebû ku her şev rûdinişt û li bendî wê radiwestiya. A rastî ev zêde neketibû serê min. Xaltiya wê bû! Bi texmîniyêke mezin ya ku li bendî wê radiwestiya maquereau <sup>(2)</sup> a wê bû. Lê ew jî ji wê pê ve îşê kesekî din pê tune bû... Ez dîsan jî ji vî karî aciz dibûm. Ez difikirîm ku ew qewada han li bendî wê radiweste û gava ku ew peran nediyê, dibe ku ew şîmaqekê ( şîqamekê) li ser çavê wê xe. Û Claude çiqas hez bike ( bi rastî jî wê zanîbû hez bikira) di serê min de xeyala wê piça xwînmiya bêrûmet hebû. Hûn xwe di mijara orospîtiyê de nexapînin. Ew çiqas merd bin bila merd bin, ew çiqas xwe bidin bila xwe bidin, ger hûn hezar frankî jî bidine wan (kî hezar frankî dide wan?) her tim mêrikek li dû we heye. Tiştê bi dest wî dikeve jî tenê tamkirin e. Her tim yê li dû we şêreparê digire, hûn dikarin bi vê yeka han emîn bin!

Lê ez paşê têgihîştim ku ez bêsedem hêrs bûbûm û ketibûme heyecanê. Li navê tu maquereau filantunebû-yanî maquereau ya Claudeê tunebû. Maquereauê pêşî yê Claudeê ez im. Di ser re jî ez ji xwe re nabêjim, ku ez maquere me. Ez

dibêjim qewad. Ez niha qewadê wê me. Temam. Niha bi hemû awayî tê bîra min bê min şeva pêşî ew bi çî awayî anîbû odeya xwe. Min çawa xwe rezîl kiribû. Gava jin tevî karê min dibin ez her tim xwe rezîl dikim. Problem ew e, ku ez jinperest im; jin jî wê yeka han naxwazin. Xwestina wan... Her çibe, wê şeva pêşî, dixwazin bawer bikin, dixwazin bawer nekin wê şevê mîna ku ez di jiyana xwe de bi tu jinan re ranezabim tevgeriyam. Heya îro jî min fêhm nekiriye bê çima wê şevê wilo bû. Lê wilo bû. Tê bîra min, ew hê berî kincên xwe ji xwe bike li ba qeryole rawesta û li min nihêrî; hebe tune be, ew li bendî bû ku ez tişteki bikim. Ez diricifim. Ji gava ku em ji qehwexanê derketibûn ez diricifim. Min ew hêdika maçî kir-ez bawer im min lêvên wê maçî kiribû, ez nizamim, dibe jî ku min eniya wê maçî kiribe. Mirov kare tiştên wilo ji min bipê. Çaxa ku jin di nav karê min de hebin, ez nizamim, di dilê min de mîna ku wê alîkariyeke mezin bi min kiribû, hebû. Weke min got, Claude ne tenê orospiyek e.

Hê berî ku ew şewqê xwe ji serê xwe bike, wê çû pencere girt û perde kişand. Paşê wê wilo çavek avête min, keniya û di derheqa jixwekirina kincan de ji min re tiştin gotin. Gava wê xwe bi mûslixa avê re mijûl kir, min jî kincên xwe ji xwe kirin. A rastî ez bi heyecan bûm. Min di dilê xwe de digot ku ez li wê binihêrim ew ê fedî bike. Loma min ew kaxizên li ser masa xwe hebekî tev dan, min çend notên bêmane nivîsandin û min ser makîna xwe ya nivîsandinê nuxumand. Gava ez li wê zîvirim, min dît ku ew bi tena binkiraskê xwe yê tenik çimên xwe paqij dike.

- Zû! Têkeve nava nivîna, got. Min germ bike!

Û wê hebekî din jî vir û wir xwe paqij kir. Her tişt wilo tebiî bû, ku tavilê dawîya bêhuzûrî û heyecana min hat. Min dît ku wê gorên xwe bi rêk û pêk pêçane. Tişteki weke jartiyerê (lastîka gorê) li nava wê li ba dibû, wê ew jî piştî kurtedemekê derxist û avête ser piştê kursiyê.

Ode bi rastî jî sar bû. Demekê, demeke dirêj, me hevdu hemêz kir, me xwe li hev pêça û em bêdeng razan, me hevdu germ kir. Min milekî xwe li stûyê wê gerandibû, bi milê din jî min ew ber bi xwe ve kişandibû.

Wê her ew awirên xwe yên ku tiştin hêvî dikir berra çavên min dida. Ez dîsan lerizim. Firansiziya min jî wextî dawî bihata. Niha nayê bîra min bê min hingî ji wê re gotibû, ku ez ji wê hez dikim an na. Hebe tunebe min ê gotibe. Her çawa be, ger min gotibe jî dê wê ji bîr kiribe. Gava ez çûbûm jî, min ji wê re romana "Afrodît" ya ku wê gotibû ku wê nexwendiyê û cotek gorên hevrêşim ku min ji bo hinin din kirî bûn, ji wê re diyarî kiribûn. Xuyabû wê gore ecibandibû.

Cara dudan ku min ew dît, min hotêla xwe guhertibû. Wê ew awirên xwe bi lez û bi hewes bera wê navê dan û tavilê têgihîşt ku rewş ne ewçend baş e. Wê bi saftiyeke mezin pirsî bê ka ez baş dijîm an na.

- Divê tu demek dirêj li vir nemînî, wê got. Ev cihekî pirr bi hizin e.

Dibe ku wê gotina "bi hizin" e, bi kar neanibe, lê ez dizanim ku wê dixwest wê bibêje.

Bi rastî jî ode hizin dida mirov. Alav jihevdeketî bûn, camên penceran şikestî bûn, xalîçe qetiyayî û pîs bûn, av tune bû. Şewq jî kêmbû. Ew şewqa kêmbû û çilmisî rengêkî cûn û kufukî dida rûyê nivîna.

Di tevgerên wê yên wê şevê de xuya dikir, ku wê ji min dilxerabî dikir. Wê ji min re got:

– Yeke din ku tu jê hez dikî heye.

– Na, keseke din tune ye, min got.

– Wê çaxê min maçî bike, got û bi wî laşê xwe yê bi jîn û germ ez hemêz kirim. Te digot qey ez di germahiya goştê wê de avjeniyê dikim... Ne ku min tê de avjenî dikir, ez difetisîm, ez di zewqê de difetisîm.

Paşê me behsa Pierre Loti û Stembolê kir. Wê got, ku ew rojekê dixwaze here Stembolê. Min got ez jî dixwazim herim. Paşê ez bawer im ji nişkê ve wilo got: "Tu peyayekî bi ruh î". Min di ser guhê xwe re avêt. Hebe tunebe ez gelekî dilşa bûm. Gava orospiyek ji we re bêje ku ruhekî we heye, wê çaxê mana wê zêdetir dibe. Orospî bi gelemperî behsa ruh nakin. Paşê tiştêkî ecêb bû. Wê pere ji min nestand.

– Divê tu li peran nefikirî, wê got. Em niha hevrê ne. Û tu gelekî feqîr î...

Wê destûr neda ku ez ji nava nivîna rabim û wê heya bi derî rêwî bikim. Wê çend cigare ji çentê xwe derxistin û danî ser masa li kêleka qeryole, yek jê jî xiste nava lêvên min û bi çaqmaqekî biçûk î tûnc, ku ji hinan diyarî girtibû, cigara min pêxist. Paşê jî ji bo ku ew min maçî bike wê xwe daqûl kir.

Min bi milê wê girt. "Claude" min got. Vous êtes presque un ange<sup>9</sup>. Ax non!<sup>10</sup> wê bi lez got. Di çavên wê de tiştêkî mîna êşê û dehşetê hebû.

A rastî wê gotina "presque"<sup>9</sup> Claude mehû kiribû. Min ew yeka ha tavilê fêhm kiribû. Yek jî ew nameya ku min piştî kurtedemekê dabûyê-digel hemû berbatiyên fransizî, ew nameya herî baş bû ku min di jiyana xwe de nivîsandibû. Me ew name li wê qehwexana ku me her tim hevdu lê didît, bi hev re xwend. Weke min got, ji bilî wan çend rêzên ku min ji Paul Valery dizîbûn pê ve, firansiziya namê berbat bû. Gava ew gihîşt wan rêzan ew hebekî rawestiya.

– Te pirr xweş nivîsandiye, wê got. Bi rastî jî gelekî xweş e!

Paşê jî wê bi ecêbmayî li min nihêrî û dîsan xwendina xwe dom kir. Ya ku tesîr li wê kir ne Valery bû. Min karîbû bêî Valery jî îdare bikira. Na, ya ku tesîr li wê kir, ew gotinên di derheqa melektiyê de bûn. Min dîsan jî şeytanî kiribû-lê vê carê heya ji min hat min bi nazikî û bi bawerî mijara xwe xemilandibû. Lê gava em hatibûn dawîya namê, ez gelekî bêhuzûr bûbûm. Ewçend ji wê fêdedîtin kirêtiyek bû. Ez nabêjim tiştên ku min nivîsandin ne ji dil bûn, lê piştî wê nivîsa pêşî ya ji dil-ez çî zanim, dawîya maye jî tenê edebiyat bû. Paşê em bi hev re li ser nivîna rûniştin. Gava Claude bi îsrar nameya min ji nûve xwend û şaşiyên zimên rast kirin, rewş hê xerabtir bû. Ez hebekî li hemberî wê bêsebir tevgeriyam, wê jî ew yeka han fêhm kir. Lê ew dîsan jî gelekî dilşa bû. Wê got, ku heta ew li dinyayê be ew ê wê nameyê hilîne.

Ew bi rohilat re çû. Dîsan pirsaxaltiyê. Ez hînî wê xaltiyê bûbûm. Hem jî ger bi rastî li navê xaltiyêke rastî tuneba, min ê di nêzîk de fêhm bikira. Claude di karên sergirtî de ne bi serketî bû-paşê yek jî ew pirsax melektiyê...Baş tesîr li wê kiribû.

Min xwe li ser nivîna dirêj kiribû û ez li wê difikirîm. Bi rastî jî ew li hemberî min gelekî baş tevgeriyabû. Lê maquereau? Ez li wê jî fikirîm, lê ne pirr, êdî ew jî çavkaniya xemgîniyê derketibû. Ez fikirîm ku ez ê çawa tenê Claudeê dilşa bikim. Spanya... Stembûl... Ez wê gava em bi tembelî li bin tava rojê digerin, hûrikên nên davêjin ber kevokan û xweşustina wan temaşê dikim; an jî gava pirtûkek di destê wê de ye -pirtûka ku ez ê pêşniyarî wê bikim- û xwe di hêlkanê de dirêj kiriye tînim ber çavên xwe. Kî zane, dibe ku ew di vî temenê xwe yê ciwan de ji Versaillesê wêdetir neçûbe. Gava ew li trêne siwar dibû, dibû weke ku ez awirên wê dibînim. Paşê jî li cihin din, li ser kaniyekê... Li Madrîde an jî li Sevilleyê... Min di dilê xwe de dibihîst ku ew bi min re dimeşe; ew nêzîk bû, ew her nêzîkî min bû. Wê nizanîbû ku ew ê çawa bike û bi tena serê xwe bimîne. Û ger ev nêrîke dînikî be jî dîsan kêfa min jê re dihat. Ew jî qaltaxên din yê ku gava mirov bi wan re radizê ew dixwazin mirov bişêlînin, çêtir bû. Belê, min karîbû baweriya xwe bi Claude bianiya. Ev dû re karîbû bibûya aciziyek- dû re... dû re. Ez dilşabûm ku min ji xwe re orospiyek hilbijartibû. Orospiyek sadîq! Ger hin kes wê gotinê ji min bibihîzin ez zanim ew ê bi pîrçînî bikenin.

Ez her tiştî bi hemû hêlên wê dihesibînim; cihê em ê herinê, kincên em ê li xwe kin, tiştên em ê bipeyivin... Her tiştî... her tiştî. Min texmîn dikir ku ew katolîk bû, lê min guh nedidayê. Berevajiya wê, kêfa min jî jê re dihat. Çûyina dêrê ya ji bo libergerîna Xwedê, ji ya mîmartî an jî ji gûyekê wê çêtir bû. Ger wê bixwesta ez jî dibûm katolîk... Wê çi bibûya! Tiştê li xweşa wê biçûya min ê ew bikira. Ez fikirîm bê tu zarokên wê jî hene an na. Bifikirin, zaroka Claude! Min ê ji zaroka xwe bêtir jê hez bikira. Erê, divê zarokeke Claude hebe... Divê ez li ser vî karî rawestim. Min zanîbû ku wê rojekê maleke me ya bi balkon, odeyek wê li hemberî çem, der û dora pencereyên wê bi gul û der û dor bi çûkan dagirtî hebe. (Gava ez dikevîm hundur, ez di destê xwe de qefeseke çûkan dibînim. Temam. Tenê ku ew dilşa bibe). Lê çem? Di eslê xwe de divê çend çem hebin. Ez li ser çeman dîn dibim. Tê bîra min, carekê li Rotterdamê... Lê wê sibehê fikra şiyarbûnê, roj di penceran re derbasî hundur bûbû, li ba te yeka ku ji te hez dike, wilo hez dike ku...Orospiyek baş, yeke sadîq, çûk dikin çivînî, sifre hatiye raxistin û wê serê xwe şuştîye, porê xwe dişkine û ew kevnepeyayên ku ew berê pê re maye, ji nava xwe davêje, niha jî tu, tenê tu û keştî derbas dibe, jiyan di hundurê wê de diherike û diçe. Di hundirê wê de ew hemû mêrên berî te, û dibe ku jî piştî te jî, gul û çûk û roj hundur tije dikin û ev bêhn te difetisîne, te nahêle. Xwedêyo! Bila her û her orospiyek be. Min ji Claudeê xwest ku em bi hev re bijîn. Wê nexwest. Ev yeka ha ji bo min mirinek bû. Ez zanim ku ew

ne ji bo feqîrtiya min bû. Claude bi rewşa min û peran û bi nivîsandina min û pirtûkekê dizane. Na, divabû tiştêkî din, sedemek din ya kûr heba. Lê ew nabêje bê çi ye.

Paşê tiştêkî din jî heye, ez êdî weke ewliyakî tevgeriyam. Ez bi serê xwe derdikevim meşên dirêj. Tu têkiliyên van tiştên ku ez dinivîsînim bi pirtûka min re tune. Tu dibêjî qey ez di gerdûnê de bi tena serê xwe me. Tu dibêjî qey jiyan mîna hêkelekî li ser hev û cihê ye. Min navê yê ku ez afirandime jî ji bîr kiriye. Tu dibê qey hemû tiştên ez dikim ji cihên mezin têdizên. Tu dibêjî qey tenê ji bo ez qenciyê bikim, ez hatime vê dinyayê. Di dilê min de hîseke wilo heye. Ez li bendî raya kesî ranawestim.

Êdî min alîkarî ji Claudeê nedipa. Ez hemû deynên xwe yên ku li wê ne dihesibînim. Claude van rojan xemgîn dixuye. Carinan gava ez di ber terasa qehwexana ku ew lê rûdinê derbas dibim, ez karim sond bixwim ew digirî. Ez zanim ew ji niha ve dil ketiye min. Ew ji min ecêb hez dike. Ew li terasa qehwexanê bi saetan rûdinê. Ez jî carinan wê ji wir digirim û bi xwe re dibim. Ji ber ku gava ew li wir bi tena serê xwe rûdine û bi xemgînî radiweste, ez debar nakim...Min di guhê hin hevalên xwe de kir pistînî, min ji wan re behsa wê kir. Erê, çawa be jî sekinandina Claude ya li wir çêtir e. Gelo gava ew li wir bi tena serê xwe rûdine ew çi difikire? Gelo ez rojekê herim frankekî bidimê ew ê ji min re çi bibêje? Gava çavên wê bi hiznê tije dibe, ez herim ba wê û "Voici quelque chose que j'ai oublié l'antre jour" <sup>6</sup> bibêjim. Carna gava em bi hev re radizên û bêdengiya tijî û dirêj çêdibe, ew dipirse: "Oue pensez-vous maintenant?" <sup>7</sup> Ez jî her bersiva wê bi "Rien" <sup>8</sup> didim. Lê ya ku bi rastî di dilê min de dibuhure "Voici quelque chose que..." <sup>9</sup> L'amour a Credit <sup>10</sup> hêla wê ya xweş ev e.

Her cara ew ji min vediqete zengilên dêran bêhawe lêdikevin. Her tiştên di hundirê min de ecêb xweş dikin. Ez piştî xwe dispêrim behlîfê û bi kêf wê cigara sivik ku wê ji min re hiştiye dikişînim. Qet pêwîst nake ez ji bo tiştêkî tevbilivim. Ez bawer im diranên min teqme bûna, wê dê ji bîr nekira ku têxista wê qedeha li ser masa li ber serê min, ya ku saeta bi zengil, kibrît û hûr mûrên din li ser bûn. Pantorê min bi rêk û pêk qat kiriye, palto û şewqê min li ber derî bidarde kiriye. Hemû tişt li cihê xwe ne. Çi xweş e! Bila dosteke mirov a qehpik hebe bila milyonek deynê mirov hebe...

Ya baş jî berdewamiya hîseke wilo xweş e. Ev hîseke mîstîk e, mîstîkbûyin jî tê maneya têgihîştina temamiya jiyanê. Ez ewliya me ne ewliya me ez zêde guh nadimê. Ewliya zêde tabê dibînin. Ez qencîtiyê, aştiyê û huzurê belav dikim. Her ku diçe jî ez ji Claude re zêde muşteriyên dibînim. Gava ez di ber wê re derbas dibim, ez êdî wan awirên wê yên bi hizin nabînim. Hema hema em her roj bi hev re xwarinê dixwin. Ew her tim ji bo ku min bibe cihê buha li ber xwe dide, ez jî êdî delaliya nakim. Ez ji her guhertinên jiyanê zewqê distînim. Ji cihên buha jî, ji cihên erzan jî...Armanca min ew e ku Claude dilşa bibe.

Pourtant je pense a quelque chose <sup>11</sup> Ew tiştêkî biçûk e, lê ew her ku diçe di

serê min de bi mane dibe. Min berê di derheqa vê de qet tişteq negotiye. Ez xwe bi xwe fikirîm ku ev ziraviyeke nayê xwestin e. Di ser de jî gelekî xweş bû. Di cara dudan de nizanim ne ziravî bû, ne jî bêdîqetî bû? Cardin jî, rien a dire<sup>(12)</sup> Di navbera cara dudu û sisiyan de mirov kare bêje ku min ew xapand. Erê, ez êvarekê hebekî serxweş li Grands boulevardsê bûm. Heta bi place de la Republique den Le Matin ez ketim her cihî û derketim, teyrekî berata ku mirov di demên normal bi ser de mîz nake, êrîşî min kir. Bûyerek şên bû. Serê deqîqeyekê mêvanan li deriyê me dixistin. Keçikên reben yên Folies Bergerese ji bo ku misyoyên dilpak bexşîşekê bide wan. Ne pir, bi qasî sih frankî. Baş e, lê ji bo çi? Pour rien...pour le plaisir.<sup>(13)</sup> Ecêb, ew şevê, ecêb bû-piştî du-sê rojan jî xur û xemgînî dest pê dike. Seredaneke bi lez li nexweşxana Emerîka. Bi mantoyên xwe yên reş î qîr Ehrlich tê ber çavên min. Lê tişteq tune ye. Tenê xemgînî ye.

Gava min mijar ji Claude re vekir, wê bi heyret li min nihêrî.

– Ez zanim baweriya te gelekî bi min tê Claude, lê...

Claude naxwaze dema xwe bi mijareke wilo bibuhurîne. Peyayekî ku bi zanebûn nexweşiyê derbasî jinekê bike ew mêrkuj e. Claude rewşê wilo dibîne.

”C’est vrai, n’est-ce pas?”<sup>(14)</sup> ew dipirse. Vrai <sup>(15)</sup> erê, rast e. Dîsan jî... Lê mijar hatiye girtin. Peyayekî ku vê yekê bike ew peyayekî mêrkuj e.

Van rojan her sibeh gava ez rûnê parafînê dadiqurtînim- ez bi wê re jî pirtûqalan dixwim- Ez li wan mêrkujên ku nexweşiyên derbasî jinan dikin difikirim. Rûnê parafînê bi kevçî ve dizeliq. Divê mirov pirr baş bişo. Ez kevçî û kêrê pirr pak dişom. Ez her tiştî baş dişom. Ev adeta min e. Piştî ez ser çavên xwe dişom ez li xewliyê dinêrim. Xwediyê hotelê heftiyê zêdeyî sê xewliyan nade. Heya roja sêşemê bêhna genî jê tê. Ez kêr û kevçiyê xwe bi xewliyê pakij dikim, rûyê xwe jî bi rûyê nivîna ziwa dikim. Ez rûyê xwe pak nakim, ez tenê kujê rûyê nivîna ê hêla lingê xwe hêdî di rûyê xwe didim.

Kuçeya Hippolyte Mandron di çavê min de gelekî kirêt dixuye. Ez ji hemû kuçeyên vir yên pîs, tengotehir û bi navên romantîk nefret dikim. Ez Parîsê dişibînim pizikek mezin û kirêt. Kuçe bûne kangren. Her kes nexweş in- bi gonorê û klamydya ne. Hemû Ewrûpa nexweş e. Yê ku hemû Ewrûpa nexweş kiriye jî Fransa ye. Ger mirov hêvanê (heyvanê) Voltaire û Rabelais be wê rewş wilo be. Wek min cara pêşî dil kiribû, divabû ez biçûma Moskovayê. Li Rûsyayê rojên yekşeman tune ne, ma wê çi bibe?

Niha rojên yekşeman jî weke rojên din in. Tenê kuçe û kolan hê bêtir kalabalik dibin, bêhejmar belengaz li ortan digerin û nexweşiyên belav dikin.

Bila şaş neyê fêhmkirin, ev bêhtengiya min ne li hemberî Claudeê ye. Claude harîkayek e, un ange, di ser re jî divê yekê de presque filan jî tune ye. Qefesa çûkê bi derveyî pencerê ve bidarde kiriye, gul jî hene- Lê vir ne Madrîd û Sevilla ye, kehnî û kevok jî tune ne. Na, her roj em diçin klînikê. Di deriyekî re ew dikeviyê, di deriyekî re ez. Êdî restorantên buha jî nemane. Ji bo ku ez

bêhuzûr nebim ez herşev diçim sînemayê. Êdî ez debar nakim ku ez Dome an jî Coupoleyê bibînim. Ew pîncên bi qatên kincên bej û gomlegên mildirêj yên ku li terasên qehwexanan rûdinên û bi jîn dixuyin. Ne tenê sûtê Claudeê ye. Min ji wê re gotibû, divê ew li van pûştên ku xweş li xwe dikin miqate be. Lê ew gelekî bi xwe bawer bû. Derzî merzî û paşê jî bi her kesî re... Va ye tam jî wilo bû. Jiyana bi orospiyekê re- ger ew orospiya dinyayê ya herî baş be jî- tijî zehmetî ye. Herçiqas carinan bêhna mirov teng bibe jî, ya girîng ne hejmara zilaman e; ew pakijiya bêdawî, xweparastin, şuştin, lêkolîn, xem, tirs... Paşê jî digel her tiştî- min ji Claudeê re gotibû...-Min çend caran gotibû-"Li van bîtriman dîqet bike!"

Na, hemû tiştên ku bûne sûtê min in. Ez bi nên nehatim ser, yek jî min xwest ez ewliyatiya xwe pê bidim îsbatkirin. Ger mirov carekê ewliyatiya xwe ferq bike divê mirov li wir raweste. Ewliyatiya ku mirov nîşanî orospiyek biçûk bide weke mirov di deriyê dawiyê re têkeve buhuştê. Gava ew xwe nêzîkî min dike- ew niha ji hertim bêtir ji min hez dike- ez xwe mîna mîkrobeke pîs ku ketiye ruhê wê hîs dikim. Ger ez bi melekekê re jî bijîm, bi min wilo tê ku divê ez bibim weke peyan. Divê em ji vê oda nexweş û kirêt derkevin û barkin xaniyekî li bin rojê, ku balkona wê li hemberî çemekî ye. Bila çûk, gul, jiyan di pêş me de biherikin, tenê ez û ew, bila kesekî din li ba me tunebe.

- 
- (1) Bila be.
  - (2) Qewad.
  - (3) Tu wekî melekekê yî, li ku be.
  - (4) Na.
  - (5) Li ku be.
  - (6) Ev e tiştêkî ku min do ji bîr kiribû.
  - (7) Tu niha çi difikirî?
  - (8) Hîç.
  - (9) Ev tiştêkî wilo ye ku...
  - (10) Evîna bi texsîtan.
  - (11) Nexwe ez tiştêkî difikirim.
  - (12) Tiştêkî ku bête gotin tune ye.
  - (13) Hîç... ji bo zewqê.
  - (14) Rast e, ne wilo?
  - (15) Rast e.



# NÛDEM

Ferhad PÎRBAL

Estî smankirina kîsê, Bêdo li Şembolê Kelas di Dîclê  
Yênê Yûnî de ma'ê û wê biyê xwe diye, buwê xî  
xayînê ne xweşxana Diyarbekirê kirine. Bêdo li  
Diyarbekirê ma'ê kirî ye de û bavê xwe xanîna b

Zemâs'eh Hêwana mala Zînoyî nû ye. Zîno hêwana  
xwe wek a mala Bêdê xwe ji berê raxistû ye. Li her de  
alîyan'ok da'ine. Li navê ji ma'ê.

Sibehê bavê ma'ê û dî de dorê ma'ê tî dîl xweşî taştê  
dîwin.

Ser û Sekêh Zîno, fîlankî nû ye bajarî tî ye kîtanî  
nik û çî kirî di bin guhê wê tî ye. simikê bajarî jî tî  
nigê de ye.

Bîro rîhê wê kî kirî ye, şefqak li serî tî, de tîk kîncê  
nûn lê ye qulkê wê be tî ye qêrewat tî.

Bêdo qutikê sipî î zendîkê tî tî ye. pantorkî paqij  
tîkirî jî tî xwe kirî ye.

Li ser ma'ê bi tîspêkî taştê raxistû ye. Zîno, çayê jî Bîro  
rî qêxê. Dîwî hawayî de perîle wê dibe.

Diyarbekir - Şefqak li serî - Pantorekî paqij - li xwe kirî ye.

# DI DESTANÊN KURDÎ DE BERXWEDAN Û SERDESTIYEK JINAN

---

ROHAT



## HER DESTANEK JÎYÎNEK E

**D**i destanên (beyt, serpehatî) Kurdî de gelek realîteyên jiyînê hene, jiyîn timê dikele û jîndariya van berheman me gelekî ronî dikin, şemal û tîrêjên berfireh belav dikin, ji bo ku dinya me hîn jî xweşiktir bibe, me di nav ronahîke mezin de dihêlin, mesajên gelek xurt dighînin me, di rojên teng de tîr hewara me mirovan, ji me re dikarin bibin referansên pir giranbiha. Ji bo ronahîkirina cîhê jinan di civata Kurd de, ev destanan gelek rênîşandar in, cure cure materîyal û îmkanên folklorîk û edebî pêşkêşî me dikin.

Dema mirov destanên Kurdî baş analîz dike û tê de kûr dibe, di nav van destan û serpehatiyên bi nav û deng de em rastî serdestîke jinan tîr, jin xwedî erk û berpîrsîyar in, di hevsazî û pêşketina bûyerên van destanan de roleke mezin dilîzin, ew timê li dijî neheqî û bêdadîyê radiwestin, ber xwe didin. Di van destanan de tekoşîneke jinan heye. Jinan bi xwîna xwe ve be jî, di dinya van destanan de ji xwe re textek ava kirine. Ji bo bicîhanîna daxwazî, hevî û xewnerojên xwe timê ya xwe kirine, bêdilî, dudilî an jî bêgavî di biryarên wan

de kê m tê dîtin, ew di vî warî de gelek serhişk in, gelek caran ji bo dilketîyê xwe dimrin, canê xwe didin, wek Mecnûn dîn dibin, qet ne be di gorê de xwe dighînin hev. Ji ber vê yekê jî, di van destanan de em rastî trajediyên mezin tên. Di destanên Kurdî de reng û tehrê bûyerên bingehîn, çawa em dibînin bi destê wan diguhirin an jî ew bi xwe dibin bayîsê bûyerên giring. Di pêkanîna avahiya bûyerên destanê de û di warê zelalbûna mesaja van berheman de, em dikarin bêjin mêrxasên jinî roleke berbiçav dilîzin. Di hemû şax û guhartinokên van destanan de, jin di rêke rast, pozîtîf, qenc û di rêke konstruktîf de dimeşin. Hem ji bo azadiya xwe (emancipation), hem ji bo azadiya welatê xwe, hem jî bona mafên mirovî, çawa em dibînin ew xwe davêjin nav agirên mezin. Dema mirov hemû van destanan û şaxên wan rûberî hev dike, hemberî hev dike, mirov dibîne ku gelek babetên hevpar, hev reng di naveroka van berheman de hene. Gelek caran mêrxasên jinî, mêrxasên mêrî dixin bin bandûr û kontrola xwe, mêran jî xirabiyê, ji rojên reş diparêzin, riyên rast nîşanî wan didin. Heta niha rûberîhevkirina destanên Kurdî zêde nehatine pêkanîn. Ne tenê rûberîhevkirina wan, ev berheman îro çawa em dibînin hê nehatine berev kirin, derbasî li ser kaxiz jî nebûne. Ji ber van dijwariyan, îmkân û mecala li ser van berheman kar kirin, lêkolîn çêkirin jî bêguman jar û qels dikeve an jî pêk nayên. Dema mirov van berheman rûberî hev dike, mirov rastî zaniyarî, agahdarî û encamên gelek giranbiha tê. Ji ber ku ev bi hezaran sal e, ev berheman li ser zar- zimanê gel digerin, gel jî bawerî, gotin û ceribandînan xwe yê bi salan tevî van berheman kirine, ew dewlemend kirine, tehr û rengê nû dane wan, di dawiyê de ev berheman bûne dewlemendîke folklorîk. Di vê lêkolîna xwe de em dixwazin qasî 20 destanên Kurdî û serpêhatiyên gel yê navdar rûberî hev bikin û di naveroka van berheman de tenê cihê jinan, serdestîya wan, rol û berpirsîyarîya wan tespît bikin û xwe bigihînin çend nêrîn- baweriyên hevpar û giştî. Motîva jinan, evîn û zewac-mêranîne di folklorê Kurdî de motîveke gelek xurt û fireh e. Le belê di vê lêkolîna xwe de zêtir em dixwazin li ser destan û serpêhatiyên gel, beytên Kurdî bisekinin. Berhemên ku li ser babeta jinan agahdarî û zaniyarîyên balkêş tê de hene, di nav folklorê Kurdî gelek in, materiyal hêjayî lêkolîne ne, wek mîsal : Memê Alan û Zîna Zêdan, Sîyabend û Xecê, Ker û Kulik, Bineşa Narîn û Cembelîyê Hekkarê, Mem û Eysê, Zembîlfiroş, Sêva Hecî, Menşa Elîyê Selim Axa, Kela Dimdimê, Filîtê Quto, Bişarê Çeto, Saliho...Ji der van destanan çend destanên mayîn jî, bi taybetî di nav Kurdên Îranê de belav bûne, paşê hatine berev kirin, gelekî balkêş in, wek Şêx Ferx û Xatun Astî, Şor Mehmûd û Merzingan, Mahîr û Wefa, Behram û Gulandam...(1). Lêkolînavê Almanî Oskar Mann, cara pêşîn bi firehî çend destanên Kurdî hem berev kirin, hem jî ew wergerandin zimanê Almanî, wek du pirtûk çap kirin, wek Laz û Xezal, Nasir û Malmal, Qer û Gulîzer, destanên heta niha nebrevkirî weşandin(2). Bêguman gelek destan û serpêhatiyên gel yê mayîn jî hene ku dikarin di vê babetê de alîkarîya me bikin û me ronî bikin. Bi taybetî çend destanên ku di nav gelên rohilatê de belav bûne, wek Leyla û Mecnûn(3), Ûsif

û Zelêxe(4), Rustemê Zal(5) gelek destan hatine ketine zimanê Kurdî. Ji der şaxên destanên Kurdî, çawa em dibînin çend şaxên van destanan yên edebî jî, paşê ji alfyê nivîskarên Kurd de hatine amade kirin. Rûberîhevkirina şaxên folklorîk û edebî jî angorî her destanekê dewlemedî û rengînîkê pêşkêşî me dike. Ji alfyê din çend destanên ku di zimanê Kurdî de zêde belav nebûne, ji alfyê Kurdan de hatine wergerandin, jîyîna folklorîk û edebî di nav Kurdan de ji bêtamî û rijîtyê parastine, wek destana Ferhat û Şîrîn... Angorî çend çavkanîyan, Ferhat bi xwe ji malbateke Kurdî hatîye (6). Lê destan bi xwe gelo di nav Kurdan de çima ewqas belav nebûye? Bersîva vê pirsê jî gelek balkêş e. Dengbêj û destanbêjên Kurd, gelek destanên rohilatê bi motifên Kurdî ve dewlemend kirine, xemilandine, li gelek cîhên Kurdistanê şaxên van destanan peyda bûne. Ji van destanan û şaxên wan beşek hatîye berev kirin, êdî bûne kerîkî edebîyata Kurdî ya anonîm. Lê belê vê lêkolîna me ya bi sînorkirî, wek xebat, armaneke wusan fireh nedaye pêşîya xwe, ji bo ku hemû destanên Kurdî yên naskirî şaxên wan yên folklorîk- edebî pêşkêş bike, rûberî hev bike. Ev xebata me di vî warî de tenê gavek e, bêguman gaveke pêşîn û piçûk e, ji kurtenotan pêk tê, divê gavên mayîn bên pêkol kirin. Ji ber ku lêkolînên li ser destanên Kurdî, ne tenê problematika folklorî Kurdî, wisan jî dikarin gelek pirsên edebî, civakî, etnografîk, dîrokî ronî bikin, sînoren van warên lêgerînan nêzîkî hev bikin.

## DI DESTANÊN KURDÎ DE STRUKTURA BINGEHÎN: DIJAYETÎYA SÊSERÎ

Di destanên Kurdî de babeta ku bala me zêtir dikşîne, ev berheman wek serpêhatîyên evîndarîyê yên romantîk li ser sînoren mirin-kuştinê şax vedidin, bi van bûyerên rûsar, xemgîn û nedilşa ve xelas dibin. Beşên van berheman yên fînalê, encamê gelek dramatik in. Bayis û sedemên pêşketina van bûyeran, bi bawerîya me, di nav van destanan de peydabûna rekabeta bi destxistina jinê ye. Bi taybetî du mêr (dilketî) dibine evîndarê keçekê, bi keçikê ve dibin sê kesan, ev pêwendîyên sêserî-sêber demek tê, êdî her diçin berbi xirabîyê dimeşin. Ji van hersê kesan re tu rêke xelasîyê namîne. Ji herdu raqîbên mêrîn yek tu gavekê şunda navêje, hebûna yekî tunebûna yê mayîn bi xwe re tine. Car-car hem jin, hem jî dilketîyê yekemîn di vî şer-dewê sêserî-sêber de tîn kuştin an jî, ji qehra dijwarîyên mayîn can didin, dimrin. Raqîbê duwemîn çawa em dibînin, pêwîst nîne dilketîk be, car-caran jî ew dê-bav, ap an jî hêzên mayîn in, ew jî nigê dilketîyê yekemîn û jinan dixine soleke teng, dijwarî û serêşîyên mezin peyda dikin, ji bo ku du dil nebin yek, gelek caran jî xwîn dirije an jî dilketîk ji ber êş-jana dilan dimire. Di destanên Kurdî de bêguman gelek strukturên mayîn jî hene. Lê belê struktura here balkêş struktura dramên sêserî an jî sêber in.

Di dawîya destanên Kurdî de, evîna du dilan gelek caran dibe sergêjî û serêşîke mezin, ji bo çareserkirina van serêşîyan çawa em dibînin mêrxasên van destanan canê xwe didin, dibin gorî, di nav van gorîyan de hejmara jinan zêtir e. Ji ber ku ew di bin zordestîke mezin de ne, di navbera du avan de dimînin, nizanin çî bikin û dihelin diçin, mirinê wek rîyeke xelasîyê hildijbêrin. Di destana Şêx Ferx û Xatûn Astî de her çiqas motîfên pro-jinîn hebin jî, bi taybetî mirina Astîyê, vê struktura pêwendîyên dilketîyan gelek vekirî nîşan dide, bi taybetî beşa dawîyê. Dema Ferx û Astî mezin dibin, dilê wan dikeve hev, çawa em ji destanê fêr dibin, ew gelek ji hev hez dikin. Dilê yekî bi navê Uso jî dikeve Astîyê, ew hertim li pey Astîyê ye. Du xuşkên Astîyê jî hebûne, navê wan Naz û Nazdar in. Rojekê ev hersê xuşk û Ferx bi tevayî diçin hewz, avjenî dikin, xwe rût-tazî dikin, dikevîne avê. Ji ber ku Ferx avjenî nizanibûye, ew li qiraxa hewz disekine, li wan mêze dike. Piştî demekê bavê Astîyê, ji keça xwe dipirse wekî ew dixwaze mêr bike an na, eger dixwaze, bi kê re? Keça wî her çiqas dibêje ez mêr nakim jî, paşê bav jê derdixwe ku dilê wê di Ferx de heye, dibêje "evîn ji xwedê ye" û keça xwe dide Ferx. Ferx paşê diçe Bexdayê, demeke dirêj li wir dimîne, Astî jî derdê Ferx ker-gêj dibe. Rewşa bavê jî xirab dibe, ji ber neçarîyê mecbûr dimîne keça xwe Astîyê dide şivanê xwe, navê wî Şaxol bûye. Ferx bi alîkarîya qulingan bi Astîyê re deng dike, jê re naman dişîne. Ji derdê dilan, Astî nexwaş dikeve, piştî demekê jî dimire, wek destana Leyla û Mecnûn ew kincên Leylayê li xwe dike û xwe reş girê dide. Paşê Ferx vedigere, berî ku bê cîhê mala bavê Astîyê, ew rastî şivanekî tê, ew şivan Şaxol bûye, şivanê ku Astî bédil girtine danê. Paşê Ferx ji vî şivanî fêr dibe ku, Astîyê can daye, çûye dilovanîya xwe. Destan, bi vê xebera tîrş û tal ve xelas dibe, êdî em pê nizanin çî tê serê Ferx? Piştî mirina Leylayê çawa Mecnûn jî dimire, sedî-sed dinya Ferx jî serobino dibe. Kes Astîyê nakuje, ew bi xwe can dide(7). Lê belê dema mirov rewşa Astî di nav de maye, mêze dike, wê çaxê mirov dibîne ku ew nemirîye, derdê dilan ew kuştîye, ew hatîye kuştinê. Ji ber ku berî nexwaş bikeve, can bide, ew bi xwe re şer dike, bi mercên dorberê xwe ve şer dike, berxwe dide, êdî dora wê ewqas teng dibe, dinya wê tarî dibe, tu rêke xelasîyê namîne, nikare ji êşa dilan bifilite. Ji ber vê yekê jî mirov nikare bêje Astî mirîye, bi rastî Astî hatîye kuştinê. Bi vê perspektîfê, bi vê nêrînê ve mirov rewşa ku jin di nav de nin, çêtir û baştir fam dike.

Tiştê herî balkêş, di nav vî şerê sêserî û dijwarîyên mezin de çawa em dibînin jinên Kurd dîsa jî bi ya xwe dikin, mirin jî tev hemû rîsk û telukeyan didin ber çavan, ji bo ku bigihêjin bext ûmirazên xwe, ew her rîyên xelasîyê diceribînin, bawerîya xwe wunda nakin, dilketîyê diwemîn, dê-bavê xwe, apên xwe û hemû hêzên mayîn yên ku li pêşberî dilşahîya wan dibin asteng, davêjin alîkî û bi rîya xwe de dimeşin. Ev babeta, di tekoşîna xelasîya jinan de wek gaveke giring dikare bê hesibîn. Di hemû destanên Kurdî de ev tekoşîna azadîyê, wek mesajên protestoyê û wek rûreşkirina erf-edetên kevn, li dijî hêzên feodal, hêzên zordar

bi rastî hêjayî peydanîyê ye. Di destanên Kurdî, di serpêhatîyên Kurdî de, beşeke problematîka xelasîya jinan jî, rev e, ne reva bi zorê, reva ji du dilan pêkhatî. Dema keç ji xelasîya xwe re rêkê nabîne, vê carê bi dilketîyê xwe re direve, bi gotineke mayîn hev direvînin, dema mirov li ser vê struktura xelasîyê difikire, mirov dibîne ku rev ji alîkî de protestokirina pêwendîyên nemirovî û paştamayî ye, kakilê tekoşîna xelasîya (emancipation) jinê ye, ji ber vê yekê jî her revek, di nav van mercan û rewşê de rîya xelasîya jinan fireh dike, rîya zewacên bêdil dixitimîne, zîhnîyetên paşverû dirizîne, diqelêşe û pûç dike. Her çiqas di dawîya revê de serêşîyên nûh (komplikation) peyda bibin jî, dîsa jî, di vî warî de gava here çêtir rev e, ji ber ku tu rêke mayîn namîne, dora cotan tê girtinê, çembera zordestîyê her diçe teng dibe, di çend serpêhatîyan de çawa em dibînin êdî roj, roja revê ye. Di serpêhatîya Hesênê Mûsa de rojên revê nêzîk dibin, nefreta li dijî bav her diçe zêde dibe:

"... Wele bi xwedê min didinê-min nadinê  
 Mîn nadinê ezê kincê xwe bişînim  
 Ser boyaxê reşkirinê,  
 Ezê mara mêra piştî çavê reş û belek,  
 Li xwe heram kim li darê dinê.  
 De hey wax, mala minê.  
 Sola torinê mala Mûsa qetîya ji çûyînê, ji hatinê.  
 Cilê mala bavê min qetîyan ji danînê, ji raxistinê,  
 Guhê dêka min qul kirin bi galgalê, bi gotinê. ..." (8).

Ev berxwedana vê keça bi navê Hedô, gaveke gelek radîkal dikare bê hesabîn. Hesên kesekî xerîb bûye, diçe gundê mala Qaso cîwar dibe û dilê wî dikeve keça wî Hedô, ji ber ku kesekî xizan û kesîb e, keçikê nadinê, paşê bi hevra direvin, çîrok her diçe dirêj dibe. Di her destan, her serpêhatîke Kurdî de nefreteke mezin li dijî zewacên bêdil heye, di stranekê de ev hêrs û rik dighêje xizemên poza, wan dilivînin, keç naxwaze wê bidin van kesên li mala wan berevbûyî, hatine xazgînî : Xazgînçîyê li mala bavê min rûniştî / Qelendê min digot, xelatê min dibirî / Xizemê bozê min mîna çerxa felekê li hev dizvirî (9). Dema mirov destana Memê Alan û Zîna Zêdan (Mem û Zîn) mêze dike, tiştê bala mirovan zêtir dikşîne ser xwe, bêguman pîrsa azadîya jinan e. Zîn, di vê destanê de nîşana azadîyê ye. Ev keça Kurd, ji bo ku bigihêje mirazê xwe, li dijî birayê xwe - mîrê Cizîra Botan, fend-fêl, dek-dolavên Bekoyê Ewan bi xurtî radiweste, van pêwendîyên nemirovî bi mirina xwe ve protesto dike. Ev serhildana keçekê li dijî mîrekî karekî ewqas piçûk û hêsa nîne. Dîsa jî ew bi ya xwe dike, ji bo evînê ker-gêj dibe, di dawîya destanê de çawa em dibînin, ew vê dinyayê protesto dike û jê bar dike, can dide.

Di destana Mem û Zîn de tişteki balkêş yê mayîn jî, dema Mem diçe dîtina

Zînê, dibe mêvanê hersê pismaman (Hesen, Çeko, Qeretaçîn), ev pismaman ewqas bînteng û aciz nabin, çawa tê zanîn Zîn dergistîya birayê piçûk, Çeko ye, ew sê sal in dergistî ne. Dema Mem qutîya dilê xwe vedike, qala Zînê dike, di vê malê de em rastî tu serhişkî, nerazîbûn, dexesî (kumreşî) û serhişkîkê nayên. Di vî beşê destanê de tolerans, nermayê û hevtêgîhiştineke bêhempa peyda dibe, serî şkandin, çav derxistin, poz jê kirin nayê bîra tu kesî, her tişt bi hemdî xwe dimeşe. Çeko jî tey, ev hersê biran naxwazin serêşîyên mezin peyda bibin (her çiqas Zîn dergistîya wî be jî). Ez bawer dikim, di dawîyê de Çeko jî têdighê, wekî dema Zîn yekî dinê dixwaze, wê çaxê tiştêkî mirov bike êdî nemaye, ew wusan difikire. Ji aliyê din ev hersê bira jî derheqa Mem de dighêjin bawerîkê: "...ji bo evînekê welatê xwe berdaya"(10). Ew xortê ku ji Yemenê(11) bi rê dikeve, dilezîne, hespê xwe bi çargava dajo, wekî zûtîrekê dilketîya bibîne, tempoya jîyînê di destanê de ji yekten bilind dike, naxwaze agirê evînekê vemire, dixwaze vî agirî bike agirekî herdemî di jîyîna keç- xortan de. Ji ber van rastîyan ev hersê bira jî, bi çavekî filozofîk hêjabûna evînekê dipîvin, dinirxînin, evînekê di ser her tiştî re dibînin. Ev hersê biran angorî van realîtan pêwendîyên xwe bi Mem ji nûh ve careke din berçav û serrast dikin. Ji aliyê din jina birayê mezin Hesen, ew jina bi navê Stî hemû îmkanan ji Mem re amade dike, Hesen, Mem dibe "hêla jinan", nasîya wî û jinan dide hev. Di destanê de rola Stîyê tim û tim qenc û pozîtîf e. Hesen û jina wî dixwazin ji hevevîniya van herdu dilketîyan re bibin alîkar, tu alternafeke mayîn nabînin. Di vê beşa destanê de hurmeteke mezin ji bo jinan peyda dibe. Dema Zîn biryara xwe diguhirîne -Çeko berdide, dilê wê dikeve Mem -ev biryara dijayetîkê di nav vê malbatê de peyda nake. Hemû ev yekan nîşan didin ku, gotin "gotina jinan" bûye.

Di destanên Kurdî de gelek caran em rastî rêça rûçik û sûretên civata dayîkbandûr (matriarkal)- civata ku bandûra dayîkan-jinan lê zêde ye- tên. Di çend destanan de serdestîya jinan zêtir e, ew.xwe nadin hincirandin, êşandin û zêrandinê. Ew di her wargê jîyînê de xwedî maf in, serbest in. Di destana Laz û Xezal de, em rastî civateke wusan tên ku li ser jinan tu zordestîke wusan berbiçav, nayên dîtin. Xanzad, piştî mirina bavê xwe dibe seroka eşîra Balekîya, hejmara malbatên vê eşîrê hezar û hefsed bûye, hemû rêvabirina karên eşîrê dikeve ser milên wê. Ev yeka jî nîşan dide ku di salên gelek kevn de serdestîke jinan hebûye. Di destana Laz û Xezal de vê carê strukturekî pêwendîyên cuda peyda dibe. Vê carê du keç (Xanzad û Xezal) dibin evîndarê Laz. Ji der pevçûna ser keçan, ve carê em rastî pevçûn an jî rekabeteke li ser xortan tên. Herdu keç jî bi aktîfî tevî vê rekabetê dibin, giranî û bandûra nîşan didin. Ji ber vê yekî jî, ev destana ji destanên Kurd yê mayîn parîkî cudatir e. Laz û Xanzad kurap û dotmamên hev in, nîşanîya wan dibe, piştî mirina bavên Laz û Xanzadê, rêvabirina karên malbatên eşîra wan dikeve ser milê Xanzadê (nîşanîya Laz). Ji ber ku Laz vê nêşanîya xwe ber dide, vê carê dibe evîndarê keçeke ji eşîreke mayîn, navê wê Xezal e. Dilê wan gelekî dikeve hev, nazewicin, lê bi hevra

radizên, bi hevra dimînin. Di navbera van herdu keçan de bivê- nevê dilsarfk peyda dibe, lê belê herdu jî heta mirina Laz pêwendiyên xwe, silavên xwe ji wî qut nakin. Ev herdû keç her çiqas ji hev sar bûne, diji hev in û naxwazin Laz ji destê xwe derxin jî, dîsa jî roja mirina Laz, di şîna wî de beşdar dibin, bi tevayî hildidin, dikine gora wî, paşê Xanzad lêdixe diçe nav eşîra xwe, Xezal li wir dimîne(12). Destana Laz û Xezal, ji alîkî de wek destana Ferx û Astî ye, di herdu destanan de dijayetîke sêserî heye. Di destana Ferx û Astî de struktura mêr-jin-mêr, di destana Laz û Xezal de struktura jin-mêr-jin ,pêwendî û bûyerên ku di van destanan de hene, di bin bandûra xwe de dihêlin, ji hev cihê dikin. Ji aliyê din di herdû destanan de evîndarîke romantîk heye, herdu destan wek stran, dilok û helbestan gelek lîrik in. Ji aliyê din, di salên kevn, di nav civata Kurd de ji bo ronîkirina cihê jinan, gelek hînkar û rênîşandar in.

## DIJMINÊN DU DILAN Û ÇAR ÇAVAN

Bêbextî, nokerî, xayîntî, dilreşî û fêlbazî wek element-motîfên negatîf di destanê Kurdî de gelek caran dibin sedemên bêmirazî û bedbextîyê. Di destana Mem û Zîn de, serpehatîya Bekoyê Şeytan, çawa me li jorê jî got, di jîyîna Mem û Zîn de dibe sedemê felaketeke mezin .Di destana Şor Mehmûd û Merzingan de, ev herdu dilketî jî dibin gorîyê dek-dolab û fend-fêlan. Angorî destanê Şor Mehmûd û Merzingan di zaroktîya xwe de dest pê dikin hev hez dikin, bi hev re mezin dibin û di dawîyê de dizewicin. Şor Mehmûd dibe kesekî gelekî jîr û mêrxas. Apê wî Mamereş mêze dike, Şor Mehmûd hêdî hêdî dibe telukekê ji bo wî. Ew ditirse, wekî rojekê şor Mehmûd serkarîya êla wî têxe destê xwe û wî bêrûmet bihêle. Demek tê Şor Mehmûd dixwaze dergistîya xwe Merzinganê hilde here. Ap naxwaze Merzinganê bidê. Gelek difikire, di dawîyê de dibêjê, eger tu herî şer zora dijminê min bibî, bi serfiraz vegeerî ezê Merzinganê bidime te. Dema Şor Mehmûd ji şer bi serfirazî vedigere tê, piştî çendekî dema ew ji xwe re diçe nêçîrê, Memereş ji vê herêmê mala xwe bar dike diçe, welatekî mayîn, Merzinganê jî dibe, destê evîndaran ji hev diqetîne. Di rê de Merzingan bi dizî diçe li ser pirekê, ji kendalekî de xwe davêje nav gêjavê dixeniqe, berî ku xwe bavêje ew bi pirevan re deng dike, wekî eger yek bipirse bira bêje Merzinganê xwe avîte nav gêjavê. Paşê Şor Mehmûd tê wekî Merzinganê xelas bike, ew jî xwe davêje nav avê, avjenî nikaribûye bike, di dawîyê de ew jî dixeniqe. Dema bavê wê pê dihise tê li dor avê ji pirevan dipirse, wî Merzingan dîtîye an na? Pirevan vê bersîva jêrîn dide:

"Birao, derdê min giran e,  
Nizanim li kê bikim nifirane,



Qîza tu dibêjî navê wê,  
 Merzingan e,  
 Rawesta bû li ber van qiraxane,  
 Nifir dikirin li dayîk û bavane,  
 Ji derdê evîndarîyê xwe avîte nav pêlên van avane,  
 Ji ber wê Şor Mehmûd jî xwe avîte nav gêjavane,  
 Niha gora wan bûye zikê masîyane" (13).

Heft xarziyê Memereş hebûne gelek mêrxas û cengawer bûne, gelek Şor Mehmûd hez dikirin. Dema ew dibîsin ev bela mezin hatiye serê Şor Mehmûd û Merzinganê, hespên xwe siwar dibin, diçin bi pêşîra Memereş digrin, bi şûr û xenceran wî parçe parçe dikin. Paşê diçin cenazê wan ji nav avê derdixin, mêze dikin ev herdu dilketî di paşla hevda, hev hemêz kirine. Ji wan re dewateke bi nav û deng çê dikin, dibêjin ew li vê dinyê dilşa nebûn, qet nebe bira li dinya dinê bi hev şa bin. Çawa tê xuyan, ev destana Kurdî ji alîkî de wek destana Mem û Zîn di dawîyê de dibe destaneke bêmirazan. Di destanê de xayîntî û bêbextî tê protesto kirin, li dijî nepakî, neqencîyê dengên gelek xurt hene. Bi taybetî xwe xeniqandina Merzinganê di vî warî de wek protestoke mezin dikare bê hesibîn. Di destanê de dinênasîya kesên wek Memereş yên xayîn tê rûreş kirin.

## MOTÎFÊN JINÊN ÇÎROKÎ

Di destana Memê Alan û Zîna Zêdan û çend destanên mayîn ji der mêrxasên mirovî, em çend mêrxasên wek cin, perî û kesên nexuyanbar jî dibînin, ew dikevîne dilqê (rol) jinan, di destanan de roleke alîkarî û piştevanîyê dilîzin, wek pîrhevoka bi tirs û xof nîn in. Ev mêrxasên çîrokî, ji pêwendîyên dilketîyan re gelek caran dibin alîkar, nasîya wan didin hev, bi taybetî van dilketîyan dixin xewnên hev. Di destana Mem û Zîn de navên sê keçikên padîşahê perîyan derbas dibe: Tavbano, Hîvbano, Stêrbano. Ev keçên dilsoz û evînpîrêz biryar digrin ku bifirin herin Cizîra Botan, ew diçin dikevin oda Zînê, wê hildidin tînin dixin xewna Memê. Piştî vê bûyerê Memê, li ser Zînê dibe evîndar û ker-gêj dibe. Çawa di destanê de tê xuyan, ev hersê keçê perîyan guneyên van herdû keç-xortan (Mem û Zîn) hildidin li ser stûyê xwe. Di destana Sêva Hecî de jî, em rastî çend keçên wek van perîyan tînin, di şaxeke vê destanê de navê yekê Gulçiçeka Dilan(14), di şaxeke mayîn de navê wê Pîra Mîraza(15) û di şaxeke mayîn de jî Qîza Qenc(16) derbas dibe. Gulçiçeka Dilan, diçe Mîr Mehmûdê Cindî tîne, dixin oda Sêva Hecî, wan bi hev dide nasîn. Ev perîyên jinîn (femînîn), di çend destanên mayîn de jî çawa em dibînin enînivîs, bext û mirazê keç û xortan tayîn dikin, evîn, merhamet û alîkarîyê li ser mirovan de dibarînin. Ji der van perîyan,

di çend destanên mayîn de, em rastî çend motîfên wek pîr û pîrejînan jî tîn ku mirazan dighînin hev, di pêwendî û kontaktên navbera jin-mêran de roleke aktîf dilîzin, gelek risk û telukayan jî didin ber çavan, xwe davêjin nav êgir, di navbera dilketîyan de, ji ber ku zêde şik naçe li ser wan, xeberan dibin- tînin û dibin çavkanîyên îstîfbaratê. Ji bo ku salên wan bihurîne, tecrubeyên wan yên jîyîne zêde ne, di van destanan de gelek caran keç û xort xwe davêjin pêsîra wan û alîkarîyê ji wan hevî dikin û bawerîya xwe jî, bi wan tînin. Di destana Mahir û Wefa de, dema Wefa diçe hawarîya dilketîyê xwe-Mahîr, ew tê girtin, wê bi darê zorê direvînin, di rê de ew rastî pîrejînekê tê, hal-hewalê xwe jê re dibêje, ev pîrejîna van gotinan paşê dibe dighîne Mahir (17). Di destana Rustemê Zal de, Rustemê Zal berî ku bavêje ser dijminên xwe, cara pêşîn dibe mêvanê van pîrejînan. Bi kurtî di destanên Kurdî de ev figurên jinînan yên ku di beşeke van destanan de derdikevin pêşberî me, di warê pêkhatina kontaktên giring de cîhekî yekemîn digrin û rolên aktîf dilîzin.

## JIN DI RÊKE RAST DE DIMEŞIN

Di destanên Kurdî de dîrdîtîniya jinan, çawa di van berheman de dîyar dibe, gelek tûj e. Ji ber vê yekê jî, ew di rêke rast de dimeşin. Piştî destana Memê Alan û Zîna Zêdan destana ku di nav Kurdan de zêtir belav bûye, destana Sîyabend û Xecê ye. Destan, li ser evîna Sîyabendê Silivî û Xeca Resûl ava dibe. Wek gelek destanên mayîn, di vê destanê de jî Sîyabend û Xecê nagihêjin mirazê xwe. Lê belê ew evîna ku di vê destanê de pêl-pêl mezin dibe, hemû dijwarî, xirabî û tiştên neçê di bin sîya xwe de dihêle, wan difetisîne, bêrûmet dike. Dema mirov vê destanê baş analîz dike, mirov têdighê ku mîrxasa jinînan- Xecê pêşerojê angorî Sîyabend baştir dibîne û gavên xwe bi pîvan davêje. Di beşeke vê destanê de Xecê xewnekê dibîne û dikene, vê xewna xwe ji Sîyabend re şirove dike, Sîyabend bêsebeb, vê xewnê şaş fam dike, pey wan pezkuvîyên ku Xecê di xewna xwe de dîtine, dikeve. Ken û gotinên Xecê şaş fam dike, hildide li ser xwe, diltenikîya xwe zû eşkere dike, vî kenî bi keçelîya xwe re girê dide. Ji nav wan duwanzdeh pezkuvîyan yekî digre dîkuje, pezkuvî jî lêdixê wî ji kendalekî de davêje, dîkuje. Paşê navê wî dibe: nêçîrvanê ku ji aliyê nêçîra xwe de tê kuştinê”. Ev beşa dawîn ya destanê, mesaja destanê gelek bi vekirî radixe ber çavan, Sîyabend xeletîya xwe, bi zimanê xwe eşkere dike : ”Çawa min ji hev qetandîye destê nêrî û bizinê / ewî usa ji hev qetandîye destê mêr û jinê ”(18). Dema Sîyabend dixwaze nêrî bigre, wê demê nêrî û bizin li bal hev bûne, zirareke wan negihîştîye tu kesî. Ev serhişkîya Sîyabend ji ku tê? Çawa em ji despêka destanê de fêr dibin, zaroktîya wî qet baş derbas nebûye, bêdê û bêbav mezin bûye, di zaroktîya xwe de kesekî şerût bûye, bi dorberê xwe, bi hevalên xwe re zêde bi hev nekirîye, wek mîsal rîya jina gavanê gund digre... Ji aliyê din ew keçel-gurî bûye, bêguman wî ev yeka wek kêmasîkê di xwe de dîtîye û

xwastîye vê kêmasîyê bi tehrekî mayîn, bi rêke din tijî bike. Bi çi tehrî? Sîyabend çawa em dibînin dibe kesekî problematik, ev şahsîyeta wî ya parçekirî di dawîyê de dibe bayisê mirina wî û mirina Xecê jî. Xecê naxwaze wekî Sîyabend here wî pezkuvîyî bikuje, gunê wê bi van pezkuvîyan tê, lê belê Sîyabend li wê guhdar nake, bi ya xwe dike. Ev serhişkîya Sîyabend, di destana Ker û Kulik de serhişkîya van herdu birayan tîne bîra mirovan. Di vê destanê de dîya van herdu kuran naxwaze wekî kurê wê herin bi herheft birayên wê re şer bikin, lê belê ew gotinên dîya xwe guhdar nakin, diçine şer. Çawa tê zanîn di dawîya destanê de Kulik tê kuştin, gotinên dîya wan Werdekê rast derdikevin. Dûrdîtîni, rastzanîn û famdarîya Werdekê wek Xecê vê yekê nîşanî me didin wekî di destanên Kurdî de jinên Kurd hertim bi ser dikevin, di rêke rast de dimeşin, rênîşandar in, bi şîretên xwe ve pêşengîya mêrxasên van destanan yên mêrîn dikin. Ji aliyê din, hem di destana Sîyabend û Xecê de, hem jî di destana Ker û Kulik de zordestîke mîrên Ereban jî heye. Xecê berî ku bi Sîyabend re bireve, çawa tê zanîn dergistîya kurê mîrê Ereban bû. Ker û Kulik jî, bona herin hespekî bi navê Bêcan jê re bînin, ji aliyê mîrên Ereba de tîne seferber kirin, mîrên Ereban van herdu xortan li ser xalên wan de dişînin wekî bi xalan re bikevin şer. Lê belê Ker naxwaze dîya wî tenê bêxweyî bimîne, ji ber vê yekê jî kuştina heft xalên xwe nafikire, wê çaxê dîya wî dikare têkeve destê mîrê Ereban. Angorî Kulik, Ker çêtir difikire û gavên xwe bi pîvan davêje. Di dawîya destanê de, çawa em dibînin Kulik tê kuştin, keça mîrê Ereban, Têlî Rewşen Xatûn para Ker dikeve.

Di destpêka destana Ker û Kulik de, dema bavê Werdekê naxwaze keça xwe bide Silêman, Silêman Werdekê direvine. Bav pey keça xwe dikeve, Werdek kevîrekî hildide li bavê dixwe, dikeve (19). Ev yeka jî nîşanî me dide ku, dema keça Kurd dil kir, dilketîyê xwe û mirazê xwe ji ser her tiştî re digre, xwe davêje nav agirên mezin, dikarin li dijî biryarên dê-bavê xwe jî derkevin, di vî warî de gelek serhişk in û gelek caran ber xwe didin. Di çend destanên mayîn de jî, çawa em dibînin li dijî dê-bavên neheq muhalefeteke mezin heye. Ev dê-bavên neheq neyên kuştin jî, nifirên mezin li wan tîne kirin, ev nifiran angorî çend destanan tîne cîh jî. Di destana Ferx û Astî de, Ferx nifirên mezin li dê û bavê xwe dike, di nav heftekî de hem dê, hem jî bavê wî dimire (20). Bi saya motîfa nifiran, mirov fam dike ku, kî dibe bira bibe, pêwîst e kes nekeve orta du dilan û çar çavan. Ev bawerî di destanên Kurdî de gelek xurt e. Çima piraniya nifiran ji devê jinan, bi taybetî ji devê dayîkan derdikevin û ev nifiran tîne cîh? Bersîva vê pirsê diçe dighêje mezinbûna neheqîya li jinan tê kirin. Jin hêrs, nefret û rîka xwe di pratîk de nîn be jî, bi zar-ziman (verbal) dîyar dikin, realîteke jîyîne îfade nekin jî, wek realîteke zimani, gelek caran rastî, realîteyên jîyîne jî tîne, dibin bûyer. Ji ber ku kesên xirabîyê dikin, di pêşerojê de çi wê bê serê wan, mirov kêmhindik, sedî sed nîn be jî, jê derdixe. Jin bi vê bawerîyê ve nifiran dikin. Ji ber tecrubeyên jîyîne, jin dighêjin aqilmendîke mezin û tenik.

Di vê babetê de serpêhatîke here balkêş jî, serpêhatîya Filîtê Quto ye. Angorî vê serpêhatîyê li welatê Mamê Etmanîk xela hebûye, wan nikaribûne debar-abûra xwe bikin. Ew ji eşîra Reşkota bûye. Karvanê xwe amade dike, diçe bajarê Batmanê wekî aborî û debara zarokên xwe bike. Lê belê ev navça di bin kontrola Filîtê Quto de bûye, bac û bertîl ji karvanê dihatine vê navçê distend, rêbirekî nav û deng bûye. Dema dibhîse ku Mamê Etmanîk hatîye hêla Batmanê, mirovên xwe berev dike, diçe ser wî, şerekî mezin di nav wan de dest pê dike. Di dawîya vî şerî de hem Filîtê Quto, hem jî Mamê Etmanîk tên kuştinê. Piranîya stranên ku li ser Filîtê Quto hatine gotin, ji devê dîya wî Şemê derketine, ev jinik, kurê xwe neheq dibîne, piştî kurê nake, kirinên wî cîh de nabîne, her çiqas kurê wê nûn be jî, ew piştî Mamê Etmanîk digre. Filîtê Quto guh nade şîret û gazîyên dîya xwe, di dawîyê de tê kuştin û dîya wî dilorîne: "Filîto lao, were neçe pêşîya vî kervanî!...(21). Ji alîyê din ev dayîka Kurd ji vî şerê xwexwetîyê jî nerazî ye, ew zane ku ev şerên neheq tenê kêfa hêzên dijmin, hêzên neyar û dewletê tîne : "...Bitîsê dergevana derge vekir /Donzde beyraqê Alî-Osman şede, îspat, şerê Filîtê Quto, Memê Etmê temaşê kir" (22).

## JI BO MÊRAN DANÎNA ÇEND MERC Û HOYAN

Di destanên Kurdî de dema kesek daxwazîya zewacê dike, ji alîyê jinê de çawa em dibînin hin merc û hoy tîne pêşkêş kirin, pêwîst e mêr zîrekî û jîrîfîkê nîşan bide, ew pêwîst in ya herin li ser dijmin an jî karekî mezin biqedînin. Eger ew di van seferan de bi ser nekevin, ji wan re îmkana keçdayînê namîne. Çima ev dijwarî û zehmetî tîne pêkanîn? Bersîva vê pirsê mirov dikare bi sê tehrî şiro veke: a) Bi pêkanîna mucîzeyan ve destan tempoke bilind bi dest dixê b) bi van pêşdanînan ve jin, dê-bav dixwazin dilketîyên xwe, zavayên xwe nûn jî biceribînin, başbûn û qencîya wan bi çavên xwe bibînin c) Di hin karên pratîk de ji van dilketîyên nûn îstîfade bikin. Di destana Ker û Kulik de, ji bo keça mîrê Eraban ji xwe re bixwazin, ew pêwîst in, herin hespekî navdar ji nav eşîreke mayîn birevînin bînin. Dîya wan Werdek jî, dema dixwaze namekê bi rê bike, diçe bal sofîkî, bi wî re tu dibêjî peymanekê girê dide, dibêje wî eger tu vê namê bibî bighîmî xwedanê wê, ezê bi te re mêr kim (23). Di destana Sêva Hecî de, ew kesê dilê wî ketîye Sêva Hecî pêwîst e here cîhekî qeytana Memûdî (di şaxeke vê destanê de qeytana Hemedanê tê nav kirin) bîne wekî ji bavê wê yê kor re bibe derman, êdî Sêva Hecî ya wî (24). Di destana Nasir û Malmal de, vê carê em rastî hoy û mercên mayîn tîne, herdu keç (Taurezî û Esmer) dixwazin wekî ev herdu xort (Nasir û Malmal) herin Bexdayê çend sala bimînin, bibin kesên mezin, paşê bi wan re bizewicin. Berî ku ew bi rêkevin, ev herçar keç û xort di nav xwe de sond dixwin (25). Di destana Şor Mehmûd û Merzingan de jî, bavê Merzinganê ji Şor Mehmûd tiştêkî mayîn hêvî dike, eger ew here

dijminê wî bindest bike, ewê keça xwe Merziganê bide Şor Mehmûd... Wek van mîsalan gelek merc û hoyên mayîn jî di destanan de tîn pêşkêş kirin. Bi kurtî mirov dikare bêje pêkhatin û bicîhanîna van merc û hoyan cîhê qelend (next) digre. Hemû ev merc û hoyan bi çi nîyetê hatine gotin? Ji devê kê derketine? angorî vê jî, dema mêr karên xwe diqedînin tîn, ew vê carê dikarin rastî çend dijarîyên mayîn jî bînin, vê carê serêşîyên nûn di destanan de peyda dibin, hertim, her tişt bi hemdî xwe nameşe.

## ÇIMA MÊR DIKEVIN ROLA ŞIVANAN?

Di destanên Kurdî de çawa em dibînin stûnên van berhemana yê here xurt ji aliyê jinan de hatine dayîn. Jin mêrkirinên bêdil û reva zorê tu wext qebûl nakin, sal derbas bin jî, ew nedilşa ne, dîsa jî li rîya xelasîyê digerin, timê bendewarê avakirina jîyîneke nûn in. Di destana Binefşa Narîn û Cembelîyê Hekkarê de ev realîta gelek eşkere ye. Binefş, ji aliyê Derwêş Axa de bi destê zorê tê revandin. Ji ber ku birayên Binefşê li dijî vê zewaca bêdil derdikevin ew tîn kuştin. Derwêş Axa kesekî zordar û kal e, tî gotin ku ew nod salî ye. Binefş mirinê ji mal, milkê dinyayê çêtir dibîne. Ji ber ku Binefş ewqas zêde ji Cembelîyê Hekkarê hez dike, navê kurê xwe yê Derwêş Axa bûyî jî, datîne Cembelî, Cembelîyê piçûk, ev nav bêguman nîşana evîna Cembelîyê mezin e. Cembelîyê Hekkarê dikeve dilqê şivanan, kulavê şivanan li xwe dike, wekî here bibe şivanê Derwêş Axa, bi dilketîya xwe re deng bike, wê bibîne û birevîne. Di dawîya destanê de bi xwe wusan dibe, ew bi hevra direvin, bi vê kirina xwe ve Binefşa Narîn zewacên bêdil protesto dike û dighêje mirazê xwe. Di destana Binefşa Narîn û Cembelîyê Hekkarê de çawa me li jorê jî got, dema Cembelîyê Hekkarê dixwaze here Binefşa Narîn bibîne, dikeve dilqê şivanan. Di çend destanên mayîn de jî em rastî vê motifê tînin. Çima şivan, ne pêşekî din? Ji ber ku di nav Kurdan, di jîyîna rojane de kesê ku zêtir kontak û pêwendîyên wî bi jinan re hene şivan in, bi taybetî danê nîvro û berbi êvarê dema pez tê bêrîyê, kesê serê pêz digre şivan e, bi bêrîvanan re kontaktên wan yê dîrek hene, mesafa di navbera wan de gelek hindik e, îmkana hevduhatinê, bi hevra xerabîyanê gelek zêde ye, ji aliyê din zêde şikê jî nabin li ser xwe, ji ber ku ev karê pezdotinê ji du kesan pêk tê (şivan û bêrîvan) kesê ku pêz dajo bêrîyê, gelek caran zarok in an jî pez bi xwe du hev rêz dibe, dikeve dorê. Di destana Qer û Gulîzerê de, Qer dibe wafîyê Sonduzê, dilê wî dikeve keçeke bi navê Gulîzer, dema mêze dike bav keça xwe nadê, ew dibe şivanê mala bavê Gulîzerê (26). Berî ku Cembelîyê Hekkarê xwe bighîne dilketîya xwe ew di rê de rastî kesên mayîn jî tê. Carekê dilê keça şêxekî Ereban dikeve Cembelî. Navê vê keçikê Wedîha bûye (27). Wedîhe bi dilekî na hezar dilî dibe evîndarê Cembelî. Ji bo ku ew û Cembelî timê

hev bibînin, hev şa bin, ew rêkê difikire, diçe bal bavê xwe wekî Cembelî hilde ser karekî, di mala wan de bimîne. Lê belê Cembelî ji vê yekê re razî nabe, çî dike nake ji destê vê jinikê nafilite. Demekê bi hevra dimînin, şevêkê Cembelî bi dizîka ve ji mala vê keçikê direve, tevî tariya şevê dibe, pey rêça mala bavê Binefşa Narîn dikeve. Ev serpêhatîya di vê destanê de wek beşeke bingehîn cîh nagire, wek bûyereke duwemîn dikare bê hesibîn. Lê belê ev beşa destanê tişteki nîşanî vê keça şêxê Ereban dike, wekî bi zorê du dil nabine yek, bi hevdudîtineke derbazok û tesadûfî mirov nikare dilşa bibe. Ev beşa destanê, bûyerên ku di destana Zembîlfiroş de derbas dibin tîne bîra mirovan û wek hev in. Ji bo kêfa xwe, ev keça Ereban û ew Xatûna ku navê wê di destana Zembîlfiroş de derbas dibe, jinên dewlemend, aristokrat û xortxapînok in. Dorberên ku tê de mezin bûne, dorberên bajarî ne, gelek bi serbestî dijîn.

## SÎNORÊN NAMÛS Û BÊNAMÛSÎYÊ

Destaneke ku di nav Kurdan de gelek belav bûye jî, destana Zembîlfiroş e. Zembîlfiroş debara xwe tenê bi firotina zembîlan (sêlik) ve pêk tîne, kesekî belengaz û kesîb e. Ew tax-tax, kuçe-kuçe digere, zembîlan difroşe. Kesekî çeleng, spehî û xweşik bûye. Angorî şaxeke vê destanê Zembîlfiroş berê mîrêk bûye, dewlemend bûye, paşê jîyîneke sade ji xwe re hilbijartîye û xizan ketîye. Rojekê tê li bajarê Silvanê cîwar dibe, li vira ji xwe re zembîlan difroşe (28). Ji ber çelengbûn, bejn-bala wî, rojekê dema ew dîsa kuçe-kuçe digere, rastî jina mîrê bajêr tê, dilê vê jinikê dikeve Zembîlfiroş û pêşîra wî ber nade. Zembîlfiroş bi xwe jî kesekî xwedî jin û zarok e, çavê wî ji jinên kesî tune ye, kesekî serbilind, xwedî nefis e. Jina mîr çî dike nake, nikare wî ji rê derxe, bi wî şa be, rojên xweş bi hevra derbas bikin. Çawa em ji naveroka destanê û gotinên jina mîr fam dikin, ew mîrê xwe davêje alîkî, dixwaze Zembîlfiroş kaşî nav cînivînên xwe bike. Her çiqas ew bi gotinên xwe yê şewetî ve dinya Zembîlfiroş sero-bino dike, dîsa jî Zembîlfiroş li ber xwe dide, nêzikê wê nabe, li zarokên xwe difikire. Dilpaqijî, helalî û namûs, çawa em dibînin kakilê felsefeya jîyîna Zembîlfiroş pêk tînin. Di dawîya destana Zembîlfiroş de çî tê serê Zembîlfiroş û Xatûnê? Bersîva vê پرسê angorî çaxên vê destanê ji hev gelek cuda ne: a) Dema Xatûn pey Zembîlfiroş dikeve diçe mala wî, çawa em dibînin Xatûn jina Zembîlfiroş dixapîne, dikeve nav cîhê mîrê wê, lempê vedimirîne, Zembîlfiroş dema tê dikeve nav cîhê xwe wekî razê, Xatûn ji bîr dike xirxalê lingê derxe, Zembîlfiroş wê çaxê fam dike ku ew ne jina wî ye, ew Xatûn e, Zembîlfiroş dibe teyrekî ji kulekê re difire diçe. Xatûn heft sal li pey wî digere, li serê çiyakî rastî şopa wî tê, dibine xuşk û bira, piştî çendekî, Xatûn dimre (29). b) Li ser kanîkê rastî hev tî, Xatûn dixwaze Zembîlfiroş ramûse, dema Xatûn zimanê xwe dixê devê Zembîlfiroş herdû jî dimrin (30). c) Agir ji devê Xatûnê derdikeve, herdu

jî dişewitin (31). ç) Diçin cennetê, digihêjin mirazê xwe (32). d) Mîr dema pê dihesa wekî jina wî çûye li bal Zembîlfiroş, lêdixe Zembîlfiroş dikuje (33). e) Zembîlfiroş xwe ji qesrê de davêje perçe-perçe dibe (34). f) Dema mîr dixwaze Zembîlfiroş bikuje, Xatûn dikeve navberê, kêrê ji destê mîr digre, zikê mîr re dike, ew tê kuştin. Paşê Xatûn, Zembîlfiroş û jin-zarê wî bi tevayî diçin, cîhekî wusan dengê axa û mîran li wir nayê (35). g) Jina Zembîlfiroş û Xatûn dibine hêwîyên hev, wek jina mezin û jina piçûk bi hevra dijîn (36). h) Zembîlfiroş û Xatûn di nav xwe de peymaneke gîrê didin wekî dest ji pêşîra hev berdin. Paşê Zembîlfiroş ji ber daxwazîya bavê, diçe bajarê Dîyarbekirê dibe mîr(37). Ev çaxa dawîn, ne şaxeke folklorîk e, wek şaxeke edebî ji aliyê Mirad-Xanê Beyazidî de hatîye nivîsîn. Çawa tê dîtin heta mirinê, li dinya mayîn jî Xatûn li pey Zembîlfiroş dikeve, pêşîra wî bernade. Di çend şaxên destanê de çawa tê xuyan, Zembîlfiroş her çiqas ji ber Xatûnê direve jî, wusan tê xuyanê bi kêmanî dibin xuşk-bira. Ji aliyê din dema em zordestîya mêrê Xatûnê didin ber çavan, ew dibînin ku hevkarîk û dostanetîk di navbera Zembîlfiroş û Xatûnê de li dijî mîr peyda dibe, Zembîlfiroş û Xatûnê nêzîkî hev dike. Ji aliyê din ji ber xizanî û belengazîyê, jina Zembîlfiroş jî, li dijî Xatûnê stûxwar e. Ev yeka jî wek faktorekê, pêwendîyên Zembîlfiroş, jina wî û Xatûnê ji dijmintayê diparêze û wan di xalêkê de dighîne hev, dijayetîya van hersê kesan kêmtir dike. Bêguman hemû ev bawerîyan mesaja destanê yên li ser helalîyê û dilpaqijîyê ava dibin, nahejîne, ji ber ku di destanê de ev motifan gelek xurt in. Lê belê hevbandûrîya bûyeran bivê-nevê çend dijarîyan ji bo Zembîlfiroş peyda dike wek hebûna du jinan û newekhevdîtina Xatûn û mêrê wê...Li dijî mêrê Xatûnê muhalefetek peyda dibe, wê çaxê Xatûn wek dijmîneke yekemîn nayê hesibîn. Di herdu şaxên dawîn de çawa em dibînin Zembîlfiroş jî êdî hatîye guhartin. Destana Zembîlfiroş ji alîkî de destana Ûsif û Zelêxe tîna bîra mirovan, Xatûna ku di navê wê di destana Zembîlfiroş de derbas dibe, gelekî li Zelêxê çûye, dirûvê wê lê dikeve, wek hev in. Zelêxe jî wek Xatûnê jina mîrekî ye, mîrê Misirê. Dema Ûsif, kurê Aqûb pêxember dibin Misirê, dilê Zelêxê gelekî dikeve Ûsif. Di şaxên Ûsif û Zelêxê yên folklorî de, çawa em dibînin ku dema Zelêxe Ûsif ji xwe re dikire, dibe, Ûsif rîya revê digere, lê belê ji destê vê jînekê xelas nabe (38). Zelêxe tîne vê carê Ûsif şikyatî mêrê xwe dike, mêr jî tîne wî dike zîndanê. Ev destana di nav Kurdan de gelek belav bûye, gelek şaxên wê yên edebî û folklorîk hene. Destaneke ku di naveroka wê de babeta namûsê cîhekî bingehîn digre, destana Mem û Eysê ye. Kurekî pîrejînekê heye, navê wî Memê ye, dîya wî kurê xwe dizewicîne, navê bûka wê jî Eysê ye. Piştî demekê Memê dibine leşkerîyê, heft salan li leşkerîyê dimîne, çavê vê dayîkê timê li rê ye, li bûka xwe xweyî derdikeve. Ji ber ku bi salan ev mala bêmêr e, berpîrsîyarîya mezin dikeve li stûyê vê pîrejîne, ew li ber mala kurê xwe dimîne, cîhê wî digre. Piştî vê leşkerîya dûr û dirêj, êdî çavê wê li rênêrîne diqerime. Rojekê destûra Memê derdikeve, nivê şevê lêdixe tê mala xwe, ew û dergistîya xwe dikevîne nav nivînan, ew dîya xwe hişyar nake. Dîya wî mêze dike, di oda Eysê de dengê

mêran tê, dinya vê dayîkê tevlihev dibe, nizane ku kurê wê ye, leşkerîyê hatîye. Yekten sero-bino dibe, bi nezanî lê dixê kurê xwe dikuje (39). Hem di destanên Zembîlfiros û hem jî di destana Mem-Eyşê de her çiqas bûyerên kuştin û mirinê peyda dibin, lê belê ji bo namûsa xwe biparêzin, yek jina xwe difikire, ya din jî kurê xwe difikire, naxwazin navê wan xirab derkeve, mirinê ji vê yekê çêtir dibînin. Herdu destan jî, li ser hîm-bingehên namûsê ava dibin. Di salên kevn de ji ber dirêjbûna leşkerîyê, çawa em dibînin ev salên dirêj bûne sedemên parçebûna gelek malbatan, jin-mêr, keç- xortên nûhzewicî bi salan ji hev dûr mane. Her çiqas dayîka Memê kurê xwe ji bîr nekirebe jî, ev dayîka bi salan hêvîya hatina kurê xwe maye, ji alîkî de ker-gêş bûye, mirov dikare bêje wekî ew ji bîr kirîye, hatina kurê wê ji bo bûye mucîzekê, ev mucîze çawa em dibînin li bal vê pîrejînê nebawerîk peyda kirîye, wê bawer nekirîye rojekê kurê wê û bûka wê bibin yek, têkevin nav nivînan, di hişê wê de hertim îmajê bûkeke tenêmayî cîwar bûye, ev tabloya nûh ji hişê xwe re derbas nekirîye.

## NEFRETA KONTRA-MÎLÎTER

Çawa em dibînin gelek malbatên Kurd ji ber leşkerîyê, timê rojên tirş û tal derbas kirine. Ji ber vê yekê jî di folklorê Kurdî de element û motîfên kontra-mîlîter cîhekî bingehîn digrin. Li welatên biyanî, li welatên dûr, kirina leşkerîyê ji bo her Kurdekî wek cezakî giran hatîye dîtin. Destaneke ku tê de li dijî hêzên mîlîter protestoke mezin heye, destana Menşê Elîyê Sêlim -Axa ye. Kîkî paşa, paşayê dewletê dixwaze keçeke çardeh salî (Menşê) ji xwe re wek jin bîne. Lê belê dema keçik û heft birayê wê vê yekê qebûl nakin, ev paşa heft birayê Menşê bi darê zorê dixê girtîgeha Dîyarbekirê. Heta Menşê nedine wî, ew biryar digre ku van heft birayan di girtîgehê de girtî bihêle, wek lîstikekê, entrîka û santajekê girtina van heft biran li dijî Menşê bi kar tîne. Di destanê de çawa em dibînin Menşê stûyê xwe li dijî vê zordestîyê xar nake, ji bo birayên xwe azad bike, ew dikeve ser rê diçe xelasîya wan. Di dawîyê de ser dikeve, birayên vê Keça Merdînî tîne berdanê (40). Serpêhatîya Menşê serpêhatîya Saliho tîne bîra mirovan, çawa Menşê dixwaze heft birayên xwe ji zîndanê derxe azad bike, Gulê jî dixwaze dilketîyê xwe Saliho xelas bike, dilketîyê wê jî wek heft birayên Menşê di girtîgeha Dîyarbekirê de hatîye girtin. Salih hejdeh salî ye, sed sal ceza danê. Nûrê, gelek ber xwe dide wekî Salihê wê bê berdanê, gazî Reîsê Cumhurîyetê Kemal Paşa ûpêxemberan dike, ji ber dergehê kela Dîyarbekirê dûr nakeve, heta ku Salih bê berdanê:

"... Nurê divê : Saliho pizmamo, bejna min zirave,  
Têlek ji tîla vê rihanê,  
Hêşîn dike ser xopana Dîyarbekir,  
Pêşberî hepîsxanê. ..." (41).



Jinên Kurd di şerê li dijî hêzên dewletê û hevalbendên dewletê de timê li bal mêrên xwe, lawên xwe cîh girtine, bi mêran ve tevayî li dijî neheqî, zordestî û li dijî êrîşên dewletê şer kirine. Di serpêhatîya Bişarê Çeto de, Gozê, çawa em dibînin li bal kurê xwe cîh digre, li dijî Bişarê Çeto derdikeve, ji wan çend kesan dikujin. Wek tê zanîn Bişarê Çeto hêzên dewletê yên leşkerî hildide bal xwe li dijî Emê Gozê şer dike. Hevkarîya Bişarê Çeto bi dewletê re wusan pêsta diçe, ew dibe êrîşkarekî navdar. Emê Gozê bi mêrxasî û bi dilsozîya xwe ve tê nas kirin. Bi kurtî ev serpêhatîya wek destanekê bûye nîşana şerê pakî-nepakîyê, heqî-neheqîyê, qencî-xirabîyê. Gozê, di vî şerî de timê qencîyê dixwaze. Dema Gozê li dijî hêzên dewletê kurê xwe diparêze, ew nefer, leşker û serokên wan yên zabî ji hev cuda dike, gunê wê bi van neferan tê, paşê şîretan kurê xwe dike û gazî wî dike: "...Çavê malîya wan li rîya wan e" (42). Di cîhekî mayîn de jî awa dibêje: "De nekuje nefera, nefer kurê xelqê ne, nanxurê dewletê ne" (43). Ev mirovhezîya Gozê, wek dilpaqijîkê dibe kakilê dinênasîke gelek pêşketî. Destana ku tê de zordestî, hovîtî û lêdanên li ser jinê zêtir dibin, destana Mahîr û Wefa ye. Hêzên leşkerî di vê destanê de bi darê zorê şahsîyeta wê keça bi navê Wefa pêpes dikin, vê keçikê wek dîl (hêsîr) digrin. Angorî destanê, kurekî patîşahê Muxirzemîn hebûye, navê wî Mahîr bûye, dilê wî dikeve keça berdestîyê patîşah, navê wê Wefa bûye. Ew bi hevra diçin dibistanê, di navbera wan de evîna dil roj bi roj zêtir dibe. Rojekê patîşah kurê xwe Mahîr dike serleşker wî dişîne Hîcazê wekî tevî şer be. Mahîr û Wefa bi alîkarîya mamosteyê xwe bi hevra naman dinivîsin, xeberan ji hev digrin. Rojêke Wefa xewnekê dibîne, wekî Mahîr di şer de hatîye birîndar kirin. Dema ew hişyar dibe, tivdarekê xwe dike, diçe hewarîya dilketîyê xwe. Ev keça diçe derdikeve hizûra Melîkşah, Melîkşah vê keçikê bernade bi xwe re dibe, dike bûka xwe. Di wê demê Mahîr jî, jî leşkerîyê vedigere tê mal. Paşê pê dihesa ku dilketîya wî çûye hewarîya wî. Mahîr careke din vedigere, pey Wefayê dikeve. Diçe mala wê pîrejîna ku Wefayê xebir li bal hîştibû, paşê fêr dibe ku, Melîkşah dilketîya wî Wefa ji kurê xwe re birîye. Mahîr dema diçe bajarê Melîkşah, mêze dike ku dîlan-dewata Wefayê tê kirin. Ew dilketîya xwe ji nav govendê direvîne. Mirovên Melîkşah pey wan dikevin, di rê de wan herduyan jî didin ber gullan, dikujin. Destana ku, cengewarî, egîtî, welatparêzî û mêrxasîya jinên Kurd bi vekirî pêşkêş dike, destana Dimdim e. Ev destana bi navekî mayîn destana Xanê Lepzêrîn an jî destana Xanê Cengzêrîn tê nasîn. Di destanê de li dijî ordîyên Faris di nav kelakê de berxwedana gelê Kurd tê zimên. Ev bûyera wek bûyereke dîrokî li dorberê kela Dimdimê di sala 1608-1610'an de qewimîye. Kurdan li dijî hêzên Şah Abbas I şer kirine. Dema ordîyên Faris êrîşê dibine li ser vê kelê, Kurd di hundirê kelê de dicivin bi mehan li ber xwe didin, teslîm nabin, heta ku koka wan tê. Di gelek şaxên vê destanê de em rastî berxwedan û tekoşîna jinên Kurd jî tînin, ew di vê berxwedanê de bi aktîfî cîh digrin. Bi taybetî di dawîya destanê de dîya Xanê Lepzêrîn, jin, bûkên wî û jinên mayîn bi cengewarîya xwe

ve çavê dijmin gelek ditirsînin. Ji bo ku ew bi can nekevin destê hêzên neyar, dema dijmin dixwaze dikeve kelê, ew bi destê xwe êgir berî xwe didin, xwe dişewitînin. Di şaxeke vê destanê de, jina Xan bi qîrînan ve gel hişyar dike ûdibe pêşeng. Di şaxeke mayîn de vê carê dîya Xan li mirovan şîretan dike, navê wê Guher Xanim bûye, ew nîşan dide ku mirin ji teslîmbûnê çêtir e (44). Angorî gotinên Guher Xanimê herkes tivdarekê xwe dike û xwe amade dike. Dîsa di vê şaxê de dema jina Xan mêze dike wekî dijmin hewl dide, bikeve hundirê kelê, ew êgir berdide cebirxana kelê, kela ji nêşkêva diteqê, di nav dumanê de dimîne, navê wê angorî vê şaxê destanê Asîme Xanim bûye (45). Ji aliyê din bûyera kela Dimdimê derheqa dîroka tevgera jinên Kurdistanê de jî bûyereke giring e. Ji ber ku ev bûyera hem wek berhemeke folklorîk, hem jî wek bûyereke dîrokî tê zanîn. Civata Kurd timê bi jinên cengewer, bêtirs û mêrxas ve serbilind bûye, ew hatine pesinandin. Di destana Rustemê Zal de, em rastî çend jinên wusan hêzdar tînin, ji van jinan yek jî ew keça bi navê Rûdeve ye, tu pelewana pê nikaribû. Ew û bavê Rustem gulaş digrin, ew zora Zal dibe, paşê Zal bi wê re dizewice. Paşê Rûdewe diwelide, Rustem jê dibe. Di şaxeke mayîn de, dema Rustemê Zal dinêre, keça wî li pêşberî xulamê wî Gurgîn pozê xwe xar dike, dibêje ezê te bukujim. Keça wî kincê pelewana xwe dike, diçe dikeve şikeftê serê dêwekî jê dike, ew dêwê ku berê Rustem bi xwe cesaret nekirîye serê wî jê bike. Piştî vê bêtirsîya keça xwe, ew dibêje "heyfa vê qîzê ez bikujim", paşê dest ji kuştina keça xwe ber dide. Di destana Rustemê Zal de, jin, bûk û keç hertim bi destê Rustem tînin rizgar kirin, dema ew dikevin tengasîyê, cara pêşîn ew xwe davêjin li ber bextê Rustem. Ji ber ku ew pelewana e, kes nikare nêzîkî mala wî bibe. Ew dibe parêzkarê jinên bindest, gelek caran wan xelas dike. Dema dêwê firinde jina yekî direvîne, xarziyê wî Bêjeng, vê jinê ji dest dêw xelas dike, teslîmî mêrê wê dike. Di şaxeke mayîn de, Rustemê Zal dibe serdewatîyê kurê Selmîyanî Sind, divdarekê xwe dike, diçe dewatê, xeber tê ku Dêwê Heftserî (tenê serîkî wî hebûye, serê din bi kincan ve çêkirine) bûk revandîye, ji xwe re birîye. Navê bûkê jê Şimikzêr bûye. Ew lédixe Dêwê Heftserî dukuje, bûkê hildide, vedigere tê dighêje cîhê dewatê. Di şaxeke mayîn, xortek keçekê direvîne, tîne mala Rustemê Zal. Pizmamên keçikê davêjine li ser mala Rustem. Rustem bi wan re dikeve şer, lê belê Rustem zora wan dibe, ji wan gelek şunda direvin. Paşê Rustemê Zal, xort û keçikê di mala xwe de xweyî dike. Di gelek şaxên destana Rustemê Zal de dema Rustem pey dijminê xwe dikeve an jî dixwaze yekî/yeke xelas bike, cara pêşîn ew diçe dibe mêvanê pîrejinekê, bi wan dişewire, gotinên wan ji xwe re dike şîret. Ew, gelekî alîkarî û piştgirtîya Rustemê Zal dikin (46).

## WELATÊ ŞAHÎYÊ: ELDORADO

Çawa tê xuyan hemû ev destanên Kurdî bi mirin-kuştinê ve diqedin, hem destanên evînê yên romantîk, hem destanên namûs-helalîyê, hem jî destanên cengewariyê li ser van pêwendîyên tirs-tal û bûyerên tradejîk ava dibin. Jinên Kurd jî çawa em dibînin ji van bûyeran nesîbê xwe distînin û zû-zû nagihêjin mirazê xwe. Evîna navbera du kesan ji ber gelek dijwarîyan naçe sêrî û sernakeve. Destana ku di naveroka wê de mirov rastî rêça mirin-kuştin ûmalwêrankirinê nayê, destana Sêva Hecî ye. Di vê destanê de dilê kesî ji tu kesî namîne, kêr-zêde her kes dilşa ye. Warên ku bûyerên destanê tê de derbas dibin wek cenneteke derewîn-welatê xweşîyê, şahîyê (eldorado) timê mirov bi mirazê xwe şa dibin. Piştî sefereke dûr-dirêj bi zehmet, bav Sêva Hecî dide Mîr Mehmûdê Cindî. Ew, dema dilketîya xwe Sêva Hecî dibe welatê xwe, di rê de rastî şivanekî tên, ew şivan şivanê mala bavê Sêva Hecî bûye, heft sal şivantîya wan kirîye, angorî gotinên Sêva Hecî bavê wê biryar girtibû wekî piştî salekê keça xwe bide vî şivanî. Bo vê yekê jî gunê Sêva Hecî gelekî li vî şivanî tê, dilê wî jî di Sêva Hecî de hebû ye. Mîr Mehmûdê Cindî ji ber zanebûna êş û jana dilan, dibêje dergistîya xwe wekî ramûsanekê bide şivîn ûxatirê xwe jê bixwaze. Demek be jî Sêva Hecî û şivan hev radimûsin. Çend sal derbas dibin, ji Sêva Hecî re keçek dibe, navê wê datînin Sêva Sêvê, ew keç mezin dibe, dibe keçeke xama. Ev şivanê ku bûbû evîndarê Sêva Hecî, hê Sêva Hecî ji bîr nekiribû. Rojekê diçe Sêva Hecî birevîne. Wê çaxê xeberê hildide ku keçeke wê bûye. Vê carê tînin vê keçikê Sêva Sêva didine vî şivanî, ew jî dighêje mirazê xwe. Di şaxeke mayîn ya vê destanê de çawa em dibînin, Mîr Mehmûdê Cindî bi Gulçîçeka Dilan re jî dizewice, wê jî bi xwe re dibe. Gulçîçeka Dilan ji der dîtina qeytana Hemedanê (ji bo çavê bavê Sêva Hecî bibîne, wî nikaribûya bidîta), keçekê jî bavê Sêva Hecî re tîne. Çawa tê xuyan hemû kesên ku di vê destanê de hene, hemû jî dighêjin mirazê xwe, dilşa dibin, dilê tu kesî ji kesî namîne, Bavê Sêva Hecî, Sêva Hecî, keça wê Sêva Sêva, Mîr Mehmûdê Cindî, Şivan, Gulçîçeka Dilan hemû bextewar in, destan bi tehrekî dilşa diqede (47). Destaneke mayîn ku bi şahîyê ve diqede jî, destana Behram û Gulendam e. Dema Behram ji raw û nêçîrê tê, di rê de rastî dewrêşekî tê, navê wî şah Mensûr e, ew patîşahê Helebê bûye. Behram mêze dike, rewşa Mensûr şah qet ne baş e. Di ber dilê wî de tê û sedemên bedhalîya wî jê dipirse, ew dibêje derdê dila ye. Piştî van gotinan ew ji berîka xwe du sûretan derdixê yek Gulendam e, yek jî sûretê Firîdayê bûye. Gulendam û Firîda pizmamê hev bûne û gelek bedew bûne, ji her derê kes dihatine dîtina wan. Dilê Mensûr di Firîdayê de hebûye. Dema ew van sûretan nîşanî Behram dide, Behram wê dibîne hişê serê wî diçe ûdibe evîndarê Gulendamê. Bi vî tehrî Behram û Mensûr şah dibine heval, pey rêça Gulendam û Firîdayê dikevin. Piştî rêwîtiyeke dirêj û zehmetên mezin, ew

digihêjin mirazê xwe, Gulendamê didine Behram, ji ber ku gelek mêrxas bûye, gotinên wî timê dihatin qebûl kirin, li ser daxwazîya Behram, Firîdayê jî didine Mensûr şah. Çil rojan û çil şevan dîlan û şahîya dikin (48)...

---

#### ÇAVKANÎ:

- 1) Qanadê Kurdo, Beytêd Kurdî (destnivîs, xebateke neçapbûyî). Qanadê Kurdo, ev berevoka destanên Kurdî berî mirina xwe amade kirîye, di nav vê destnivîsê de heft destanan cîh girtîye, ji aliyê din bo vê xebatê pêşgotinek jî nivîsiye. Di nav van destanan de çar destan, ji zaravê soranî wergerandiye zaravê Kurmançî. Ev herçar destan cara pêşîn, ji aliyê Qadîrî Fettahî Gazî de li Iranê di nav weşanên Unîversîta Tebrîzê de hatine weşandin, wek Ferx û Astî, Şor Mehmûd û Merzingan, Mahîr û Wefa, Behram û Gulendam. Qanadê Kurdo sê destanên ku newerger in, wek Elî Şêr, Zembîlfiros, Hespê Reş jî anîye di nav vê berevoka bi navê Beytêd Kurdî de cîwar kirîye, angorî her destanekê hejmara rûpelan dayê, wek pirtûk hejmar nedane rûpelan.
- 2) Oskar Mann, Die Mundart der Mukri Kurden I-II, Berlin, 1906, 1909. Oskar Mann di cildê yekemîn de çend destanên ku di nav Kurdên 'ranê de belav bûne, civandiye, bi Kurdî, bi tîpên latînî çap kirîye. Di cildê duwemîn de jî, Almanîya van destanan cîh girtîye, 302+478 rûpel. Ev xebata di dema xwe de xebata here fireh û pêşîn tê hesabîn, ku li ser destanên kurdî hatiye amade kirin.
- 3) Heta niha çend şaxên Leyla û Mecnûnê yên folklorîk hatine berev kirin. Hecîyê Cindî, Kurdski Epîşeskie Pesni-Skazki (Beyt- Serhatiyêd Kurdî Yên Epîkî), Moskova, 1962, rûp. 163-169 (Di vê şaxê de navê destanê Leylî û Mecrûn derbas dibe). Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina K'urda, Erîvan, 1982, rûp. 132-138 (Di vê şaxê de navê destanê Leylî û Mecrûn derbas dîne). Ji aliyê din çend şaxên vê destanê yên edebî jî hatine nivîsîn. Ji va şaxan yek ji aliyê Xarîs Bîtlîsî, di sala 1758'an de hatiye nivîsîn. Ev şaxa paşê di di sala 1965'an ji aliyê M. B. Rudenko ji nûh ve li Moskova çap bûye. Paşê şaxeke vê destanê ya edebî bi firehî ji aliyê Şêx Mihemed Can de, li dora sala 1884'an de hatiye nivîsîn û bi tîpên latînî ji nûh ve ji aliyê Zeynelabidîn Zinar de hatiye çap kirin: Şêx Mihemed Can, Leylî û Mecnûn, Stockholm, 1993.
- 4) M.B.Rudenko, Literaturnaya i Folklorie Versii Kurdskey Poemi "Yusuf i Zelêxe" (Şaxên Poema Kurdî Ūsuf û Zelêxe Yên Edebî û Folklorîk), Moskova, 1986. Rudenko, di vê lêkolîna xwe de, şaxeke vê destanê ya kevn ku ji aliyê Selîm Sileyman de hatiye nivîsîn bi Kurdî û Rûsîya wê ve tavayî çap kirîye û çend şaxên folklorîk jî pêva kirîye.
- 5) Hecîyê Cindî, Şaxêd Eposa "Rustemê Zale" Kurdî, Erîvan, 1977. Hecîyê Cindî, di vê berevokê de 24 şaxên destana Rustemê Zal weşandiye.
- 6) Destana Ferhat û Şîrîn her çiqas di nav Kurdan de zêde belav nebûbe jî, wergerên vê destanê yên Kurdî hene, binêre Berhem, hejmar 2, 1992 (Ehmed Şerîfî, Hekîm Şêx Elîyas Nîzamîyê Kurdî). Ehmed Şerîfî, di vê lêkolîna xwe de çawa dîyar dike, Nîzamî - nivîskarê Xusrew û Şîrîn ji aliyê dê de Kurd bûye. Çawa em ji Şerefname fêr dibin, mêrxasê vê destanê Ferhat jî Kurd bûye, ji Kurdên Kelhur bûye, Şerefname, Istenbul, 1971, rûp.23.
- 7) Qanadê Kurdo, Beytêd Kurdî (Destnivîsa wergera Şêx Ferx û Xatûn Astî ji 30 rûpelan pêk tê).
- 8) Cîgerxwîn, Folkloria Kurdî, Stockholm, 1988, rûpel 118.
- 9) M.Ararat, Dengbêj Kerem, Roja Nû, hejmar 8, 1985.
- 10) Destana Memê Alan, Istenbul, 1978, rûp.117.
- 11) Angorî çend şaxên Memê Alan û Zîna Zêdan, Mem ji Yemenê tê ji bo dîtîniya Zînê, binêre Oskar Mann, 1909, rûp.42. Angorî vê şaxê, Mem, kurê patîşahê Yemenê Ibrahîm bûye.
- 12) Oskar Mann, Die Mundart der Mukri Kurden II, rûp. 135-165
- 13) Qanadê Kurdo, Beytêd Kurdî (Destnivîsa wergera destana Şor Mehmûd û Merzinganê ji

27 rûpelan pêk tê).

14) Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, cild I, 149.

15) Hecîyê Cindî, Beyt-Serhatîyêd Kurdî Yê Epîkî, rûp.153.

16) Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina Kurd I, rûp.171.

17) Qanadê Kurdo, Beytêd Kurdî (Destnivîsa wergera destana Mahîr û Wefa 23 rûpelan pêk tê).

18) Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina Kurda I, rûp. 147. Ji der çaxên destana Sîyabend û Xecê yê folklorîk, çend şaxên vê destanê yê edebî jî hatine weşandin : Stabandov Semend, Sîyabend û Xecê, Erîvan, 1959. Zeynelabîdîn Zinar, Sîyabend û Xecê, Stockholm, 1993. Koyo Berz, Sîyamed û Xeca (bi zaravê Dimilî), Stockholm, 1993.

19) Hecîyê Cindî, Beyt-Serhatîyêd Kurdî yê Epîkî, rûp.171

20) Qanadê Kurdo, Beytêd Kurdî (destana Şêx Ferx û Xatûn Astî rûp.8). 21) Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqîyê, Erîvan, 1977, rûp.271.

22) Eynî berhem, rûp.249.

23) Ahmet Aras, Destana Kerr û Kulik, beşê 4, Azadî, 23- 29/871992. Ev şaxa Ker û Kulik wek şeş beşan di rojnama Azadî de hatîye weşandin.

24) Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Zargotina Kurda I, rûp.160 (Navê vê Qeytana Hemedanê, di şaxeke mayîn ya vê destanê de wek Qeytana Memûdî derbas dibe, binêre, Hecîyê Cindî, 1962, rûp.154).

25) Oskar Mann, 1909, rûp.166-205.

26) Eynî berhem, rûp.404-429.

27) Roger Lescot, Binevşa Narîn û Cembelîyê Hakkarê, Hêvî, Hej.2, 1984.

28) Muhsine Helimoili Yavuz, Diyarbakir Efsaneleri II ve Diyarbakir şzerine Sekiz Bildiri, Ankara, 1990, rûp 142.

29) J.S. Musaelyan, Zembîlfiroş -Kurds kaya Poema i ee Folkornie Versii (Zembîlfiroş-Poema Kurdî û Şaxên wê yê Folklorîk), Moskova, 1983, şaxa I.

30) J.S. Musaelyan, Zembîlfiroş, şaxa II.

31) J.S. Musaelyan, Zembîlfiroş, şaxa IV.

32) J.S. Musaelyan, Zembîlfiroş, şaxa VI.

33) J.S. Musaelyan, Zembîlfiroş, şaxa VII.

34) J.S. Musaelyan Zembîlfiroş, şaxa IX.

35) Şaxa Emînê Evdal (Di nav pirtûka Musaelyan de cîh girtîye).

36) Qanadê Kurdo, Beytên Kurdî (Ev destnivîsa şaxa Zembîlfiroş ya ku Qanadê Kurdo xwe berev kirîye ji 16 rûpelan pêk tê).

37) Ev şaxa destana Zembîlfiroş wek şaxeke edebî hatîye amade kirin, di nav pirtûka Musaelyan de cîh girtîye. Ji aliyê Mirad- Xanê Beyazidî de hatîye nivîsîn. Li ser vê şaxa destanê lêgerînek di kovara Pale de wek du beşan hatîye weşandin, binêre hejmar 3- 4, 1979.

38) M. B. Rudenko, Şaxên Poema Kurdî Ūsif û Zelêxe Yê Edebî û Folklorîk, rûp.297.

39) Hecîyê Cindî, Beyt û Serhatîyêd Kurdî Yê Epîkî, rûp. 139-146.

40) Celîlê Celîl, Zargotina Kurdên Surîaê, Erîvan, 1985, rûp.79- 95,

41) Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqîyê, rûp.238.

42) R. Dengîr, Berxwedankarî Gerdenazadîya Emê Gozê û Du gotin li ser Bişarê Çeto, Rewşen, hejmar 5, 1990.

43) Ordîxanê Celîl, Stranê Kurdaye Tarîqîyê, rûp.304.

44) Ordîxanê Celîl, Kurdskiy Geroyişeskiy Epos "Zlatorûkiy Xan (Eposa Kurdî Ya Mêrxasîyê "Xanê Lepzêrîn"), Moskova,1967, rûp.74. Di vê berevokê de çend şaxên destanê hatine weşandin.

45) Eynî berhem, rûp. 119

46) Hecîyê Cindî, Şaxêd Eposa "Rustemê Zale" Kurdî, Erîvan, 1977.

47) Hecîyê Cindî, Beyt-Serhatîyêd Kurdî Yê Epîkî, rûp.156.

48) Q. Kurdo, Beytêd Kurdî (Destnivîsa wergera Behram û Gulendamê ji 56 rûpelan pêk tê).

# ROLA EDEBIYATÊ DI PÊŞKETINA MILETEKÎ DA

---

M. Mayî



**H**er gel û miletê li ser vî rûyê goya erdê çi yên azad û serbixwe, çi jî yên bindest, yên ku li benda tîrojken azadî û serxwebûna xwe ne, heta ku ev gel û milete karibin xwe di nêv qola mirovatiya xweser da bibînin û bêne rêza gelên azad û serfiraz, divê ew li pêş her tiştî, zimanê xwe yê zikmakî ji bo jîna xwe ya rojane bikin binyat (esas). Ango; li ser bingeh û bikaranîna zimanê xwe yê dayik ew dikarin xwe bînin rêza gel û milatên azad.

Berî çend roja, hevalek ji min re dibêje; zanayekî elmanî dibêje: "Ziman giyanê (ruh) gele e û gel jî giyanê zimên".

Eger em vê gotinê şirove bikin û kûr bala xwe bidinê dê gelek quncikên tarî ji me Kurdan re ronî zelal binbin.

Belê, ev tê wê manê ku gel ne xwedî zimanê xwe î xwemal be; şertên saxlemî û mena wî gelî gelek hindik û qels dibin, wek laşek bêgiyan dimîne. Eger em di zerebîna (mîkroskop) vê gotinê da li rewşa gelê me yê Kurd binêrin, dê gelek niqtepirs û xal xwe di serê me de bihilavêjin ku em hayirî bimînin!

Tiştê ku em dikarin bêşik û dilrast bêjin ew e ku, yek ji bingeh û şênistên hebûn û mana gelê Kurd zimanê wî yê kurdî ye. Ev rastiya jî li ber çî kesî nayê wendakirin.

Her ji ber vê yekê û ji ber ku wek me got; ziman bingeha hebûna gele, lewma

bi sedan sal in dijminên gelê Kurd qeyd û zincîrên giran li ser zimanê me yê xwes û delal danîne, ku bi jinavbirina zimanê kurdî dixwazin gelê Kurd ji holê rakin. Helbet dijmin wê dizane ku eger zimanê kurdî nema, êdî gelê Kurd ji weke (laşek bê giyan) dimîne û hêdî hêdî ew laş dirize, kirmç dibe û pûç dibe.

## AWIREK LI DÎROKÊ

Ger em li rûpelên dîrokê binêrin, em dikarin wa sedem û astengan bibînin yên ku rê li dijminên me yên dilreş girtine ku nehêlane ew bigihin merem û armancên xwe yên pîs.

Weke rojhilatnasek dibêje : "Ger ne ji dayikên Kurdan bûya, man û parastina zimanê kurdî di xeterê da bû".

Ger dijminên me li cade, kolan û ciyên kar zimanê me li me qedexe kiribe, ew nikaribû wî li malên me, ji dev û dilên dayikên me qedexe bike. Dayikên me ew wek ronîya çavên xwe viyaye û parastiye.

Zimanê ku 330 salan (b.z) li ser kevîran hatibe kolan; nayê wenda û jibîrkirin. Di vî warî de rojhilatnasek bi navê (Filyamînof) dibêje ku li bakûrê Îranê kevîrek hatiye dîtin, li ser navê xwediyê wê (Boraboz) ev parçe helbesta bi kurmancî li ser wî kevîrî hatiye kolan û nivîsandin, ku li gor bawerîya kesên zana ew helbest 330 sala (b.z) hatiye nivîsandin. Ev jî ew helbest e:

"Xwazdî ez tu bi hevre bîn	bi hevre herin xorîne
wer da biherîn kotra bîn	bang dîn bi hevre narîne" "1"

Ango:

Xwezî ez û tu bi hevre ban, em bi hevre çûban zozanan. Wer em li dema spêdê derkevin. Bi hevre bang kin, (Narîne) ji xwe re bistirin .

Dîsa nêzî sed sal berê, li devera şarezûrê, li başûrê Kurdistanê perçek çerm (post) hat dîtin. Li ser wî jî parçek helbestê hatibû nivîsandin. Tarîxa nivîsandina wê ne dana ye, lê diyar e ku helbest di dema hêrişên leşkerê Ereben misilman bo ser deverên Kurdistanê de hatiye nivîsandin, ji ber ku helbest behsa wan kujtin, talankirin û malwêraniyan dike yên ku leşkerên Ereban bi ser Kurdan û cî û warên wa de kirine. Helbest wusa dibêje:

"Hormizgan rîman, Atran kujan	Wêşan şardewe gewrey gewrekan
Zorkarê Ereberdene xapor	(Gina) û (Paleyî) heta şarezûr
Jin û kedîkan we dîl be şîna	mêrdê azad telî we rûy hiwîna
Rewîşt Zertoş re manewe bêdes bezêka naka	Hormiz we hîç kes" "2"

Ango:

Bajarê Hurmizgan hat herifandin, agirê agirdanan (kuçik) hat vemirandin, mezinên mezinan xwe veşartin, zodarê Erebb gundên (Gina) û (Paleyî) heta şarezûrê xera kirin. Keç û jin bi êxsîrî girtin û birin, mêrên zîrek jî di xwînê da digevizin. Ol û rewîştê Zerdeştî bê dest ma, Hurmiz rehmê bi kesê nake.

Ev edebiyata berxwedanê ye. Ev edebiyate dijminan red dîke û dixwaze habûna xwe, tradîsyona xwe, ola xwe û zîmanê xwe biparêze. Gelê ku xwedî edebiyatek weha be, diyar e ew gel xwedî binyatek gelek mukum e. Diyar e ew gel pêşketinxwaz e, jî ber ku jiyana koletî û bindestiyê qebûl û pesend nake. Zîmanê ku ew di dil, mejî, xame û devê xwe de bikar tîne, zîmanekî bi hêz û nemir e û jî hêz û pîlanên dijminan mezintir e.

Kurdistan wargehê şaristaniya (sivîlasyon) rojhilata navîn e. Di wê derê de, tovê mirovatiyê hatiye çandin. Di tarîxa Kurdistanê da bi sedan dibistan û xwendigeh hatine avakirin. Ji wan dibistanan bi sedan kesên zana û hoşmend peyda bûne.

Mixabin ku dijminên hêriş dikirin ser Kurdistanê, çî Erebbên musulman yan Tirkên Osmanî yan jî Împaratoriya Farisî, hêrişên kavilkar û wêrankar bûn. Wan ter û hişk bi hev re dişewitandin. Di encama van hêrişan da bi dehan dibistanên mezin, pirtûkxane û afirandinên zanayên Kurdan wenda bûn. Nimonek jî wan, pirtûkxana (Mîr Ebdal Xan) mîrê mîrgeha (îmaret) Bidlîsê bû. Di sala 1666î da dema Ehmed Paşa, zavayê (Sultan Murad)î hêriş kire ser Bidlîsê û kela wê stand, jî ber ku Ebdal Xan neçûbû pîrozbahîya sultanî biket dema wî bajarê Bexda girtî.

Di wê hêrişê da tevî bajarî, pirtûkxana (mîr Ebdal) ku neviyê (Şerefxanê Bidlîsî) bû hate talankirin.

Li gor gotina (Ewliya Çelebî)yê gerok, ku ew jî li dema nivîsîna bermayên mîr hazir bû, ew dibêje, ku di wê pirtûkxanê da ev tişte hebûn:

-Heft barê hêştira jî pirtûkên kevn yên ku bi det nakevin.

-Pirtir jî çar hizar pirtûkên destnivîs li ser zanyariyên heywan, şînkatî, ol, dîrok, zîman, derman û şîr û dîwanan.

-Gelek rengên nexşe (xerîte) û kevalên (tabloyên) berketî û hêja.

-67 pirtûkên destnivîs.

-105 name bi zîmanê erebî û farisî.

Di van êrişan da, Kurdistanê gelek tiştên xwe yên pir buha, jêhatî û hêja jî dest dan. Gelek heyf û mixabin ku dema mirov li rûpelên dîrokê dinêre, dibîne ku gelek Kurd hebûne di van hêrişan da jî dijmin re alîkarî kirine. Diyare ev jî reçek jî kelepore gelê Kurd e, ku yek jî sedemên bindestmayin û paşdemayina wî ye, û heta îro jî ew perça xirab jî kelepore Kurdan dom dîke!

Ji alê din ve, dema mirov li tarîxa gelên Erebb, Fars û Tirk dinêre, bi dehan



navên zimanzan, dîroknaş, şair û qumandarên kurd hene ku xwe û gelê Kurd jibîra kiriye, ji dijmin re bûne xîmetkar û navdar, ku li vir ne pêtvîye em navên nimunan bînin ji ber ku ew li cem her kesî ronî û eşkere ne. Kurd dibêjin: "Kurmê darê ne ji darê be; dar xerab nabe".

Di ser vê talankirin, wêrankirin û kuştinê ra, di tarîxa edebiyata kurdî da kesên wusa jî hene ku bi şîr û afrandinên xwe yê edebî ve zimanê me parastine û em bi saya serê wan îro xwedî çand û edebiyatek bilindin. Ew kes taca serê me ne, û em bi wan serbilind in.

Eger li rojhilata Navîn, gelê Îranê bi Firdewsî, Hafîz û Seîdî, gelê Tirk bi Nazîm Hîkmet û gelê Ereb bi Mutenebbî serbilindin; em jî bi Melayê Cizîrî, Elî Herîrî, Feqê Teyran, Hacî Qadir û Nalî dibêjin em Kurd in û bi Ehmedê Xanî serê me bilîbd e. Ew Xaniyê ku mixabin heta vê gavê behra pirtir ji Kurdan wî nas nakin. Ne bi tenê ew, lê rewşenbîr, edîb û nivîskarê Kurdan jî hene ku buhayê hunera Ehmedê Xanî nizanin! Lê biyanî wî ji me baştir nas dikin. Ehmedê Xanî nasnameya (îdentîtêt) gelê Kurd e û ew bersiva wa dijminan e yê ku dibêjin; Kurd ne netewe ne ji ber ku ne xwedî ziman, edebiyata û kultur e.

Heta em xwe pêşketî bibînin, xwe bînin rêza gel û mirovatiya cîhanê û bêjin em pêşketî ne; divê ku em Ehmedê Xanî nas bikin û buhayê wî bizanin, wî çî kir û ji bo gelê kurd çî dixwest? ji ber ku nasnameya gelê Kurd e.

## NIMUNE JI BÎRÛBAWERIYA BIYANIYAN LI SER EHMEDÊ XANÎ

Zanayê kurdnas, Yosif Ebgareviç Orbîlî (1887-1961)<sup>3</sup> yê ku ji sala 1911'ê da dest bi kurdnasiyê kirî û lêkolînên kulturî li ser ziman, çand û edebiyata Kurdan çêkirin. Wî qedr û rêzgirtinek mezin ji bo Xanî hebû. Di gotineke xwe de li ser Ehmedê Xanî dibêje:

Ehmedê Xanî, şairê hemî rojgar û serdema ye. Ew gelek munewer, mezin û bê hempa ye. Berhemên (Xanî) cewher û bermayê afirandina hemî hizra Kurdan e. Ger hidik jî ji berhemên Xanî bizanî, dê bo te belê û diyar bibe ka Kurd xwedî çî kulturek bilind bûn. Eger mirovatiyê zûtir hay ji (Mem û Zîn) a Xanî bûba, Kured toşî vê bendewarî û neheqiyê nedibûn.

Orbîlî gelek pê xweş bê ew karên kurdnasan bimêzîne û bisengîne. Dema ku (Mergrêta Barîsevna Rodînko) nameya xwe ya kendîdatê li ser (Mem û Zîn)ê nivîsî, Orbîlî di sengandina wê namê da ji M. Rodînko re got:

Di destpêkê da, dema min navvîşana nameya te dît, ez geletirsam. Ji ber ku li nik min ev kar mezin bû, min bawerî nebû ku ez bidem detst torevanekî genc. Paşî ew gelek bi wî karê Merrêtayê dilşad bû û ji Qenatê Kurdo re spasî kir ku

wî ew babet ji Mergrêta re pêşniyar kiribû. Wî ji bo wî karî got:  
"43 sal in ez mest û şeydayê berhemên Ehmedê Xanî me. Spas ji bo Xwedê ku hîn ez ne mirîm, min bi çavên xwe dî ku berhemê Xanî dibe metiryal ji bo namek zanistî".

Dema ku ew pesina (Mem û Zîn)a Ehmedê Xanî dike dibêje:  
Di dîroka edebiyata rojhilatê da, ya berî çend sed salan, berhemê mîna (Mem û Zîn)ê bilind û hêja hidik in, ku weke wê giyan û sîmayê neteweyî pêve diyar be, bi wê geşbûn û zelalyê rewîşt û tradisyona gelerî diyar kiribe. Dibe ku hûn ji min re bêjin; ev hizrên tu dibêjî di berhemê [Siwarê di pûstê pilingî da] ya şairê gurûzî (Rostavîlîşî) da hene. Pir baş e, yanî tiştên weha di nav xelkê din jî da, weke Kurdan hene.

Yosif Orbîlî li ser raman û bîrûbawera Ehmedê Xanî dibêje:  
"Yek ji şairên here mezinên mirovatîyê Ehmedê Xanî, gelek zelal ji me re dibêje ka wî ji ber çî dastana xwe ya helbestî bi zimanê kurdî nivîsandiye. Divê em kurdnas wan gotinên Xanî baş fehim bikin û tim li bîra me bin. Xanî dibêje ku ew karibû bi zimanê erebî û farisî jî binivîse, û dihat pesendkirin jî, lê bi kurdî nivîsî da kes ne bêjin; Kurd ne xwedî kultur in".

Gelek caran Yosif Orbîlî digot: "Hemî gelên rojhilatê ne xwedîyê (Xanî) û (Mem û Zîn)ekî ne, heta ew karibin bi wan fexr û şanazîyê bikin, ku Xanî ew berhemê hind bilind nivîsî". Herwusa wî digot:

"Ehmedê Xanî ji bo milyonan Kurdên li hemî al û quncikên vê cîhana freh da, ne bitenê şairek mezin e. Lê ew wesa jî alayê kulturê Kurdan e û sûnd pê tê xwarin, êdî mirov çawa dikare bi xemsarî û xwînsarî ve behsa wî bike!"

Hosa em dibînin yekî biyan buhayê Xaniyê me baştir ji me dizane. Ev jî ne bi tenê kesên pispor û zana, lê mirovên normal jî ji biyanyan ji me baştir buhayê Ehmedê Xanî dizanin.

Di sala 1987'ê da, li bajarê Stokholmê şevê kurdî çêbû. Di şevê de axaftina yekî swêdî bala min kişand. Wî got:

"Dijminên gelê kurd dibêjin, Kurd ne netewe ne, ew ne xwedî ziman û edebiyat in. Bersiva van dijminan, Ehmedê Xanî 350 sal berê daye."

## EHMEDÊ XANÎ

Sal 1650, li gundê (Xan)ê, li nav çiyayên serbilindên devera Hekarê, zaroyekî şêx Îlyasê kurê Rostem begê peyda bû. "4" Navê wî kir Ehmed. Ehmed zaroyek gelek jîr û hisrar bû. Wî zaroyê kurd, çavên xwe li cîhanek bêbext û Kurdistanek warê şeran vekirin. Ehmed ji malbatek xanedan û zana bûye, lewma her zû evîndarê xwendin û zanîne bû. Ew ji bo xwendin û zanîne li gelek

mîrgeh û dibistanê Kurdistanê gerya ye, heta ji bo zanîne çûye welatên derve jî, weke Misrê û du caran jî çûye hecê. Heta ew di gelek warên zanîna dîn, felek, felsefe, jiyana civakî û siyasî ya serdema xwe de zana û melevan bû. Di zimanên kurdî bi gelek devokên wî ve, erebî, farisî û tirkî zana û şareza bû.

Di serdemên berî Xanî û di hemdemiya wî da, Kurdistan xwedî hinek Mîrgehên (Îmaret) nîvserbixwe bû. Gelê kurd heta radekî di bin hikmê mîrên xwe bixwe da bû. Lê bi tevayî Kurdistan di navbera herdu Îmbratorê tirk û fars da parvekirî bû. Wan herdu aliyên hêrişên giran dibirin ser Kurdistanê. Xanî hay jê hebû ka çewa wa Kurdistan kavi wêran dikir, mîratiya û hikimdariya Kurdan ji destê wan derdixist û bi hezara jin, mêr û zaroyên Kurdan dikujitin.

Xanî Zaroyek 14 salî bû, dema ku Leşkerên Osmaniyan Îmareta Bidlîsê girtin û Bitlîs talan kirin. Herwesa deverên Hekar, Botan û Behdînan, ku hemî li çarrexên wargeha Xanî bûn, li ser dema wî û li ber çavên wî ji hikimdariya destê Kurdan derxistin.

Her wisa bûyerên Kela Dimdim jî bihîstibûn, ku di sala 1608 î da qewimîbûn, ango 44 salan berî bûyina Xanî. Ev bûyer, qewimîn û tiştên li ber çavên Xanî bi serê welat û gelê wî da dihatin, gelek his hesta wî bizivandin û agirê kurdayetiyê berda nav hinavên wî. Her zû kerb û neheziya Tik, Fars û Ereban kete dilê wî. Wek ew di destpêka (Mem û Zîn)ê da dibêje:

”Ez mame di hîkmeta Xwedê da  
Aya bi çi wecih bûne mehkûm

Kirmanc di dewleta dinê da  
bîlcumle ji bo çi bûne mehrom” ”5”

Paşî dibêje:

”Ev Rom û Ecem bi wan hesar in  
Herdu terefan qebîlê Kirmanc

Kirmanc hemî li çar kinar in  
bo tîrê qeza kirîne amanc” ”6”

Paşî dibêje:

”Ger dê hebûa meîtifaqek  
Rom û Ereb û Ecem temamî

vêkra bikira me înqiyadek  
hemyan ji me re dikir xulamî” ”7”

Dilê Xanî ji kul û derdên gelê Kurd pir bûbû. Tiştên ku wî dixwestin ji gelê xwe, ji dijminê gelê xwe û ji cîhanê re bigota pir bûn. Ji bo derkirina vê kula di dilê xwe de wî serpêhatiya çîroka evîna (Mem û Zîn)ê kire behane û rêya dilvalekirinê:

”şerha xemê dil bikem fesane  
Zîne û Memê bikim behane”

Xanî baş zanîbû ku gel bi zanê pêş dikevin. Ji bo ku kes nebêje ; Kurd ne xwedî kitab û kultur in, wî (Mem û Zîn) nivîsî. Weke dibêje:

”Da xelk nebêjtin ku Ekrad  
bê meîrîffet in, bê fêsl û biyad  
Enwafê milem xudan kitêb in  
Kirmanc tenê di bê hisêb in”

Yek ji xem, derd û kula dilê Xanî ew bû, ku di wê demê jî da, mîna rojên me yên îro, kurd hebûn ji dijmin re alîkarî dikir. Bi dijmin re hêrişî ser gund û bajarên Kurdistanê dikir. Jin mêr û zaroyên Kurdan dikujtin û hikimdariya wan jî dest derdixist. Gelek Kurd jî hebûn, mîr û hakim bûn, lê guhê wan ne li derdê gelê kurd bû. Guhê wan li navdariya xwe û pare komkirinê bû. Buhayê îlm û zanîne nizanin, eger hikmeta wan jî hebe, ewê bi pare bifroşin. Wek dibêje:

”Çi bikem ku qewî kesad e bazar                      Nînin ji qumaş re xerîdar  
xasma di vî esrî da ku hemyan                      meîşoq û hebîb bûne hemyan  
Ger îlim timam bidey bi parek                      bifroşî hikmetê bi solek”

”Wî dixwest xelk li zanîne bigerin, herçend ku ne hêsan e jî, dema dibêje:  
Wextê ku me dî zeman ev reng                      fîlcumle li ser diravî bû ceng  
Hezkir me bibîne kîmyager                      gava ku me dî nebû miyesser” ”10”

Mebest û amanca me li vê derê ne lêkolîn û şirovekirina berhem û afrandinên Ehmedê Xanî yê mezin û nemir e. Ji ber ku ew kar qet bi dawî nayê û ne karê komcivînek wek vê ye. Lê tiştê ku em dixwazin li vir bêjin ew e, ku em Xaniyê nemir bibîr bînin. Bi edebiyat û afrandinên wî yên gelek bilind û pêşketî, jiyân û xebata xwe pêşda bibin. Em bi kurdatiya paqij, ser ji bo dijmin neçemandin û xebata ji bo rizgarî, serxwebûn û serfiraziya Kurdistanê, Ruhê Xanî û tev şehîdên Kurdistanê şad dikin.

Mixabin ne hêzên siyasî yên kurdî, ne hukimdar û hikmetên kurdî yên ku di tarîxa Kurdan de çêbûne û ne jî rewşenbîr û organên kulturî yên kurdî nîrx û buhayê ku hêjayî Ehmedê Xanî bin, ne dane wî.

Çi mîlet qasî Kurdan şevên şahî û şahiyên bîranîna çênakin, lê mixabin dinav van hemî şahî û bîranînan da, cih ji bo bîranîna Ehmedê Xanî nîne!

Em her sal Newrozê pîroz dikin, ji ber ku me ji xwe re kiriye simbola azadiyê. Newroza ku 350 sal berê, Ehmedê Xanî di (Mem û Zîn)ê da ji çavên dijminan re kiribû kelem û ji wa re got: Vaye em Kurd in, em hene û Newroza me simbol û nîşana man û hebûna me ye.

Ma em wek netewe, bîndest, kole û hal perîşan, bi çi rû û bi çi rê dikarin bêjin; em jî mîna tev gelên serbeste cîhanê, serxwebûn û azadiya xwe dixwazin, eger em serê xwe bi gazî, huner û daxwaziya mest û evîndarê kurdatiyê Ehmedê Xanî bilind û bilind nekin?! Ew xaniyê ku ev gaziya em nuha dibêjin, wî ew gaziya me berî 350î salan hawar kiribû.

Ew nameya ku hêja M. Bozarslan di 21-adar-1992'ê da, ji UNESCO re sandibû, têda pêşniya kiribû ku sala 1995'ê bibe sala Ehmedê Xanî."11" Divê tev rewşenbîr û rêxistinên Kurdan li derve û hindirê welat piştgiriya serketina vê pêşniyarê bikin.

Ka ew dibistanên ku edebiyata Xanî şirove dikin û li ser felsefeya kurdatiya Xanî zarokên Kurdan perwerde û mezin dikin?

Ka ew Newrozên ku bîranînên Xanî pîroz dikin? Ew Xaniyê ku bi tenê û bi tenê ji Kurdan mana û buhayê Newrozê zanî?

Ka ew enstituyên Kurdî, yên ku karê wegerandin, şirovekirin û vejandina edebiyat û afirandinên Xanî danîne ser milên xwe?

Ka ew peykerên (heykel) li Kurdistanê ji Ehmedê Xanî re hatine çêkirin?

Ka em, ew Kurdên ku xwestine û dixwazin taca serê me û nasnama (hewiyet) kurdbûna me, ku Ehmedê Xanî ye, nas bikin û ji wî dersên jiyana kurdatiyê fêrbîn?

Dema eve nebin, diyar e kêmasiya me heye, em nikarin bêjin em pêşketî ne û mîna gelên serbest û azad dixwazin em jî pêşketî bin.

---

Jêder û çavkanî:

- 1- Mem û Zîn şirovekirin û vekolîna Emînê Osman Bexda 1990.
  - 2- Mem û Zîn Vejandina Perwîzê Cîhanî Weşanxana (Întişarat Selaheddîn) Ormiyê-Îran, 1988.
  - 3- Kurd le sedey 19-20 da, Lekrîs Koçêraç Wergêr Mehemed Rîyanî, çapxana Karon, Tehran 1990.
  - 4- (Munaqesat hewle Xanî) Reşî Findî, Bexda, 1986.
  - 5- El-Ekrad fî Behdînan, Enwer Mayî, Mûsil, 1961.
  - 6- Mêjûy wêjey kurdî, Seddîq Borekeyî, Întişaratê Nacî, Bane-Kurdistan.
  - 7- Çend wîtarêkî kurdnasî, Enwer Qadir Mehemed, Swêd, 1989.
  - 8— Rojnameya Welat hejmar 53.
- Ev gotara M. Mayî li Stockholmê di paneleke li ser edebiyata kurdî de hatibû xwendin.

# BENDEWAR BIN, EZ Ê BÊM

---

Bedirxan EPÖZDEMİR

ez ê bêm  
ku mecal nedin jî  
rê û bend,  
sûr û sînor  
ez ê bêm.

ku qam û taqeta min  
nemîne jî,  
bê mecal û îmkan bim jî  
bi hawar û gazî  
ez ê bêm.

ez ê bêm  
sond û peyman  
ji we re bi govend û dîlan,  
bi şabaş û stran,  
bi hesreta salan  
bendewar bin  
ez ê bêm.

1987 / Rotterdam

# FÊKÎ KERIXÎN WERE

dema  
fêkî kerixîn  
were.  
ku  
belçimên daran stûxwar bûn  
were.  
were!  
ku hatina te  
    bibe melhem  
        ji birînên  
            me re.

were!  
bê tirs û xof  
bi hêviya aşîtiyê ve  
were.  
were!  
ku hatina te  
    dawî bîne  
        ji birçîbûna  
            me re.

were!  
bi bendewariya salan  
bi kîn û hêrsa sêwîyan  
were.  
ku hatina te  
    bibe ronahî  
        ji şevên  
            me re.

were!  
bi hesreta dilan  
bi bîranîna şehîdan  
were.  
ku hatina te  
    dawî bîne  
        ji hêstirên çavên  
            me re.

1986 / Arnhem



# LI SER HOZAN Û HELBESTAN

---

Medenî FERHO



**J**i mêj ve min dixwest ez li ser hozan û helbestan çend rêzan binivîsînim. Lê ez nû ji welêt derketibûm. Cih û warê min winda bû. Ji ber kes û kûsê xwe jî bêhna min teng bû. Bêjin ku hişê min ne li serê min bû. Bi rastî li ser jiyana min ew girtina min a nîvmirî pir nexweşî hiştibû. Ez hê jî girtiyê ser û ling û hinavê xwe me; girtiyê hewn û destê xwe me. Westiyayê lomê dinyayê, şikestiyê destê kes û kûsa me. Mîna çûkê pirtikandî, hin bi ferfitandin, hin bi mijûlbûna karê dinyayê ê aborî...Zor e!... Jiyana însanî ku bingeh xerabû, zû bi zû nayê danhev. Di jiyana xwe de min bi kêmanî deh caran malxerabûn dîtiye; yê bav û kalan em deynin dera han. Min ji nû ve mal daniye, war û tişt berhev kiriye. Ne hêsanî ye! Bê war û tişt jiyana nabe.

Îcar îro ez rûniştîm û min kumê xwe danî ber kaba xwe. Min got: îcar rast e! Ku niha jî tu bêjî ez dest pê nakim, an jî te nayê, tu nemaye, an jî tu newêrî.

Berî bi çend heyvan gava ez hatim Ewropa, çiqas kovar û rojname li ser çanda kurdî derketine, ez wan hemûyan berdest dikim. Kevin û nuh... Nav li dinê be, hin bi xêra birayê min Derwêş Ferho, hin bi xêra Enstîtuya Kurd ya Brukselê... Ji kesê weke min ê bazdayî, xerîb, şikestî, bê zar û ziman ev alîkarî ne hindik e, pirr e.

Bibexşînin, divê ku em kêmasî û şaşiyên hev bêjin. Ne ku em qêla ji hev re çêkin. Wextê me ji qêl û lomên dinyayê re tune ye. Îro himbêza gel li ya dijminê pir dijwar û hov e. Ku em têkevin zîqa hev, wê meydan û hol ji dijmin re vala bimîne. Divê em li hevdu şîretan bikin, rê nîşanî hev bidin, aqilmendiyê bikin lê şerê dijmin daneynin dera han.

Bi çi lewnê ku hebe!

Hûn tev dizanin ku şer ne tenê çek û çekdarî ye. Min xelet fehm nekin... şerê herî mezin çandî û edebî ye. Ji ber ku şerê çekdariyê îro xelas nebe, wê sibe xelas bibe. Lê ya din, heya ku dinya hebe, heya ku jiyan hebe wê bidome.

Berî ku em qala helbest û hozanan bikin; ez ê serpêhatiyê xwe bêjim. Berî çendakî, min ji hozanekî me re got: Ez ê li ser helbestên te binivîsînim; xweşî û nexweşî li zora te neçe; Ez ê li gora zanîna xwe ya li ser helbestan û dîtina krîtîka dinyayê bi rastî binivîsînim. Ez dêhnê xwe didim kovar û rojnameyan, ez dibînim ku nivîsên di vî babetî de kêmin. Kovarên me jî kêmin, mamosteyên me jî kêmin, nivîskarên me jî kêmin. Di hemberê van kêmasiyan de kesên rexnegir jî wê kêmin bin. Îcar wî hozan û hevalê min neçêyî nekir û destûr da min ku ez li ser helbestên wî binivîsînim. Ev çendek e ku ez li ser helbestên wî dixebitim.

Krîtîk/rexne ji bo xebata çandî pirr lazim e. Bê rexne wê gelek xeletiyên me çê bibin. Kesê rexnegir hekîmê hozanan e, gotinên wan jî dermanê helbestan e.

Dibistana hozanan tune ye. Bes kovar in. Kes jî nikare bibêje ku helbest bi vî awayî tê nivîsandin, çê nabe. Tu qewl û mêzîn nemaye, hozan mîna teyr azad e.

Helbest di serî de, di nava mêjî de tê helbijartin, tê çandin... Lê ne weke nîsk û genim û dexla ku di nava erdê tim zibildayî de şîn bibe; liqat û eşêfa wê bike.

Hozan pêşî di serê xwe de danhevê dike û dimeyine. Dawî ew dirjîne ser rûpelan. Ku helbest hate miştaxekirin, wextê stewardinê jê re divê. Ew wextê liqatê û eşêfê ye. Mîna bexçê fêkî... Hin bi dilovanî û evîndarî, hin bi hoste necarî û karkerî... Xeberên bi rewş û neqandî ku bi hêz ristik rijîyan ser rûpelan, tav dît; liqat û eşêfê de çêbû, hûrik hûrik neqş û xemla xwe nîşan dide. Hozan li gora rê û şivîla ku li ber himbêza xwe daniye rêzik hêz kirin, neqş û xeml kir, bi gîsinekî kûr eşêf kir, bi birreka di mêjiyê hozantî kesax kir, helbest dertê ronahiyê. Îcar hin bi neqşên folklorî, hin bi xemla tabîî, ser û qewl (epîk), dîlok, payizok (epope), yan qesîde, yan jî bi rewşa îro ya serbest, mîna teyran; bê

armanc çiyê ew bi wî awayî dertê meydanê.

Ku karê hozan xelas bû, ew helbesta xwe pêşkêşî xwendevanan dike. Jûrî xwendevan in, wesifdan û ecibandin di destên wan de ne. Xelat dike, nake, esil ew in. Hozanê ku herî ji xwe razî û bi xwe emîn, vî qewlî qenc dizane: Helbest ku derkete nava xwendevanan, jê re ceribandinek û pêlên pîvan û bersivdanê divê. Dûr an nêzik...

Ne ku helbestên hêja nayên nivîsandin, ne ku hunermendên me di xebata xwe de bê çîk û bê xelat in; na, gotina min li ser hozan û helbest û rexnegiran e. Carcaran em helbestên pirrî xweş dibînin, lê ev ne bes e... Ne bes e ku em bêjin filankes hozan e. Em dikarin ji wan re bêjin ku ew wextê xwe derbas dikin. Ewqas... Hozantî tişteki din e. Sal û meh, xwendin û rebeniya karê hozaniyê jê re divê.

Kêmasiyên me ne li ser hozan û helbestan tenê hene; di her warî de hene. Ev ê hê jî dom bike.

Em çend gotinan li ser hoste Nekarê xwe, li ser hozanê xwe yê kevin bêjin û dawî vegerin peyva xwe.

Helbesta kurdî berî îsayê Nûranî bi sed salan hatiye nivîsandin. Gotina nimêja Zerdeşt a yekemîn, duwemîn û sêyemîn hemû jî bi helbestî û dilovanî tînin gotin. Hemû pirtûkên dînî bi vê rewşê hatine nivîsandin. Teva bi rewşeke bawerî ya dilovan... Dawî em dinêrin ku di qirnê IX'an de hozanên kurdan bi rewşeke herî wesifdan û qelemşorî helbestên xwe nivîsîne. Bavê Raxî Hemezani... Di sedsala X, XI û XII'an de bingeha çandî hate danîn; Feqê Teyran, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî... Wekî ku me berî niha got: Ger wan helbestên xwe ne bi vê rewşê nivîsandibûna, ma ew karîbûn heya îro li ser piyan mîna bazehê li geliyan bimana?

Hozantî barekî giran e, riyêke dûr û kûr e.

Ew kesê ku di riya dûr û kûr de bimeşe, tê de neweste, qeremşikandî û çogqurimî nebe, wî hêlê xilas kir û hilk da. Wekî ku Ehmedê Xanî ji hozanê berî xwe re bi wesifdan qal dike; wê hinek kes ji me re jî bi wesifdan binivîsin. Ku em hêlê xelas nekin ew bi xwe tişteki din e.

Mamosta Ehmedê Xanî dibêje:

Bi nav e rehma Melê Cizîrî  
Pê hê bikira Elî Herîrî  
Kêfek vebida Feqê Teyran  
Hetanê ebed bimaya heyran

Bavê Raxî Hemezani, di sedsala IX'an de jiya û nivîsand, lê helbestê wî qala heya sedsala VII'an dikin. Hemû jî epîk û destan in. Di dem û dewranê wî de çi şer çêbûne wî nivîsîne. Ew qala şerê ereb û kurdan dike. Dibêje:

Ku ez kole û ebd bim mirin çêtir e  
Gîdî û geda bim şer û kotek mestir e

Kanî ji vê dilneqşî û qutsîtir gotin?

Divê armanca hozanê kurd ev be. Gotin jî bi neqş, xilmet û neqandî be û berî her tiştî di xizmeta gelê xwe de be. Hêviya gel be. Xwezî û daxwazê gel be.

Dibistana hozanan kovar in. Hozan li ber reşik û beşikê kovaran, bi keft û left li ber roj û mehan digihîjin. Têne stewehandin. Pişkivandin ji hêkê ye... şax û per û fêkî bi xebata dûr û kûr çêdibe.

Hozan zîvkerê ziman û xeberê ye. Hozan hûrik hûrik dest bi karê xwe dike. Mîna şagirtê zîvker firax û tevgera dikanê, dezgeh û rewşa dikanê nas dike, çavekî wî li destê hosta ye, çavê din jî li karê wî ye. Şagirtî pêşî Şalomo nas dike. Şalomo di hostayiya zîvkeriyê de berî hertiştî tê. Ku ew nebe zîvkerî nabe. Dawî zêr û zîv nas dike. Ku destê wî kete ser zêr û zîv ew hin bi hin û hûrik hûrik li gora nîşandana hostayê xwe karê xwe dike.

Ev şerd û şurûdê hostatiyê ye. Bê gotin!...

Hemû hozanên kurd ku îro bi kurdî dinivîsînin bi bîr û baweriya min şagirt in. Ne ku yên hêja di nava wan de tune ne, belê, divê holk bê dayin. Gotinên wan mîna yên Cegerxwîn bibin pêşgotin û dîlok û serhatin ên bîr û baweriyên.

Berî niha bi çend rojan ronakbîrekî kurd hatibû Brukselê... Di nava xeberdanê de gotin hat li ser hozanan sekinî. Wî hevalî hozan hejmartin û hemû danîn aliyekî, dido neqandin û danî ber xwe; Derwêş Ferho jî dido danîn ber xwe, min jî kevnepeyrek û didoyê nû danîne ber xwe. Dawî derket ku her kesek ji me hinek dipesinand. Ji ber çi? Ji ber ku her hozanek cewherek tê de heye. Ew cewherê ku tê xilmet kirin, şewq dide. Di gelek helbestên hozanan de ev cewher xwe dide nîşandan. Cewherê nîşaniyê ku bes a wî hozanî ye. Gotin, mîzên, qîrîn, gewher, rewş, çav, gav, pîvan û dilovanî... Welatparêzî...

Ku hozan ev her deh gotibin wê xwe nîşan bide. Bi vî awayî çiqas ku diçe, çiqas ku dinivîse ber bi firehiyê, ber bi zanebûnê, ber bi kamilbûnê/gihîştinê, ber bi aqilmendiyê wê here.

Ne bi kurtebiriyê, ne bi carekê du caran... Kûr û dûr...

Kêmaniya Ahmed Arîf, ku got û nivîsî û qut kir, sekinî. Ahmed Arîf ne ê seknê û qutkirinê bû. Gava kire yek, kire dido, ne kire sisê... Sed caran bi ax û nalînê ji heval û hogirên xwe re nalîn dikir. Ez deh caran çûme ba wî da ew helbestên nû binivîsîne û derêxe ber rojê. Ne ku ez tenê çûme ba wî, gelek hevalên wî yên din jî çûne ba wî, lê wî bes FILÎNTA nivîsî, ku hinekî din hebin ez nizanîm. Hebin jî pir dido an sisê...

Ew betilî bû, xeyidî bû, dil bi kul bû, bi tenê bû; kesekî jî ew xeyda wî, dilbikuliya wî, bi tenêtiya wî ji ser wî hilnanî. Ma ne mixabin û heyf bû ji wî ronakbîrê zana û hunermend re?

Lê ew çû. Em çi bêjin bê fêde ye. Ne ew kare binivîsîne, ne em dikarin wî

bilebitînin. Çi di destê me de ma? Yekemîn mamostaya wî... Tabîata bê wext û demsal têhnê nade. Ku bahar tê, erd dipingije û dizê. Kulîlkên heftreng dertên ser rûyê erdê. Kulîlk û bilbizêq... Di çêlê xwe de...Hozan jî divê helbestên xwe bipingêje, bigihêjîne û bide. Hozan dilgeş û hêvî ye. Ziman û ûjdanê gel e. Xizna xeyalan; xeyal û xwendin û danhev a ser payizok, dîlok, berdolab û metelokan... Ser û qewl... Ku xeber û xewn li hev rast hat û gihîşt wê qolincê, dest pê bikin. Dawî bi gotine mitirbî wê derê.

Çanda kurdî divê li ser bingehê hêja û qewîn bê danîn. Bingeh, heya ku em bibêjin bes kûr e, lê avakirin divê saxlem û xweş çêbibe.

Îcar em kumê xwe deynin ber xwe; kê heta îro çi kiriye bînin ber çavên xwe, kêmanî û rastiye xwe bibînin. Ne ku palûte ye, ne ku suxre ye, ne ku em ji bo dilşahî û navê xwe binivîsin, divê ku armanc hebe, ji bo wextê ku bê, ji bo zarokên xwe, ji bo jiyana dinyayî em binivîsin.

Da ev henek li me nebin genek. Bar barê me ye; îro jî, sibe jî, dusibe jî!...

Hozanên dinyayê tevî pirtûkên xwe li ber me ne. Divê em bixwînin, divê em bi wan re bidin û bistînin, xeber bidin, bi wan re bibin heval. Divê em kevnarên xwe, mamostayên xwe bixwînin, wan nas bikin, ji şûr tûjtir, ji mû ziravtir xilmet bikin. Çi kovarên ku ez dibînim ev şaşî tê de heye. Erê rast e, em nû pê ketine, em bi dilşewafî xebatê dikin; lê sibe û du sibe wê çawa bibe.

Çend zana û hêja hene. Çendek li Swêd, çendek li Frensa, çendek li Elmanya, çendek li Belçîka û li vir û dera din, hwd...

Di kovara HÊVÎ de nivîsareke Reşo Zîlan hebû, bawer bikin min ew nivîs ne kêmfî çar caran xwendiyê. Çima? Ji ber ku li xweşa min çûbû. Xweş nivîsî ye. Ew mîna zîvkerê Torê li ser nivîsa xwe xebitî bû. Îcar ew nivîsandineke berranî ye; ne helbest e... Ku nivîsandina berranî be tu dikarî serê hespê xwe berde, ji aş û bajar bidî hev. Lê helbest? Helbest tiştêkî din e. Hozan zîvkerê ziman û xebera ye. Sebir û xebata hosteyî jê re divê. Gotinek heye:

Lo hoste necar

Lêke weke her car

Ku hozan hoste Necar be; ji xwe dawiya gotinê ev e. Heke ew ne hoste Necar be gotin baqê nîska ye.

Ku ez rastiye te, tu şaşî û xeletiyên min nebêjî, em ê çawan bigihên rastiye?

Em bêjin ku rastiye vî karî ne yek e; baş e, çend rastî hebe, bê çend rê û rêçik hene em teva nîşan bidin, rê û rêçika wejêrin û pê de herin.

Şîret û galgal ne şerm e;

Nezanîn û şaşî şerm e.

# HELBESTVANÊ KURD; SÎNAN SABRÎ

---

Ziya ŞEKER

Sînan Sabrî li Kurdistana bakur di sala 1950'î de li bajarê Siwêregê hatiye dinê. Wî dibistana pêşîn li Bîrecîkê û lîse jî li Ruhayê kuta kiriye. Piştî kutakirina vê xwendegehê ew di sala 1967'an de dikeve zanîngeha huqûqê ya Enqerê. Ew di sala 1970'ê de, meha çiriya pêşîn tê girtin. Ji madeya 141 û 142'an ve tek daras dibe. Ew di girtîgeha Amedê de radikeve.

Sînan Sabrî helbestvanekî kurd e. Lê wî helbestên xwe di salên 1970'ê de bi tirkî nivîsandine. Wî helbestên xwe wan salan bi navê "Belasîna Sevdalendiğim Bebek" çap kir. Ev pirtûka Sînan Sabrî ji aliyê weşanxana Komal, li Enqerê di sala 1976'an di meha Nîsanê de derketibû.

Ji bo helbestên Sînan Sabrî du çavkanî di destên me de hene. Yek kovara Yenidönem e. Yek jî pirtûka Ahmed Uysal e. Navê pirtûkê "Mapushane Şiirleri Antolojisi" (Adım Yayınları, Nisan 1974, Bursa) ye.

Di kovara Yenidönem de helbestên Sînan Sabrî "Bebeğin Beşiği Kan" (Sibat 1974) û "Aşkın Nadas Zamanı" (Adar 1974) çap bûne.

Ahmed Uysal jî ev herdu helbestên wî û yek ji helbesta "Kavgamız Üstüne" aniye xistiye pirtûka xwe.

Sînan Sabrî ji van "Aşkın Nadas Zamanı" nekiriye pirtûka xwe ya bi navê "Belasîna Sevdalendiğim Bebek". Herdu helbestên din jî di ber çav re rabirtiye. Helbesta xwe "Kavgamız Üstüne" bi navê "Şafaktan Kuşumuz Yok" haynaye pirtûka xwe. Lê beyitên helbestê jî tenik guhertin kiriye.

# MIN SIMBÊLÊ XWE JÊ KIR

Sînan SABRÎ

---

Werger: Ziya ŞEKER

Zimanê dayika min dax kirin  
Bi min giran tê  
Gotina kilameke din  
Min simbêlê xwe jê kir

Li erdê ketin  
Û belav bûbûn çavên min  
Tê re girt û rakir  
Ji diya min re hiş be gotin  
Diya min haş bû  
Min kire qîrîn

Li çivîkê xistibûn  
Gul rûçikandibûn  
Min hayna xweş kir  
Wanê col pir kirin  
Min li zendên xwe  
Kir levîstok

Zimanê dayika min dax kirin  
Fîtrat avêtin  
Riya min girêdan  
Vê janê ancax egît debar bikin  
Bêfinaziyên wang giran tê  
Min jê kir simbêlê xwe  
Lê ew ê dirêj bibe.

# PERTEW BEGÊ HEKARÎ

(...? -1806)



---

## Zeynelabidîn ZINAR

**E**v yek eşkere ye ku heta niha pir kesên menşûr ji Kurdan rabûne û gelek karên bi rêkûpêk bo ziman, çand û folklorê kurdî kirine, bi daxwazî û serfirazî gihandine rada hêjayê serbilindî û serfiraziya me. Lê mixabin ji ber bindestî û dabeşkirina Kurdistanê, piraniya wan di gerîneka dîrokê de hatine temartin û ew nav di rûpelên mêjû de bi awayekî zelal nayên îsandin. Îcar wek mesela ku dibêjin: "*Dinya dem e, geh petêx e geh jî lem e.*" Lê eger petêxa lemê xwe bi kamebûnê re bigehîne, dê nav û nîşanên wan raweşbîran jî raweşbîran xwe li dinyayê rapêç bikin û gencîneya çanda kurdî pêşkêş mirovatiya dilovan dibe. Ewçax dê kesên mîna Pertew Begê

Hekarî û berhemên wan yek bi yek bigîjin rûmeta xwe ya li nav rada vêje û çanda medenî. Hingê vêje, çand û toreya kurdî wê xwe ji şadaniyeke pir mezin re amade bikin û têkevin seretayeke yekemîn; binazdarî wê lengerên xwe di kûrayîya deryayên bê serûber de bingehînin binemaliya rûmet û serfiraziyê.

Erê her çiqasî bi bindestî be jî, bi vê koletiya Kurdan û bi dabeşkirina Kurdistanê be jî, dîsanê em Kurd pir dilşad in û serfiraz in ku navên gelek Pertew Begên me di nava komên helbestvan û nivîskarên cîhanê de xweş diîsin û tîrêjên şemala xwe bera ser taristana genî dane. Û pir kesên biyanî yên zanistiyê û raweşbîr hene û hebûne ku



hertim behsa wan bab û bapîrên me yên nemir kirine, dikin û helbestên wan bi zimanên xwe şrove kirine û werdigerandine gelek zimanên din ên biyanî.

Lê her çî be û çewan be dîsan, çewa ku Xaniyê nemir jî gotiye: *Her kes*

*hostayê dîwarê xwe ye! Nexwe barê girantir ketiye se milên rewşenbîr û zanayên nîfşên niha, ku ew xwe bi nehengî ragirin û bêkêmsaî bişixulin; bab û bapîrên xwe yên emekdar*

timî li bîra xwe bînin û zêdetir rûmetê nîşanî wan bidin. Ewçax dê gelek Pertew jîndariya xwe teze bikin û şênîtiya ziman û çanda kurdî jî digîjin miştûna pingarên yekkeretiye.

Ev hozanê bi navûdeng li Kurdistanê, di nava gelê xwe de, bi danîna bêjeya "şah" li pêşiya navê xwe, bi "Pertew, Pertewî, Perto" hatiye navdarkirin. Hin kes jî jê re "Şah Pertewê Hekarî Ebas" dibêjin. Jixwe ji bo navê wî hewceyê nîqaş û dehkerê nake, jî ber ku di malikên li dawiya hemû beşên Dîwana xwe de Pertewî navê

xwe nivîsiye. Ha ji ber vê yekê nexwe tu gumanek nayête hişê kesî ku navê wî yê rast ne *Pertew Begê Hekarî* ye.

Mixabin heta niha jî tarîxeke rast ji dema çêbûna Pertew Begê Hekarî re û jînenîgariya wî bi awayekî sererast nehatine zanîn. Her çiqasî gelek gerok,

kurdolog û nivîskaran li ser wî û li ser gelekên mîna wî nivîsîne jî, lê tarîxa jî dayîkbûna Pertewî zelal nekirine. Tenê dîroknasê Kurd Mihemmed Emîn Zekî Beg ê gorbihîşt di Tarîxa Kurdistan de



ŞAH PERTEWÊ HEKARÎ  
Wêne yê Aşopî Nexçêqana Hunermend: Bedî Babacan

(Koman: 1977) nivîsiye ku, Pertew Beg di 1806-an de çavên xwe ji dinyaya ruhnik girtine.

Erê her çiqasî tarîxa jidayîkbûna Pertewî û derbareyê jiyana wî ne kifş in jî, lê niha Dîwaneke wî ya helbestan bi zaravayê kurmançî li holê heye. Ew jî bi lêgerîn û xebata mamoteyê nemir Sadiq Behaedînê Amedî derketiye holê û pêşberî xwendevanên Kurd bûye. Eger ne ji wî bûna, kî dizane ka wê ev Dîwan çen sal şûnde bihatina dîtin!

Di 1977-an de Mamoste Sadiq

Behaedîn di pirtûkxaneyên Bexdadê de li Dîwana Melayê Cizîrî geriyaye. Wi deftereke destnivîs dîtiye ku Dîwana Cizîrî tê de bi destan hatiye nivîsandin û di paşîya wê de jî ya Pertewî nivîsî bû. Ku ew herdu dîwan di 12. 06. 1944-an de bi destên Ebdullah Navekî hatibûne nivîsandin.

Mamoste Behaedîn di eynî salê de Dîwana Pertewî li Bexdadê dîsa bi tîpên erebî, li Çapxaneyaya Dar-ul Hurîyetê çap kiriye. Cara duyemîn jî min ew jî tîpên erebî wergerande tîpên latênî û di bihara 1991-ê de li Elmaniyayê jî aliyê Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê ve hatiye çapkirin.

Lê mamoste Behaedîn di paşgotina xwe de nivîsiye ku:

- Ew nivîsendeyê vê Dîwanê, di zaravayê kurmançî de nezan û koh bûye. Ji ber hindê di gelek helbestên Dîwanê de alûze û şerpeztî derketine holê...

Helbestên Dîwana Pertewî, mîna yên Dîwana Melê Cizîrî tev bi kêş û qafiye ne û li gor rêza tîpên Elîfbêtika erebî li pey hevûdu dikişin. Dîwan bi temamiya xwe 238 rûpel e.

Dîwana Pertew Begê Hekarî bi rewşa qafiyeyên xwe, di rêza Elîfbêtika erebî de -ya ku ewçax Kurdan jî xwe re bi kar aniye- dişûfe qafiyeyên Dîwana Melayê Cizîrî. Lê belê di navbera herduyan de du-sê tîpên erebî ku Pertewî bi kar anîne, jî yên Cizîrî zêde hene. Pertew Beg jî mîna Melê, jî tîpên erebî zêdetir tîpa "p, ç,

v" di qafiyeyên xwe de anîne. Lê Cizîrî jî wî zêdetir tîpa "g" jî aniye.

Dîwana Pertew Beg, jî du beşan hatiye holê:

1- Beşa pêşî, jî sê pişkan ava ye:

a) Helbest li gorî rewşa kilasîkiya kevin hatine ristîn. Hemû weke helbestên Mewlûda Melê Bateyî, bi eynî qafiye û serbixwe ne. Di hinekan de jî qafiye tên guhartin. Û di navbera wan de yazdeh çarîne hene. Li vir jimara wan 445 e.

b) Jimara malikên pêncrêz li vir 24 e.

c) Li vir 39 çarîne hene.

2- Beşa diduyan, bi navê "Dîwana Pertewî ya Rast" e. Di vê beşê de sê pişk hene:

a) Li vir 166 bend hene. Qafiye li gor elîfbêtika erebî jî "a"yê dest pê dîke û bi tîpa "y"ê diqedê. Jimara beytan 1250 ye.

b) Li vir şeşmalîkî, tenê yek heye.

c) Ev pişk berêkana Mela Mensûrê Girgaşî û Mele Ehmedê Bateyî ye, ku herduyan avêtine ber hevûdu. Bi temamî 18 malikên şeşrêz in.

Mamoste Sadiq Behaedîn ev Berêkane jî tê de daye çapkirin. Min jî her wisan ew di çapa xwe ya latênî de çap kiriye.

Mamoste Sadiq Behaedî nivîsiye ku ango Mihemed Elî Ewnî (1897-1952) gotiye: "Dîwana Pertew Begê di 1806-an de hatiye nivîsandin." Û weha domandiye: "Mamoste Eladîn Secadî di Mêjûyî Edebî Kurdî bergê yekem da nivîsiye: Şah Pertewê Hekarî li 1806-

ê da dîwaneke destnivîs nivîsiye."

Îcar li vir tarîxa kutakirina Dîwana Pertewî û ya mirina wî, di eynî salê de rastî hevûdu dibin. Gelo ma wê li vir şaşiyek demeketibe holê?

Mamoste Behaedîn di pêşgotina xwe de dîsa gotiye:

- Cara pêşî helbestên Pertew Begê Hekarî sala 1944-an di kovara Dengê Gêtî Teze da û di Dîwana Kurmancî de, di sala 1971-ê de jî di kovara Nûserî Kurd da hatine weşandin.

Profesorê nemir Qanadê Kurdo di Gramatîka Zimanê Kurdî de nivîsiye ku:

- Pertew Begê Hekarî di 1808-an de bi zaravayê kurmancî nivîsiye. Û gotiye: "Bi fikra min Pertew Beg ji binemala mîrê Hekariyê bûye. Ji ber vê ew bi navê Şah-Pertew navdar e. Ji mala camêr xweşmêrê balber û xêrxwezda hatiye dinyayê, ji dayika xwe bûye û mezin bûye, cî û wergêd ew tê da mezin bûye ciyê sirişt, rengîn, deşt û çiya, gol û havîngê û zozan bûne. Ew cî warê zanist û torê klasîkê kurdî bûye. Li wira gelek merivêd Kurd ên pisporê zana rabûne..."

Li gorî Ansîklopediya Îslamê ya wergera bi ziman tirkî ku di Cildê 6/ K, rûpela 1114-an de agahdariya li ser Kurd û Kurdistanê daye, behsa hinek

nivîskar û helbestvanên Kurd jî kiriye. Bi kurdî weha gotiye:

- Di sedsala XIX û XX-an de mirov rastî van helbestvanên Kurd dibê: Şah Pertewê Hekarî, Hacî Qadir Koî, Abdullah Beg Mîsbah-ul Dîwan, Şêx Riza, Tahir Beg Cafî, Elî Kamil Silêmanî, Ebdulqadir Zehawî, Ahmed Beg Fetah Sahibqiran, Mistefa Beg Cafî, Şêx Nûrî Elî Baba, Salar Seîd Elî Beg, Wefayî Mela Rehîm Mukrî, Kak Mînî (Amîn), Mukrî, Kek Mistefa Îranî, Evdilxaliq û Salim.

Wekî din Ansîklopediyê weha domandiye: Li gor A. Jaba, kesên ku bi kurdî pirtûk nivîsîne ev jî hene: Elî Teremaxî 1000 (1591), Mele Yûnisê Helqetîni ku Tesrîf, Zirûf û Terkîb nivîsîne. Îsa Hekarî (585-1189 miriye). Teqyedîn Şehrezorî (Li Şamê di 643=1245 miriye). Ebdullah El Kurdî Sincarî. Cografyacı Ebulfida Eyûbî. Huseyn Başnawî. Mewlana Evdirehîm. Mewlana Muhemed Berqelî. Şêx Emer Yasir. Helbesvana Kurd Mah Şeref Xanim ((1264=1847 miriye). Xalid Şehrezorî. Mele Xizir Rudbarî. Hanayî Qubadî. Mele Evdirehman Teycozî. Şêx Mihemed Fexr-ul Ulema. Herîq û Hicrî.

Ez van herdu bendên ji Dîwana Pertew Begê Hekarî li jêrê bo xwendevanên NÛDEMê dinivîsim:

## SOTINA DIL BI EVÎNÊ

*Me dil dîsa bi îşqê sot  
Eceb nûrek eceb narek  
Bikin bawer di dinyayê  
Şibê min nîne bîmarek*

*Ne min dil ma di dildar e  
Tejî dil ates û nar e  
Ji gulên ma min di dest xar e  
Li ser dil maye min narek*

*Ne min gul man ne alal e  
Ne cûrê gul ne gula al e  
Ne reyhan, sunbul îsal e  
Mi qismet maye azarek*

*Birîna min ji nû kul bû  
Ji azara di nêv dil bû  
Wisalek qed ne hasil bû  
Di salê da emir carek*

*Bihar e zînde van baxan  
Emîr û begler û axan  
Evan rîşî û saçaxan  
Her yek bo xwe j`dilî karek*

*Ez im mayî di qeydê da  
Qe nabim xurrem û xendan*

*Heta kengê di van bendan  
Nekî aza bi guftarek?*

*Mi xem nîne zi van êşan  
Eger noşim dused nîşan  
Were Pertew bi van rîşan  
Fîda be bêjin mubarek.\**

### ÇAVÊN BELEK

*Di dil da agirek sûzan mi hîlbû  
Ji şewqa avirên çavê bi kil bû*

*Li min zahir nedî azarê borî  
Lemanê dax û êşa min di dil bû*

*Di alem da heçî şor û şerê heyî  
Serê fitnê serê zulfa li mîl bû*

*Çi êş e w pir bi jan e w derd û suhtin  
Ji jehra tîr û pêgana qizil bû*

*Ji bo tedbîra mecnûnan û dînan  
Eceb zulfa te xweş zincîra xel bû*

*Bibêje Pertewî mecnûn û dîn e  
Eger dîn e welê dînek bi cil bû.\*\**

\* (Çapa Latênî, rûpel: 167)

\*\* (Çapa Latênî, rûpel: 238)

# ŞAHSIWARÊ PÊNÛSA BIRÎNDAR; SEYDO GORANÎ

---

Siyamend BIRAHÎM



**J**i mêj ve min dil hebû, ku ez serîkî herim Emanê, paytexta Qiralgeha Urdinê. Ji ber ku me ji mêj ve bihîstibû, ku hejmareke baş ji kurdan li wir cîniş bûne, lê gelo hejmarên wan çiqas in, rewş û xebata wan ya kurdariyê çilo ye û bi çi rengî jiyana xwe ya abûrî û diravî dibuhurînin? sedemeke din jî hebû ku berî çend salan, gava mamosteyê nemir Elî Seydo yê Gewranî Ferhenga xwe ya bi navê "Ferhenga Kurdî Nûjen" derxist, min nameyek pîrozahî jê re diyarî kir û pê re min çend pirtûkên xwe ji wî û ji komela Selaheddîn re diyarî kirin. Bi vî awayî peywendiyên me çak bû, xweşî û spasîyên xwe ji min re dişand, sal û çax buhurîn, lê berî mirina wî bi neh mehan, min destûra çapkirina ferhenga wî ya bi nîrxê jê xwest, ciwanmêr destûra çapa dudîyan da min, min jî destûra wê li Sûriyê jî derxist, lê mixabin, beriya çap tewaw bibe, ew çû dilovaniya Yezdanê jorîn.

Roja 6.11.1992 min berê xwe da Emanê, ez nîvro gihîştîme Emanê. Hevalekî min li rex min rûniştibû, ji min re digot, Eman li ser heft çîyan ava bûye. Ez li van çîyan dinihêrim û di biryara dilê xwe de dibêjim, çiyayên Emanê



Eli Seydo Gorani

giş rût in, ne wekî çiyayên Kurdistanê bi darên mazî, zeytûn, gwîz, selwê û tiwan seranser xemilîne, çiyayên welatê me kateke ji katên bihişta rengîn e. Taybetiyeke ji spehîfî û bedewbûnê dinimîne, xurusta rengîn, bayê hênîk, bi sedan ji kevnêşopên dîrokî himbêz dike. Eman li dûrî Şamê, li başûrî wê dikeve, bajarekî paqij û xweş e. Pirraniya cînişên wê ji filistinî, êlên ereban, çerkez, ermen û kurd jî tê de hene.

Dîroka Emanê digihê berî zayînê. Ew paytexta êmûniyan bû û berî wan jî paytexta qiralê Bafan bû. Piştîre êmûniyan ji xwe re kirin paytext, ev kira ha ne bi dilê cihûyan bû, ku dewleteke xwîrt li rohilatî wan bête ava kirin û rîya vekirinê li pêşiya wan bête girtin, îcar qiralê wan Dawûd bi seroketiya Yoab bi leşkerên xwe êrîş birin ser êmûniya şerê wan kirin, talan kirin û kuleha (taca) qiralê wan ji qiralê xwe Dawûd re şandin û perwendiya êmûnê (1) birin, ango êmana jorîn, ev dorpêça ha du salan berdewam kir. Xelkê bajêr ji ava çêm vedixwarin, ew jî çikiya, paşê Yoab destên xwe danî ser bajarê Vaê "Emana jêrîn". Xelkê Emanê mecbûr man ku ji ava sarincan vexwin. Yoab kete baweriyeke mezin ku ew ê ji desthilanîn bikevin û ji Dawûd re şand ku bê bajar bispêriyê û bi destê Dawûd bête vekirin.

Piştî sê bablîskan, ango di sala 285 piştî zayînê, Betlîmos Fîledolforsê Romanî destên xwe danîn ser û ji nû ve gulvedaneke mezin çê kir û ji nû ve bajar hate ava kirin. Paşê navê wê kir Fîledêlfiya, Piştî wê kete bin destên Hêroders, piştî kujtareke mezin di kela wê de, di dema Bêzentiyan de ji nû ve geş bû. Paşê leşkerên Misilmanan ketinê û Roman xwe jê kişandin.

Mamoste Muhemed Kurd Elî di pirtûka xwe "Xutet el Şam" de dibêje: "Di sala 126 Hicrî fitnak û lihevhatineke nexweş tê de çê bûbû. Sulêman kurê hişam kurê Ebdul Melek ji zîndanê derket. Welîd ew xistibû zîdana Emanê. Hişam Welîd kuşt û perên di mewdanên wê de bi xwe re bir û hate Şamê". Di çaxa Ebasiyan de kete bin destên Muhemed kurê Texic (Exşîd) paşê Muqteder wilayeta Şamê jî dayê 318 Hicrî. Girîngiya Emanê roj bi roj di çaxa Xaçperestan de heta dema Osmaniyan de bûbû kaviil û wêran, paşê çerkez ketinê û ji xwe re ava kirin û digel tirkan tê de cînişîn bûbûn ta sala 1918 ji destên tirkan derket û kete bin destên ereban. Bi seroketiya leşkerên îngilîzan, paşê kete bin serdestiya Haşimiyan.

Pirsa me ya girîng ew e, gelo kurd ji mêj ve tê de hene yan ji nêzîk ve hatine û tê de cîniş bûne? Ev herêmên ha berî zayînê kete bin destên Mîtaniyan û piştîre kete bin destên Eyûbiyan, lê kurdên wê dem û çaxê wînda bûn, dâvre nîşek digel leşkerên Osmaniyan hatibûn û ji xwe re bazirganî û çandinî dikirin. Û ji alîkî din ve hemû cendirme, serokên leşkeran jî kurd bûn (4) û li gor gera min di çend bajarên Urdinê de û min ji kurdên wir pirsî û yek ji wan xortên hêja endamê Komela Selahedîn a kurdî Qasim el Kurdî ew xortê ciwanmêr ê ku bi kurmanciyeke pak bi min re axivî û got: "Li Urdinê nêzîkî 15 000 kurd dijîn, pirraniya wan zimanê xwe yê kurdî ji bîr kirine, lê pirraniya wan hesteyeke

welatperwerî bi wan re heye û niha jî em navendeke Kurdî rewşenbîrî mezin ava dikin". Piştî ku me roja yekê û dudiyar bi hevaltîya mazûbanê xwe Qasim buhurand, ez rabûm.

## VÎLAYA ELÎ SEYDO GORANÎ

Min berê xwe da nexweşxana kurê Elî Seydo, Dr. Eşref Elî Seydo. Ciwanmêr mezintirîn bijîşkê Urdinê yê (damaran) e. ew hate pêşiya min, gelekî bi hatina min kêfxweş bû û du rojan li bajarê Emanê teksiya xwe xiste bin karê min. Min ji şofêrê xwe re got, min bibe vîla Elî Seydo. Xaniyê wî li derveyî Emanê bû, vîla bêdeng bû. Piştî koçbûna Mamoste Elî Seydo, birayê wî Îhsan û keça wî Hiyam hatin pêşiya me, em derbasî hundur bûn, li ser destê çepê saloneke hêja, tê de du dîplom daliqandî bûn, li rexê din wêneya jina wî ya Libnanî bi dîwêr ve daliqandîbû; li ser destê rastê oda razanê digel pirtûkxana wî ya kurdî, pirtûkên wî yên dîrokî ji dîrokê re razên xwe berxwedan, bêhna çiyayên berz ên ku ji mêjûyê re sirûda sermedî distirê, li Emanê dûrî welatê bav û kalan, mamostê hêja tu li asoyê bakur, bakurê şîrîn temaşe dike, êş û derdên biyanîtiyê ya dijwar te dikişand, di vê vîla ha de dahênan û afirandinên te di warê zimanê kurdî de diyar bû û tu bi meznehî fêrî zimanê zikmakî bû û te Ferhenga xwe ya giranbuha û delal çê kir. Ji wê odê em çûne odene din, hemû pirtûkxane ne, pirtûkxana kurdî, tirkî, îngilîzî... Min pêşniyarek ji birayê wî û ji lawê wî re bir, da ku vîla Elî Seydo bibe Entîkgeheke kurdî, tê de hemû nivîsarên wî, xelatên wî yên konevanî û nameyên wî bêne parastin. Hemû bi pêşniyara min kêfxweş bûn û soz dan ku ew ê wilo bikin. Paşê me xatir û oxir ji wan xwest û ez vegeyîyam nexweşxana Dr Eşref, camêr çend wênayên bavê xwe û bendek bi dengê wî da min û em rûniştin, li ser jiyana Mamoste Elî Seydo axivîn. Dr Eşref got:

– Bavê min Elî Seydo ne tenê di warê ziman û dîrokê de dixebitî, lê ew yek ji pêşengên pêşî bû, ku roleke girîng di avakirina Urdinê de leyistibû. Ew di sala 1908 an de li Emanê hatiye dinê, kalikê wî di sala 1880 î de digel Osmaniyan hatibû Urdinê. Wî xwendina xwe ya pêşî di sala 1918 an de li Emanê tewaw kiriye. Ew di sala 1920, piştî şerê cîhanê yê yekemîn diçe Qudsê û li wê derê di dibistaneke îngilîzî de, jê re dibêjin dibistana (Bishop Gobat) tewaw dike, paşê xwendina xwe ya navîn û bilind "Rewdet el me'arîr" kuta dike. Di sala 1924 an de ew digihê Bêrûdê û li Zanîngeha Emerîkî xwendina xwe berdewam dike û pêpelûka Bakaloryos di zanîna konevanî û aborî de distîne ( ew yekemîn xwendekarê Urdinê bû ku di vê zanîngehê de dixwend). Ew di sala 1929 an de li dibistana Emanê dibe mamostê zimanê îngilîzî. Di sala 1932 an gava rehetiyê mîr Celadet "Hawar" derdixist, mamoste Goranî jê re nivîsnad da tîpên "Q" û "K" bi hev biguhêre, çimikî di Hawarê de tîpa "K" li şûna tîpa "Q" dihate bikarênin û ya "Q" jî li şûna "K" ... Mîr Celadet gelek bi pêşniyara wî



kêfxweş bû, rabû daxwaza wî bi cî anî û holê ji jimara 24 an pê ve kovara Hawar rastkirî derket. Di sala 1938 bû rêveberê dibistana "Kerkê". Ji sala 1940 ta 1948 an wî rêveberiya dibistanên Urdinê dikir. Sala 1949 an ew bû sekreterê pêşî di şahyara derveyî de û li Ceddê (Si'ûdiyê) kar kir. Paşê li konsolosxanên Urdinê, Enqera û Şamê kar kir. Gava wî dev ji karên xwe yê konsolosxanan berda, bû şahyar (mufewwed). Ew di sala 1963 an dîsan vegeriya Ceddê, Yemenê, Enqera û Şamê û di vê demê de pirtûkek bi navê "Min E'man île el î'madiye" nivîsand û li Qahîrê çap kir. Paşê wî ev pirtûkên xwe nivîsandin:

1 - "El Ekrad" ya ku Hesên E'refê ji îngilîzî wergerandiye erebî.

2 - "Rihle beyne el fuca'an" ya rojnamevanê Emerîkî Dana Şimît, ji îngilîzî wergerandiye erebî.

3 - "Cumhûriyet Mehabad el Kurdiye" ya dîplomatê Emerîkî Îgilton ji îngilîzî wergerandiye erebî.

4 - "El Ekrad" ya baba Tomas Boi ji îngilîzî wergerandiye erebî.

5 - "Eller we loristan" di hejmara duduyan de, ji cîldê duduyan kovara zanyarî Kurd ya Iraqê li Bexdê hate belavkirin (1974).

6 - "Muşkîlet el iqlîm el şerqî fî Turkiya" ji tirkî wergerandiye erebî.

7 - "Fehenga kurdî nûjen" kurdî-erebî.

8 - "Rihle fî ribû'î el Yemen fî axiriyat e'hd el îmam Ehmed" nivîsandiye.

9 - "Min E'man îla Malatiya" nivîsandiye.

10 - "Dûmahiya fehenga kurdî nûjen" çêkiriye.

Paşê Dr Eşref ji min re got ku em ê pirtûka wî ya bi navê "Min E'man îla Malatiya" çap bikin.

Piştî vê rûniştina dirêj min pêşniyarek ji Dr Eşref re diyar kir ku tu tiştî bi xaniyê Goranî nekin û weke entîkxanekê (muthefekê) bihêlin, ew gelekî bi vê pêşniyara min kêfxweş û şa bû û soz da ku ew ê holê bike, pey re min xatir jê xwest.

Roja sisiyan ez vegeyîyam cem Qasim da xatir jê bixwazim, pirtûka Goranî ya "Min E'man île el î'madiye" û "Dûmahiya fehenga kurdî nûjen" ji min re diyarî kirin.

Ji bo agahiyê û weke ku ji min re hat xuyakirin, mamoste Goranî ta rojên dawî ji jiyana xwe ji pirtûk û pênuş, xwendin, nivîsandin û danê dûr neket.

Zariwên mamoste Goranî: Yê mêr: Mazin, Eşref; yê jin Hiya, Şêrîn, Nesrîn û Nermîn.

Momoste Goranî di goristana "Um el Hîran" de, li derdorê E'manê hate veşartin.

Û wiha wê navê hozanê me, Elî Seydo Goranî weke çirûskeke pîtdar û ronîdar di meydana rewşenbîrî de bimîne û rûpelên dîrokê wê bi şanazî necatî û hermîna wî hembêz bikin.

Eman-Urdin, 9. 11. 1992

# HUNERMENDÊN XWE BINASE

---

Havîz QAZÎ

**B**ehrewerê gelê kurd mamosta Dilşad, wek alahilgirê têkhelkirina awazê kurdî ê resen digel awazê hevçerx, bi wêneke zanistî û pêşvexwaz tête hejmartin, ji lew li beriztirîn paye û pêlên hunermendiyê cihê xwe kiriye.

Gelê me bi hunermendê xwe serbilind û şahnaz e û danaye xana serkêşê muzîkvanên nûjen. Dest û tiliyên Dilşad gava li ser weter û dafên (Kemanê) dileyizin, guhdar li gel awazan diçe dinyayek suhrîn, diçe çiyayên rengîn, li ser kaniyên berfîn, dibin helîzên nazik şîrîn, bilind dibe

asmanê vala û melevanyan dike li ser parçe ewrên bihara Kurdistan û dixwaze ew tiliyên zêrîn sax bin û bijîn herdem.

Ha ev e hunermendê me ê xurt Dilşad. Bi me xweş e em bi vê hevpeyvînê rûpelên kovara NÛ-DEM'ê bixemilînin...

PIRR BAŞ DIBE KU TU XWE BI  
XWENDEVANAN BIDÎ NASKIRIN?

Ez Dilşad Mehemed Seîd im, di sala 1958'an de li bajarê Dihokê hatime dinê. Di sala 1986'an de min jin anî, keça min (Vahîn) pênc salî ye, kurrê min (Arîn) du salî ye.

DESTPÊKA TE YA LI GEL MUZİKÊ  
ÇAWAN BÛ?

Di heft saliya min de dilê min kete muzîkê. Lê wê demê tu aletên min yên muzîkê tunebûn, ji loma min hinde gûzanên rihraşînê dikirine derzên dolaban û pê dileyistim, dengên wan mîna aletên muzîkê dihatin guhan. Bav û dê û xalê min (Cemîl) palpişt bûn ku ez li ser wî karî berdewam bim. Xalê min aleteke (Gîtar) a biçûk xelatî min kir. Her çend ew alet a zarokan bû, lê ew bû destpêka min a muzîkê. Di sala 1969'an de ez fêrî aleta (ûdê) bûm. Di sala 1970'ê de sirûda (Newrozê) ji hozanên mamosta (Salih Yosifî) min tomar kir. Di sala 1971'ê de birê min (Şêzad) ji bo yekîtiya xortên Kurdistan komeke muzîkê pêk anî. Ez jî yek ji endamên wê komê bûm û min di komê de li okordiyonê dixist.



Dilşad

BÊGUMAN CIVAKA KURDÎ BERÊ RÊ NEDIDA KU KESEK JI XWE RE MUZİKÊ BIKE PÎŞE Û KAR, VÊ YEKA HAN ÇI ASTENGÎ DERXISTIN PÊŞIYA TE?

Ez ê bê êxbal bûm, ne ku kes ji mirovên min dijî min rawestan, belku piştgiriya min kirin û bi taybetî bavê min ê ku sala 1970'ê de aleteke (Okordiyon a biçûk bi panzdeh dînanan ji min re kirî û aleta yekemîn ya rastîn bû ku ez bûme xwediye wê

KESEKÎ DIN HEBÛ KU DI HELBJARTINA RIYA HUNERMENDIYÊ DE ALİKARÎ Û PIŞTGIRIYA TE BIKE?

Mamostayê min (Mistefa Becarî) di sala 1969'an de li bajarê (Teleifer) ez bi televizyon û rojnameyan dame nasîn. Dengbêjê kurd (Tahsîn Taha) jî yek ji wan palpiştan bû ku ez nesfhet kirim, berî ku ez biçim danîşgeha hunerên ciwan, xwendina (kemanê)

li şûna (okordiyonê) bikim.

TE PEYMANGEHA HUNERÊN CIWAN, BEŞÊ MUZİKÊ LI BEXDA KUTA KIR. TE ÇEND SALAN LI WIR XWENDIYE Û BIZAVÊN TE LI WIR ÇI BÛN?

Min di sala 1973'an de dest bi xwendinê kir. Xwendina min pênc salan kişand û ez li wê peymangehê yekemîn derçûm. Mamostayên min li wir alîkariya min dikirin, nexasim mamosta (Ebdilrezaq Ezawî)-derhênerê yekemîn filmê sînemiyê yê bi reng li Iraqê- wî seydayî aleta xwe a (kemanê) wek diyarî pêşkêşî min kir, ji ber ku wê demê aletên muzûkê li peymangehê tunebûn. Seydayên (Rûs) li peymangehê gelek feyda gihandin min.

HER WEKÎ KU TÊTE ZANÎN TE XWENDINA BILIND LI DERVEYÎ WELÊT KUTA KIRIYE, TE ÇEND SALAN LI DERÊ BORAND Û TE ÇI ŞEHADET (BEKELORYOS) DI NAVBERA ÇAR SALAN DE WERGIRTIN?

Min çar salan li Îngîltereyê xwend. Biryar ew bû ku ez şahadeta (bekeloryos) di navbera çar salan de wergirim, lê min şahadeta (Macister) ji Zankoya Wêlz û şahadeta (Dîploma Hostayê li ser Kemana Klasîkî) ji (Akademiya London, Royal Accademy of Musik) wergirtin. Yanî di wan çar salan de, min di şûna şahadetekê de sê şahadet wergirtin.

BERÎ KU TU JI WELÊT MAHCIR BIBÎ, BIZAVA TE A MUZİKÎ LI NAVXWE Û LI DERVE ÇI BÛ?

Ez di sala 1978'an de li (Peymangeha Mamostayên jinan), li Dihokê bûme mamostayê muzîkê. Min li wir tîpeke muzîkê pêk anî û bi stranên xwe em beşdarî festîvala sale ya tîpa Iraqê bûn û du salan li ser hev tîpa me di nav tîpên Iraqê de yekemîn derket. Paşê min komeke din bi navê (Tîpa Dihokê) pêk anî û beşdarî aheng û festîvalan bûn. Cihekî berketî yê Koma Dihokê di hemî çalakîyan de hebû. Paşê ji bo deranîn û çêkirina stranên Koma Dihokê yên bi rêzaneke nû û bi rengkî zanistî min studyoyek çê kir. Di sala 1980'ê de ez bûm alîkarê îzge û televizyona Bexdayê. Û di eynî çaxê de ez li tîpa (Semfoniya Iraqê) bûme lêxistê kemanê yê yekemîn. Di televizyona Bexdayê de çend awaz û danerên min yên vîdyoyê ji bo bîneran dihatine pêşkêş kirin... Dema xwendinê ez li (Ingiltêre) berpîrsiyarê (Tîpê Semfonî) li (Zankoya Wêlz) wek (Konsêrt mayister) bûm. Li wir min li gel wê tîpê (Konsêrta Çaykovski) pêşkêş kir. Li wir dîsan ez di sê bezînan de beşdar bûm û ez di hersiyana de jî yekemîn derketim.

LI EWRÛPAYÊ ÇI PROJEYÊN TE YÊN MUZÎKÊ HENE?

Piştî ku ez mahcîr bûm, (Akademiya Almanya ya bajarê Berlînê) ji bo ku ez sê mehan biçime wir ji min re dawetname şand. Ew dawetname ji bo hunermendiya kurdî şerefeke pîrr mezin bû. Min ji wan sê mehan pîrr fêde dît û ez fêrî gelek tiştên teze bûm. Ez vê demê çend dananên xwe ên klasîkî û rojhelatî tamam dikim, da ew bo tomarkirinê li gel tîpeke simfonî amade bibin... Ji bilî wê jî ez ê lêxistinên xwe yên kemanê bikim kasê û ez ê bi awayê rêbazeke nû tomar bikim. Ez li ser pêşkêşkirina ahengên muzîkê bi kemanê li ser şanoyên Ewrûpa bi alîkariya piyanojena swêdî (Madam Rahêl) berdewam im.

TU PÊŞEROJA MUZÎKA KURDÎ ÇAWAN DIBÎNÎ?

Bibûre, ez nikarim bersiva vê pîrsa giran di hoyên mahcirtiyê û di vê rewşa xerab de bidim...

# MÎRÊ BIÇÛK

ANTIONE DE SAINT-EXUPÉRY (1900-1944)

Werger: Şahînê B. SOREKLÎ

## Pêşgotina Wergêr

Di kûraniya nefsiyeta her merovî de ta roja mirinê zarokek heye. Nivîskarê Mîrê Biçûk vê yekê baş diyar dike. Ensiklopêdyaya Britannica vê çîroka Antoine Saint-Exupéry wek "fabileke zarokan ji bo mezinan" xuya dike û didomîne, ku ev çîroka wî merovan haydar dike, ku "tiştên herî baş di jiyane de yên herî xurû ne (besît), ku di jiyane de tiştê dimîne dayîna ji bo yên din e."

Cara yekem min Mîrê Biçûk, Le Petit Prince, di kûrseke fêrbûna zimanê frensî de xwend. Meraqa dil ew bû, ku ez rojekê bikaribim ew pirtûka delal wergerînim zimanê kurdî. Mixabin, frensiya min negihîşt radeya ku têr wergerandina pirtûkan bike. Li milê din, wêneyên (resimên) di pirtûkê de, ku nivîskêr ew bi xwe çêkirine, û wan wek beşekî grîng ji romanê dibîne, pirsra wergerandina tevahiya pirtûkê dijwar dikin, bi taybetî ji bo pirsra mafê kopîkirinê. Hêvî dikim rojekê kesek bikaribe tevahiya Le Petit Prince ji teksta orijinal wergerîne kurdî. A nuha ez ê beşne wê ji inglîzî wergerînim kurdî.

Nivîskarê frensî Antoine De Saint-Exupéry merovekî nivîskar, pîlot û rojnamevan bû. Wî Le Petit Prince salekê berê mirina xwe nivîsandiye (firroka wî di sala 1944an de li ser Derya Spî hat xistin). Pirtûk li İnglistanê sala 1945an di bin navê The Little Prince de hat weşandin. Katherine Woods ew ji frensî wergerandiye inglîzî.

Çîrok li berriya Seharaya Afrîka dest pê dike. Pîlotek neçar dimîne firroka xwe li vê çola xirrixalî daxîne. Motora firrokê xirabe bûye, ava wî kêm e,... Di êvara yekem de dengê ji nişkan ve dikeve guhên wî: "Wêneya miyekê ji min re çêbike." Deng yê mîrê biçûk e. Bejina wî wek ya zarokekî ye. Ew ji stêrkeke pîr dîr hatiye erdê. Stêrka wî weqa biçûk e, ku ew bi levandina îskemeya xwe dikare roavaçûnê di rojekê de çel û çar caran bibîne. Ew ji dîtina royê di dema avaçûnê de pîr hej dike. Tenê ew li ser stêrka xwe dimîne, tev guleke ku ew jê hej dike. Li ser stêrka mîrê biçûk sê volkan hene, du ji wan hên veketîne, yek vemirîye. Ew dor wan paqîş dike, stêrka xwe ji mit û darên berrî diparêze. Ew hatiye ji erdê miyekê li gel xwe bibe, yan bi kêmasî wêneyeke miyekê, da ew stêrka wî ji dareke bi navê Baobabs biparêze. Ev dara berrî dikare pîr mezin bibe û stêrka wî li wî biherrimîne. Mî dikare darê di dema ku ew hên mitekî biçûk e de bixwe û nehêle ew çî caran mezin bibe. Pîlot û mîrê biçûk hêdî hêdî dibin dost. Ew heftayekê li gel hev derbas dikin. Di vê katê de mîrê biçûk ji wî re serpehatinîne xwe dibêje, tişt û bûyerên li stêrk û planêtên cuda cîh girtinî.

Di vê hejmara NÛDEM'ê de em ê li gel mîrê biçûk biçin ser planêta kiralekî kal.

**S**têrkên jimar 325, 326, 327, 328, 329 û 330 cîranên stêrka mîrê biçûk bûn. Wî dest pê kir ji bo serlêdankê biçê wan yekê li dû ya din bibîne, da zanistiya xwe bêtir bike.

Li serya yekem kiralek hebû. Bi xeftanê morî kiralî ew li ser textê xwe, yê di eynî demê de xurû û bedew, daniştibû.

"Ha va ye tebayek!" got kirêl bi dengê qebe, dema çavên wî li mîrê biçûk ketin.

Mîrê biçûk ji xwe pirsî:

"Çawa dikare min binase bêyî ku ez çî caran dîtîbim?"

Wî nedizanibû ku di çavên kiralan de cîhan biçûk xuya dike. Ji bo wan merov hemî teba ne.

"Vir de were, da ez te baştir bibînim," got kirêl. Li nik wî hesteke serbilindiyê weqa mezin çêbû dema wî xwe li dawîya dawîn li ser kesekî kiral dît.

Mîrê biçûk li dorhêlên xwe niherî da şûneke daniştinê bibîne, lê tevahiya planête bi xeftanê kirêl yê bedew hatibû dagirtin. Wisa, ew li ser ligan ma, û ji ber ku ew westa bû bû bawîşka wî hat.

"Bawîşkanî li pêş kiralan tişteki şerm e," got kirêl. "Ez vê yekê li te qedexe dikim."

"Ne bi dest min e. Ez nikarim bidim rawestandî," mîrê biçûk fedîkar li kirêl vegerand. "Riya min dûr bû û ez bêxew mam,..."

"Ha! Eger wisa ye, ez emir dikim ku tu bawîşka xwe wîni," got kirêl. Ev bûn gellek sal ku min kesekî bawîşka xwe wîne nedîtiye. Bawîşkanî ji bo min tişteki balkêş e. De haydê! Bawîşka xwe wîne! Ev ferman e."

"Ev min ditirsîne... Ez nikarim..." got mîrê biçûk di ber xwe de, nuha pîrr fedîkar.

"Ê! Ê!" deng ji kirêl hat. "Eger wisa ye, ez emir dikim, ku tu hin caran bawîşka xwe wîni û hin caran-"

Wî çend gotin di ber xwe de gotin û wisa dixewinî ku ew li hev heyirîbû. Sedema vê yekê jî ew bû, ku kirêl bi îrsar rêzgirtina ji fermanên xwe re dixwazt. Li nik wî toleransa ji bo rêznegirtina ji fermanên wî re tunebû. Ew kiralekî mutleq bû. Lê, ji ber ku merovekî baş bû, wî fermanên mentiqî didan.

"Eger ez li ceneralekî emir bikim," wî wek nîşe digot, "eger ez li ceneralekî emir bikim, ku ew xwe bike teyrekî derya, û eger ceneral fermana min bi cîh neyne, yê tawanbar ê ne ceneral be. Ew ê sûcê min be."

"Rê heye ez danişim?" hat nuha dengêki şermok ji mîrê biçûk. "Ez li te emir dikim ku tu danişî," kirêl bersîv da, û bi mezintiyê ke kiralî beşekî xeftên ber bi hev hanî.

Mîrê biçûk mat mabû...



Planêt yake pîr biçûk bû. De karbidestiya çi ev kirala dikare bike?

"Seydayê Mezin," got mîrê biçûk ji wî re, "Ez tika dikim ku hûn ê ji bo pîrsekirinekê li min biborînin-"

Ez emir dikim tu ji min pîrsekê bipîrsî," got kirêl bi lez da kirina pîrsê jê re hêsan bike.

"Sedayê Mezin- Hûn karbi-

destiya çi dikin?

"Hertiştî," got kirêl bi hêsanîyeke ecêb.

"Hertiştî?"

Kirêl destê xwe bi şêweyekê levand ku planêta wî, planêtên din û hemî stêrk xistin mebestê.

"Ev hemî?," pîrsî mîrê biçûk.

"Hemî," kirêl bersîv da.

Ji lewre, karbidestiya wî ne tenê mutleq: ew herweha cîhan-

gelempir (universal) bû.

"Û stêrk jî bi ya We dikin?"

"Bêguman, dikin," got kirêl.

"Ew di cîh de bi ya min dikin. Ez rê nadim guhnedana fermanên xwe."

Hêzeke wisa ji bo mîrê biçûk tişteki xewn û xeyalan bû. Eger ew xwediyê femandariyeke weqa mezin bûya, wî ê ne tenê rojê çel û çar caran li roavaçûnê mêzekira, lê heftê û du caran, heye ku tew sed carî, heye ku tew dused car, bêyî ku qe îskemeya xwe jî bilevîne. — ji ber ku li nîk wî hesteke xemgîniyê çêbû, dema wî planêta xwe ya wî li dû xwe hîştî hanî bîra xwe, wî wêrekiya xwe civand ser hev da ji kirêl çeyakê bixwaze:

"Min dil heye ro li ava bibînim... Wê çeyiyê ji min re bikin... Li royê emir bikin, bila biçê ava...."

"Eger ez li ceneralekî emir bikim wek perperokekê ji kulîlkekê bifire yeke din, yan serpêhatiyeke trajîk binivîsîne, yan xwe wergerîne teyrekî deryayî, û eger ceneral fermana ji bo wî hatî dayîn bi cîh neyne, kî ji me ê xwediyê şaştîyê be?" kirêl pirsî, "ceneral, lê ez?"

"Hûn," got mîrê biçûk bi bawerî.

"Bêguman. Divêt merov ji herkesî tiştê ew dikare pê rabe bixwaze," kirêl domand. "Pejirandina otorîteyê ber hertiştî bi

mentiqê ve grêdayî ye. Eger merov li gelê xwe emir bike ku xwe bavêjin deryayê, ew ê rabin şoreşekê çêbikin. Min maf heye hurmetgirtina ji fermanan re bixwazim çimkî fermanên min mentiqî ne."

"Û roavaçûna min behsa wê kirî?" mîrê biçûk hanî bîra wî: ji ber ku mîrê biçûk eger pîrsek bipirsiya, ew pîrsa nema êdî ji bîra wî diçû.

"Tu ê roavaçûna xwe bibînî. Ez ê emir bikim. Lê, li gor zanistiya min ya di warê karbidestiyê de, divêt ez li benda şertên ji bo fermaneke wisa munasib bimînim."

"Yanê kengê?" mîrê biçûk pirsî.

"Him! Him!" deng bi kirêl ket; û ber gotineke din bike wî li salnameyeke mezin niherî. "Him! Him!" deng bi kirêl ket; ew ê doradora- ew ê vê êvarê dora bîst deqan ber saet heşt cîh bigire. Û tu ê bibînî çawa baş emrê min tê girtin!"

Bawîşka mîrê biçûk hat. Ew li wendakirina roavaçûna planêta xwe poşman bûbû. Û, li milê din, wî herweha dest pêkiribû piçekî aciz bibe.

"Tişteki din î ez li vir bikim nema," wî gote kirêl. "Ez ê car din bi riya xwe de biçim."

"Meçe," got kiralê bi hebûna tebayekî serbilind. "Meçe. Ez ê te bikim wezîr!"



"Wezîrê çi?"

"Wezîrê- wezîrê edaletê!"

"Lêkesek li vir niye da merov li ser bibe dadmend!"

"Em pê nedizanin," kirêl jê re got.

"Ez hên li tevahiya welatê xwe negeriyame. Ez gellekî ixtiyar bûme. Cîhê ji bo erebeyekê jî li vir tune. Û meş jî min westa dike."

"Ê, lê min berê niherî!" got mîrê biçûk, û ziviriya da careke din çavên xwe li haliyê planêtê yê din bigerîne. Li wî halî jî, wek vî halî, qe kes xewan nedikir...

"Eger wisa ye, li ser xwe bibe dadmend," got kirêl. "Ev ji her tiştî diwartir e. Merov bibe hakimê li ser xwe gellekî diwartir e ji hakimbûna li ser kesên din. Kesê di warê hakimbûna li ser xwe de serkewtî be, ew ê bi rastî merovekî aqilmend be."

"Rast e," got mîrê biçûk, "lê li her derê ez dikarim hakimbûna li ser xwe bikim. Pêwîst niye ku ez li ser vê planêtê bijîm."

"Him! Him!," deng bi kirêl ket. "Ez baş texmîn dikim ku mişkekî kal li ser planêta min li şûnekê heye. Bi şev dengê wî tê min. Li ser wî mişkê kal bibe

dadmend. Di navbera demekê û yeke din de tu ê cezayê mirinê bidî wî. Jiyana wî ê di dest adaleta te de be. Lê tu ê wî her bibexşînî; ji ber ku divê ew were parastin. Ji wî pê ve me kes niye."

"Ez," mîrê biçûk da zanîn, "naxwazim kesekî bi mirinê ceza bikim. Bawer im ez ê nuha di riya xwe de biçim."

"Na," got kirêl.

Lê mîrê biçûk, nuha ku haziriya çûna xwe kiribû, dîsa nexwazt kiralê kal xemgîn bike.

"Eger Cenabê We bixwaze fermana wî were bi cîhkirin," wî got, "Ew ê bikaribe emrekî ku dikare were kirin bide. Wek nîşe, Ew dikare li min emir bike ku ez ji vir ta deqeyekê biçim. Bi dîtina min ji bo vê yekê şert munasib in."

Ji ber ku çi bersîv ji kirêl nehat, mîrê biçûk bîstekê ma. Dû re, wî bi keser xatir xwazt.

"Ez te dikim sefirê xwe," kirêl zû bang kir.

Ew xwediyê otorîteyeke bi ezamet bû.

"Ez ji mezinan fêhm nakim; kesên zor ecêb in," got mîrê biçûk di ber xwe de, û bi riya xwe de çû.

# Pirtûkên WEŞANÊN NÛDEM yên ku di nêzîk de derdikevin:

BINGEHÊN GRAMERA KURMANCÎ  
Celadet Bedirxan

MİŞK Û MIROV  
John Steinbeck  
Roman (werger ji swêdî û tirkî)

ŞEVÊN SPÎ  
Dostoyevskî  
Roman (werger ji swêdî û tirkî)

KEÇA KURD ZENGÊ  
Cemşîd Bender  
Kurteçîrok (werger ji tirkî)

Li ser daxwaza nivîskarên NÛDEM'ê me weşanxana xwe jî danî. Weşanxana NÛDEM'ê wê bi xurtî weşanên bi kurdî çap bike. Bi weşanxana NÛDEM'ê re têkevin danûstandinê, piştgiri û alîkariya wê bikin!

# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyareke me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê NÛDEMÊ!

NÛDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bikî, bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê NÛDEMÊ.

Ji bo Swêd salekê 190 skr. Welatên din 39 Dolar.

**Nav** .....

**Paşnav** .....

**Navnîşan** .....

Vê karta jor dagire û fotokopiya wê li ser navnîşana NÛDEMÊ bişîne. Çer ku ew bigihîje me, em ê NÛDEMÊ digel karta abonetiye ji we re bişînin.

# NÜDEM

M. Aurelius

Hin mezin tene dinc, hin mezinahiyê bi dest dixin, mezinahi ji hi hinekan tê.

Eflatun

Du celebên dinitiyê hene; yek jê ji dinitî ye, ya din ji ji nezani ye.

Horatius

Zanî gavkaniya başnivisandî ye.

Strindberg

Mirov nikane bi demê re qayîşê bikîşîne.

Holmes

Her peyaki mezin ne peyaki zane, her peyaki zane ji ne peyaki mezin e.

Asimov

Zanî dikare mirov têxe ser riyên gewt, lê bersiva wê zanebûnek hin gêr û hin bêr e.

La Fontaine

Hin mirov hene, bi zirecêba dinyayê dizanin lê xwe nas nakin.